BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ

Raperîna gel, tirs xiste cergê dijmin







Adresên komelên endam yên Federasyonê:



1- Komela Kurd li Östersundê.
Box:7059
831 07 Östersund

2- Komela Kurd li Alftayê.
c/o N. Haco
Parersv. 15 A
564 01 Alfta

3- Komela Kurd li Lindesberg:
Köpmang.10
711 00 Lindesberg

4-Komela Kurd li Salayê.
c/0 Amed Serdan
Johannesbersg. 1, 2tr.

5-Komela Kurd li Sandvikenê.
c/o B. Batte
Konsulg. 14 K
811 33 Sandviken

6- Komela Kurdistan li Uppsalayê.
Box: 250 28
750 25 Uppsala

7- Komela kurd li Västerâsê.
Box: 1369
720 13 Västerås

8- Komela Kulturî Kurd li Trolhättanê
Box: 6043
461 06 Trollhättan

9-Komela Kurd li Eskilstunayê.
Box: 595
633 53 Eskilstuna

10-Komela kulturî li Örebroyê.
Box: 537
701 50 Örebro

11- Komela Kulturî Kurdistan li Göteborgê
Box: 2263
403 14 Göteborg

12- Komela Kultura Kurd li Falköpingê
Box: 227
512 02 Falköping

13- Komela Kurd li Norrköpingê:
Torsg. 19
603 63 Norrköping

14-Komela Kulturî Kurd li Katrineholmê.
Nyhemsgatan 40
640 51 Katrineholm.

15- Komela Kurd li Linköpingê:
Hospitalgr. 3
584 27 Linköping

16-Komela Kurd li Jönköpingê.
c/o Bibani Juma
Tornfalksg. 12
552 69 Jönköping

17- Komela Kurd li Başûra Swêdê
Box: 2114
220 02 Lund

18- Komela Kurd li Umeåyê.
Box: 2116
900 02 Umeå

19- Komela Kurd li Sundsvallê.
c/o F. Nozhadzade
Söndagsv. 198
86300 Sundsbruk

20- Komela kulturî kurdistan li Hudiksvalê.
Stormyrav.13
824 00 Hudiksvall

21- Komela Kurd li Söderhamnê.
c/o Tayfor Patai
Tallv. 24 C
826 00 Söderhamn

22- Komela Kurd li Bollnasê.
Box: 320
821 01 Bollnäs

23- Komela Kurdistan li Spångayê.
Box: 4118
163 04 Spånga

24- Komela Demokrat a Jinên Kurd.
Box: 4033
163 04 Spånga

25- Komela Huddingeyê.
Box: 4088
141 04 Huddinge

26-Komela Kurdî li Upplandsväsby.
Box: 129
194 22 Upplansväsby

27-Komela Kulturî Kurd li Nynäshamn.
c/o A. Kakamami
Odinsv. 5B
149 33 Nyneshamn

28- Komela Kulturî Kurd li Järfällayê.
Box: 2016
175 02 Järfälla

29- Komela Stockholmê.
Box: 45 205
104 30 Stockholm

30- Komela Botkyrkayê.
Box: 3038
145 03 Norsborg

Yekîtîya Ciwanên Kurd Li Swêdê
Box: 45 205
104 30 Stockholm

www.arsivakurdi.org

BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet
Organa Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê

Ansvarigutgivare/Berpirsiyar
N. Kirîv

Redaktion/Redaksiyon
A. Tîgrîs, Aso Germîyanî, Cemşîd Heyderî, L.Cengîn, Hesenê Metê, Mahfûz Mayî, M. Alî. K., Rohat, Temo Zêrîn

Sättning och Layot
Bavê Rojbîn, C. Heyderî, N. Kirîv

Adress:
Box 45 205
104 30 Stockholm/Sweden

Telefon: 08/668 60 60

Postgiro: 64 38 80-8

Abonetî/Prenumeration
Kes/Enskilda: 100 Skr/sal/år
Meqam/Myndigheter:200 Skr/år

Îlan/Anons
Rûpelên navîn/Insidor:1000 Skr

Redaksiyon ne berpirsiyara nivîsarên bi îmze an nivîs û gotinên Federasyonê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tên şandin, heke çap jî nebin, li xwedî nayên vegerandin.

ISSN - 0281-5699
Sal: 9, Hejmar 2/90 (63)
April 1990

Naverok

Beşa Kurmancî ..... Rûpel
Raperîna gel, tirs xiste cergê dijmin! L. Cengîn 4
Sembolek di dîroka me de -Helepçe. L. Cengîn 7
Newroz agirê gur divêt 9
Îsmaîl Beşîkçî dîsa hat girtin 10
Bo girtîyên sîyasî dengê xwe bilind bikin 11
Kes nizane kê Kerîm kuştiye 12
8'adarê roja jinan pîroz be 13
10 sal bi hev re, N. Kirîv 14
Federasyona Kurd, organîzasyonek netewî û demokratîk, M. Kîper 18
Konferanseke çanda kurdî çima pêwist e?, Rohat
Di edebîyata me ya devkî de Ker û kertî, Amed Tîgrîs 20
Kesera neynikan, Dr. Kurdo Husên 22
Du helbestên kurmancî 24
Weşanên nû 25

Beşa Zazakî (Dimilî)

Kongreya Federasyonî, Koyo Berz 26
Himbazê to ê werî, Mihem Himbêlij 27

Hevalên hêja

Piştî kongra 10'em a Federasyonê, komîta kargêra nû, di civîna xwe ya pêşîn de kar û barê Federasyonê di nav xwe de parve kir. Berpirsîyarîya Berbangê min girt ser milên xwe. Berî her tiştî diviyabû pirsa pêkanîna redaksîyana Berbangê çareser bibûya. Wekî her sal, îsal jî redaksîyon bi derengî pêk hat. Ji bo beşa zarava kurdîya xwarû jî astengên teknîkî di roja pêşîn de derket pêşîya me ku diviyabû çareser bibûya. Bi derengî be jî îro redaksîyoneke Berbangê û îmkanên teknîkî ji bo beşa Kurdîya xwarû pêkhatine. Ev hejmara Berbangê encama van e. Em hêvî dikin ku bi alîkarîya we, em ê Berbangê di wexta xwe de bigihînin destê we.

Wekî hûn dizanin kongra federasyonê her sal di meha sibatê de pêk tê. Heta redaksîyona Berbangê pek were û karê xwe bi rê bixe, meha adarê bi ser de digre. Meha adarê him di dîroka kurdan de û him jî di rojane de bo me meheke taybetîye. Meha adarê him dîrokî û him jî rojane bi bûyerên xweş û ne xweş ve dagirtîye. Lewra kovar û rojnamên me nagihînin ku hejmara xwe ya piştî maha adarê bi hemû bûyerên dîrokî û rojanî yên qewimî ve, dagirin.

Me jî nikarîbû bû hemû çalakîyên Federasyonê û komelên endam, bûyerên li çar alîyê welêt û li derveyî welêt bi têra xwe an jî bi kurtî bigihanda vê hejmarê.

Hûn ê bikaribin di vê hejmarê de li ser bûyerên Nisêbînê, girtina Îsmaîl Beşîkçî, Canfêdaya Newrozê -Zekîye Alkan, bîranîna Helepçeyê, kongra 10'em û dehsalîya Federasyonê, 8'ê adarê roja jinan û xebat komîta girtîyan agahdar bibin.

Dîsa di beşa edebîyat û çandê de hûn ê bikaribin çîroka Dr. Husên Kurdo ya bi navê Kesera Neynikan, Xebata Amed Tîgrîs bi navê "di edebîyata me ya devkî de ker û kertî, helbesta Amed "Sirûtê Na" û helbesta Ahmed Huseynî "Ferat" û pirsa ku heval rohat dipirse "Konferanseke çanda kurdî çima pêwist e?" bixwînin.

Herweha me hêvî heye ku beşa zazakî îsal jî her hebe. Hûn ê di rûpelên 26, 27, 28' vê hejmarê de li rastî beşa zazakî werin.

Bi hêvîya ku ev hejmara li gor dilê we be...

N. Kirîv

www.arsivakurdi.org

Berxedana Nisêbînê bû serhildaneke tevayî

Raperîna gel, tirs xiste



"Em ji goristanê vedigerîyan malên xwe. Me xortê xwe bi gor kiribû, yê ku bi destê leşkerên tirkan do li Girê Sorê hatibû kuştin. Em nêzîkî 5-6 hezar kes bûn. Komandoyên bi navê "Özel tîm", derketin pêşîya me, di destpêkê de dest bi çêran kirin, dûre bi jopan li çend xortan xistin. Yekcar me hew tiştek dît... agir li ser me barandin. Xelkê nizanîbû çi bike. Her kes ketibû xewla canê xwe. Me dît ku wusa jî naqede, wê gelek kesên din jî bên qetilkirin. Me jî çi bidest ket, bi taybetî bi keviran me dest pê kir ku em xwe biparêzin ...Em hew karin tehemulî vê zordarîyê bikin. Xortekî me î 19 salî kuştin, gelek jî birîndar kirin..."

Nisêbînî ev gotinên ha ji rojnamevanan re digotin. Roja 15'ê adara 1990'î, hêzên leşkerî yên tirk, şerek eşkere li hember hemû xelkê vî bajarî îlan kirin. Bo çi?

Xelkê nisêbînê êdî kirasê bêdengîyê çirandibû. Li hember terora devletî, xwedî li kuştîyên xwe derdiket û dixwest şehîdên xwe bi serbilîndî bi gor bikin. Dewleta Tirkîyê jî mebesta xelkê Nisêbînê têdigihîşt û bi hêrîş bersîv dida.

Roja 13 adara 1990'î 13 gerilayên PKK'ê hatibûn kuştin. 3 kes ji wan Nisêbînî bûn. Hêzên dagîrkeran dixwest wekî hertim îcar jî şehîdan bi dizî binax bike û li dinyê bide zanîn ku ew "terorîstên bê xwedî" ne. Lê xelkê Nisêbînê ew daxwaza dijmin di gewrîya wan de hişt û lîstika wan betal kir. Bi hezran kes, çûn Bajarê Mêrdînê li ber Ordîgeha Tirkîyê ling dan erdê û kuştîyên xwe xwestin. Çar kuştî ji alîyê Nisêbinîyan hate naskirin. Yusuf Dundar, Kamuran Dundar, Omer Kavak û Abdulkerim Temel. Xelkê Nisêbînê bi ser dikeve û li şehîdên xwe xwedî derdike-



Çirîska hêviyê, vedijîne jîyanê!

cergê dijmin



Şemsettin Çîftçî ji alîyê leşkerên tirk hate kuştin





ve.

Roja 15 adarê bi hezaran Nisêbînî ji bo gorkirna Kamuran Dundar li bajêr dicivin û merasîmeke mezin li dar dixin. Hêzên dijmin ji vê ne rehet dibin, pêşî dest bi çêran dikin û dure bi çekên xwe êrîşê xelkê dikin gule dibarînin.

Şemsettîn Çîftçî xortekî 19 salî, hat qetilkirin û gelek kes jî di vî şerî de hat birîndar kirin. Bi sedan kes tev zaro û jin hatin girtin. Zarokekî 12 salî bi navê Mehmet Alî Gorele, piştî ku hate berdan weha digot:

"Ez birim qereqola polîsan. Li wir gelek zarok, jin, kal û pîr hatibûn girtin. Li hemîyan dixistin. Bi jop û kulman li min jî xistin. Dûre ez bi erdê re kişandim û bi pêhnan li her derê min xistin."

Belê, li alîyekî zarokekî 12 salî tê girtin û îşkencê dibîne û li alîyekî din hêzên leşkerî yên dewleta tirk, dewleta ku xwe Ewrûpayî dihesibîne, hovîtîya xwe eşkere dide xuyakirin. Rewş evqas eşkere ye ku gotin navê.

Nêzîkê hefteyekê telefonên Nisêbînê hatin birîn. Gava mirov telefon dikir, dengê jinekê dibihîst ku weha digot: "Ev axaftin ji bandê ye. Telefona ku hûn lê digerin û hemû telefonên vê herêmê meşgûl in. Dûre bi derengî careke din bigerin. Spas". Lê bi derengî dîsa bersîv eynî bû. Ketin û derketina ji bajêr jî qedexe bû. Rojnamevaneke Elmanî, Petra Leîna, ya ku xwestibû wêneyên bûyerên Nisêbînê bikşîne, hatibû girtin. Wê jî "nesîbê" xwe ji leşkerên tirk girtibû. Kamera wê hatibû şikandin. Her weha çend şeqam jî xwaribûn. Dûre rojnamevanekî swêdî jî dihat girtin. Derxistina nivîs û wêne ji Kurdistanê qedexe bû!

Berxwedana Nisêbînê dibe serîhildaneke tevayî

Bûyerên Nisêbînê bi awakî zû li gelek bajarên din yên Kurdistanê belav bûbûn. Piştgirî bo berxwedana Nisêbînê dihat nîşandan. Bi hezaran kes li Dîyarbekirê, Elezîzê, Enqerê, Stenbolê û li gelek bajarên din dihatin girtin. Lê tiştekî tebîî bû ku bajarên derdora Nisêbînê herî zêde piştgiriya xwe nîşan didan. Li Mîdyadê, Qiziltepê, Silopîya, Cezîra Botan, Dêrik, Çinar, Tatwan, Dîcle, Farqîn û li gelek bajarên din xelkê bi rojan dikanên xwe digirtin. Lê di roja 20'adarê de bûyera herî mezin diqewimî.

Li Cezîra Botan bi hezaran kesî bo piştgiriya Nisêbînê meş organîze dikirin. Leşkerên tirk gava ev tişt didîtin bi hovîtîyeke mezin, dest pê dikirin ku gule li xelkê bibarînin. Li gor çavkaniyên resmî 5 kes hatine kuştin, 9 kes jî birîndar bûbûn. Xelkê Cezîra Botan dîyar kir ku ev hejmar zêdetir e.

Serokwezîrê Tirkîyê da xuyakirin ku eger raperîna gel berdewam bibe, wê bi awakî fereh, hêzên leşkerî bêne şandin. Sîyasetzanê tirk ev bûyerên dawî li Kurdistanê, mîna îlankirina şerekî di navberê milletê kurd û leşkerên dewleta Tirkîye de didîtin.

Dewleta Tirkîyê bi biryarnameke nû derdikeve pêşîya gelê kurd

"Demokrasî li Rojilata Başûr (ango Kurdistan, L.C.) nikare derbasî jiyanê bibe, ji ber ku wê li dijî dewleta Tirkîyê bête bikaranîn. Demokrasiyek li wir ne pêwiste."

Ev gotin ji alîyê Îsmaîl Kose, nûnerê Partîya Reya Rast-DYP dihat gotin.

Belê, dewleta Tirkîyê dîyar dikir ku wê zardarîya xwe li ser gelê kurd bidomîne. Piştî serîhildanên gelê kurd li gelek bajarên Kurdistanê, hukumeta tirk û hemû partîyên li parlamentoyê bi

www.arsivakurdi.org

hev re yekdengîya xwe li dijî daxwaza gelê kurd beyan kirin. Tew kurê paşê, Erdal Inonu pêşdetir diçû û ev gotin ji devê xwe derdixist: "Ger ez mecbûr bibim, bo parastina dewleta Tirkîyê ez ê rahijim çek û biçim li hemberî terorîstan şer bikim. Ez ê bi dil û can vî tiştî bikim". Serokê Partîya Reya Rast, Suleyman Demîrel jî bê deng nedima û zirtên xwe dikir: "hebûna problemên li hemberî yekîtîya dewleta Tirkîyê, dihêle ku em piştgirîya hukumeta Enqerê bikin."

Wek tê dîtin ku bûyerên pêşveçûnên dawî li Kurdistanê, tirseke mezin xistiye dilê dagîrkeran. Li Hember vî tiştî hêzên sîyasî yên parlamentoya dewleta Tirkîyê tavilê yek bûn û di tespêka meha nîsanê de biryarnameke kolonyalistî anîn holê. Li gor Biryanama 413'an:

- Rojname, televîzyan û radyo ji nuha pêve li gor parastina dewletê wê bên sansurkirin.
- Li Kurdistanê 90.000 hêzên leşkerî, wê li yên berê zede bibe.
- Kesên ku alîkarîya "terorîstan" dikin wê ji Kurdistabê bên durxistin.
- Kesên ku li dijî dewletê dixebitin, wê bên sirgunkirin.
- Hejmar û maaşên parêzkerên gundan wê bête zêdekirin.
- Cezayên bidardekirinê yên têkoşerên kurdan wê bên înfazkirin.
- Şirnax û Batman wê bibin wîlayet.
- Parlamenter û karmendên dewletê, yên ku piştgirîya kurdan dikin wê ji karên xwe bibin.

Piştî biryarnamê hêzên dewletê dest bi zordarîyên nû kirin. Di roja 21'ê nîsanê de serokê beledîya Nisêbînê, Muslum Yildirim bi biryara Wezîrê Hundirî ji kar karê xwe hat dûrxistin.

Li Kurdistanê jî xelkê li dijî vê biryarnamê biryarek girt ku kovar û rojnamên tirkî li Kurdistanê neyên kirîn. Lê hêvîya yekîtîya hemû hêz û xelkê kurd xurtir û germtir dibe.

Belê li Kurdistanê şerek her berdewam e; Şerekî di navbera ronahî û tarîyê de, şerê hêzên azadîxwaz û zordaran. Li alîyekî xelkê kurd e ku azadîyê dixwaze û li alîyê din hêza dewleta tirk ku zordarîyê dixwaze. Bi hêvîya serketineke zûtir bo xelkê kurd.

L. Cengîn

... Û vê carê jî Nisêbîn û Cezîra Botan!

Çekên kîmyewî, zilm, zordarî, tade, koçkirin, terorîzma dewletê, kuştin, xwîn... bûne jiyana rojane bo netewa kurd. Roj tuneye, ku li welatê me bûyerek wusa derbas nebe. Gava li cîhanê pêlen pozîtîf hikim dikin, gava qala aşîtî, demokrasî û nezîkahî, mafên netewan tê kirin, li ezmanên Kurdistanê ewrên reş û tarî pêlvedidin.

Dîroka me ya nêzîk nîşanek xwiya ye ku dagirkerên welatê me, bê hilbijartin hemî metodên nemirovatî û hov li hember têkoşîna me ya netewî bi kar tînin. Di vî şerê newekhev de mirovên welatê me bi tevayî dibin hedefa çekên dijmin. Helebce, Behdînan, Mehabad, Şemdînan, Silopî... Îro jî Nisêbîn û Cezîra Botan numûnên li ber çavan in. Hemûyên van bajaran ji alîyekî ve bi hovîtî û terora dijmin û ji alîyê din ve bi serhildan û berxwedana netewekî 30 mîlyon. Carek dî tevîya van navan girêdayne weke şermekê bo dehsalîya dawîya sedsala 20-an.

Parastina mafên netewa kurd ne tenê pêwistî û barek e bo zaroyên xaka Kurdistanê, eva barek û pêwistîyek e bo hemû mirovatîyê. Cîhan şahid e û nikare çavên xwe bigre ji bo rastîya pirsa kurdî, ji bo rastîya têkoşîna ku li ser xaka Kurdistanê berdewam dibe, ji bo rastîya ku ev netewe serî natewîne. Gelê kurd her dê bitêkoşa bo bidestxistina mefên xwe yên netewî. Li hember vê têkoşîna adîlane, bo parastina hebûna netewa kurd, terorîzm û zilma ku tê bikaranîn ji alîyê welatên dagirker, cîhan nikare bê deng bimîne. Ne mumkun e ku Kurdistan ji rastîya dunyê bê îzolekirin. Pêwist e mirovayetî bo parastina hebûna gelê kurd dengê xwe bilind bike, bo ku zarokên kurd bi zanîna pêşerojek durist, jiyana xwe di warekî aşîtî û bê tirs de bijîn. Bo ku karibin bi zimanê xwe bigrîn û bikenin.

Mixabin bûyerên ku li welatê me pêk tên gelek dûr in ji hêvîyên tiştên jorîn. Li Nisêbînê hêzên leşkerî yên Tirkîyê di gorkirina şehîdekî welatparêz de agir li xelkê me barandin, xortekî 19 salî kuştin û gelek kes jî birîndar kirin. Xetên telefonên bajêr hatin birîn. Ketin û derketina ji bajêr hate qedexekirin, sansurek nedîtî hate danîn. Çend rojnamevanên biyanî ku dixwestin bûyera Nisêbînê bikin belge, hatin girtin. Tewrê hêzên dijmin eşkere weha bû: "Em çawa bixwazin em ê wusa bikin, em ê xwînê birjînin û kes nikare bibe asteng". Wilo jî kirin. Bi sedan kes li Nisêbînê hatin girtin, bi tevî jin û zarok. Bûyerên Nisêbînê li gelek bajarên Kurdistanê zû belav bûn. Gelê kurd li Silopî, Xezaxê, Dîyarbekirê, Entabê... bo piştgirîya Nisêbînê dengê xwe hildan. Li Cezîra Botan di meşa piştgirîya Nisêbînê de leşkerên tirk yên faşîst careke din agir barandin, çar kes kuştin, neh kes birîndar kirin! Bi hezaran leşkerên tirk girtin ser Cezîrê û ji nû ew îşgal kirin.

Metodên osmanî yên nîjadperest careke din bi rûreşî ji alîyê dewleta tirk ve tên bikaranîn. Leşker dikevin malan, kesên dibînin digrîn, kom dikin û dibin, lê kes nizane bi kû de.. Lê gelê kurd berxwedana xwe didomîne. Rabûye ser pîyan û bang dide -Bes e ev zordarî, bes e ev zilm! Rûpelên dîroka Kurdistanê bi serhildanan xemilandî ye. Ta ku gelê kurd li ser xaka welatê xwe serbixwe û azad bijî, ev dîrok wê bi berxwedan û têkoşîna netewa kurd gewre bibe. Ta ku rûpela zêrîn ya dawîya dagirkeran bê nivîsandin.

Li Ewrûpayê di demek herî zû de, bi awakî xurt pêwist e piştgirî bo bûyerên Nisêbînê, Cezîra Botan û tevîya welat bên nîşandan. Roj, roja xebatê, roja denghildanên bilind e!

Sembolek di dîroka me de -Helepçe

*** Di bîranîna du salîya Helebçe de bi hezaran kurd li her çar alîyê Kurdistan û li derveyî welêt, daxwazkirin ku roja Helepçe -16 adarê- bibe roja navnetewî bo qedexekirina çekên kîmyewî.**



Du salinku Bajarê Helepçe xopan û bê xwedî maye.

Du sal derbasbûn ji roja jenosîda Helebçeyê, ji roja ku netewa kurd kete şîneke ji yên herî mezin di tevayîya dîroka xwe de. Bikaranîna çekên kîmyewî ji alîyê BAAS'a faşî ya Îraqê, ev bajarê şêrîn yê Kurdistanê ji xerîtan mixand. Helebçe di riya têkoşîna netewa Kurd de derbasî rêza herî pêş ya karwanê şehîdên kurd bû. 5000 jin, kal û pîr û mindalên kurd di navbera çend deqîqan de hatin qetilkirin, bi hezaran birîndar bûn. Navê Helebçe bû sembolek ne tenê di dîroka kurd de, ew bû sembolek bo teviya mirovatîyê -ji bo qedexekirina çekên kîmyewî û bîyolojîk. Bo vê çendê di bîranîna du salîya Helepçê de, gelê kurd daxwaz kir ku roja 16 adarê bibe roja navnetewî bo qedexekirina çekên kîmyewî. Li her çar alîyên Kurdistanê û li derveyî welêt bi hezaran kurd meş, civînên bîranîn û prostetoyê pêkanîn.

Stockholm: Roja 16 adarê şeva bîranîna Helepçeyê û roja 17 Adarê meşa protestoyê li dijî sefareta Îraqê pêk hat.

Şeva bîranîna Helepçeyê ji alîyê Berey Kurdistan-Îraq, Tevger û Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê hatibû organîzekirin, 400 kurd û dostên gelê kurd beşdar bûbûn. Ji parlamenterên swêdî Hans Göran Frank (sosyaldemokrat) û Berit Eriksson (Partîya cep a kominîst) di destpêka meha adarê de çûbûn Îraqê li Kurdistanê gerîyabûn, serpêhatîyên xwe û C.H. Herrmansson jî li ser navê Komîta Swedî dîtinên xwe anîn zimên, piştgirîyê xwe nîşan dan.

Roja 17 adarê jî, dîsa Berey Kurdistan- Îraqê, Tevger û Federasyon bi hev re meşa protestoyê li dijî seferata Îraqê pêkanîn û nêzî 2000 kurd û swêdî beşdarî meşê bûn.

Bollnäs: Komela Kurd li Bollnäsê ji navenda bajêr heta meydana Broyê (Brotorgetê) meşa prostestoyê pêk anî. Li meydana Brotorgetê li ser navê komelê Miro û li ser navê daîra mihacirên beledîya Bollnäsê Ingegärd Kock axaftin. Temsilcîyên hemû partîyên swêdî di meşê de amade bûn. Nêzî 100 kesî beşdarî li meşê kir.

Alfta: Komela Kurd li Alftayê di centruma bajêr de meşa bîranîn û protestoya Helepçê pêkanî. Serokê komelê Nurî Haco li ser navê komelê axaft. Bi navê "Helepçê ji bîr meke" maqaleyeke Nurî Haco jî di rojnama Ljusnan de roja 16 adarê hatibû weşandin.



Li bajarên Tirkîyê û Kurdistanê jî bi hezaran însan di roja 16'ê adarê de Helebçeyê bi bîr anîn.

www.arsivakurdi.org



Wêneyek ji wêneyên Helepçê, yên ku tu car nayên jibîrkirin. Foto: Stefan Hjertén

Uppsala: Li Uppsalayê îsal jî meşa protestoyê bo qirkirina Helepçeyê ji alîyê Komela Kurd li Uppsalayê hat organîze kirin.

Eskilstuna: Komela Kurd li Eskilstunayê ji bo bîranîna Helepçeyê roja 16 adarê seet:16.00'an li Meydana Fristadê mitîngek û seet 6'ê êvarî jî li salona ABF'ê semînerek pêkanî.

Kurdistana Bakur: Li Dîyarbekir, Elezîz, Sîlvan, Qiziltepe, Cezîra Botan, Malatya û li gelek bajar û herêmên din meş û civîn bo bîranîna Helepçê hatin organîzekirin. Di gelek meş û xebatên protestoyê de hêzên leşkerî û polîsên dewleta tirk hêrîş birin ser xelkê. Gelek kes hatin girtin û gelek kes jî birîndar bûn. Lê bi hawakî giştî hêrîş û zilma dewleta tirk nikarîbû xebat û meşên bîranînê bidin sekinandin. Di hin meşan de çend rojnamevanên biyanî ku dixwestin wêne bikşînin, ji alîyê polîsên tirk hatin girtin.

Tirkîye: Li gelek zanîngehên bajarên Tirkîyê, wekî Stenbol, Enqere, Îzmîr û Edene, xwendevanên kurd bi xwendevanên tirk yên pêşverû re ji bo bîranîna Helepçê neketin dersên xwe û civînên protestoyê pêkanîn. Li gelek cîyan di navbera polîs û xwendavanan de şer derket. Gelek kes hatin girtin. Her weha li Stenbolê welatperwerên kurd komîteyek amade kirin û kampanyeke îmzedayînê jî organîze kirin. Komîte bi Federasyonê re têkilî danî û alîkarî xwest. Federasyonê jî alîkarîya komîtê kir.

Pakîstan:

Penaberên kurd roja Helepçeyê li Rewilbendî, Bajarê Pakîstanê, civînek biranîna Helepçeyê li dar xistin. Kurdên penaber ên ku li bajarê Islamabadê bi cî bûbûn û gelek mêvanên pakistanî jî di vê civînê de amade bûn.

Kurdên penaber û mêvanên civînê bi hev re biryar girtin ku daxwazên xwe di bangawazekî de bigihînên raya girştî ya cîhanê. Ev in daxwazên wan: 1-Roja Helepçê bibe rojek cihanî ji bo qedexekirina çekên kîmyeyî, 2-Divê hêzên aştîxwazên dunyê zixtê bidin rejîma Îraqê da ku ew dev ji qirkirina gelê kurd berde, 3- Divê hemû girtîyên kurd azad bin, 4-Penaberên kurd vegerin welatê xwe, 5- Pirsa kurd bi rîya aşîtî bê çareserkirin.

Di du salîya qirkirina Helepçê de gelê kurd, careke din da dîyarkirin ku qirkirina Helebçê ji bîr nake û 16 adarê wê bibe roja bîranîn, protesto û têkoşîna li dijê çekên kîmyewî. Her wisa wê xebat bête kirin bo qebûlkirina 16'adarê wekî rojeke navnetewî li dijî çekên kîmyawî.

L. Cengîn



Li Pakîstanê penaberên kurd têkoşîna azadîyê didomînin û her doza mafên xwe dikin.

www.arsivakurdi.org

Keça kurd Zekîye Alkan, roja Newrozê li navenda Dîyarbekirê agir berda canê xwe û got:

Newroz, agirê gur divêt

Raperîna Nisêbînê, silav divêt



dar dibû.

Zekîye di roja 23'yê adara 1990'î de, bi hezaran hevalên xwe di xemgînîyeke kûr de hişt û bû canfêdaya NEROZÊ û TÊKOŞÎNA AZADÎYÊ.

* **Xwendekara Fakulta Tendurîstî ya Universîta Diclê Li Dîyarbekirê, Zekîye Alkan ji bo ku zordarîya dewletê protesto bike, roja 16'adarê li navenda Dîyarbekirê, benzîn bi ser xwe de reşand û agir berda canê şêrîn. Zekîye heftekê di komayê de jîya û roja 23'ê adarê li nexweşxana Hacatepê li Enqerê serê xwe danî.**
* **5000 xwendekarên hemû beşên Universîtê û lîseyên Dîyarbekirê xwendina xwe dan sekinandin.**

"Min ev kar bi zanatî û bi daxwaza xwe kir. Ev tewrê min li dijî rejîm û dewletê ye. Bila kes li du min gotinên hîçûpûç meke.."

Ev gotin. Zekîye li nexweşxanê ji birayê xwe re digot. Ji ber ku gelek gotinên ne rast hatibûn gotin di derheqê bûyera Zekîyê de. Polîsên tirk dixwestin tewrê Zekîyê veşêrin û loma agahdarîyê ne rast didan rojnamevanan. Wan digot "bombe di desta de teqyaye".

Çi heye ku Zekîye bi canê xwe yê şevitî, di halê xwe yê dijwar de fersend nedida ku ev gotinên ha balav bibin û eşkere digot:

"Newroz agirê gur divêt, berxwedana Nisêbînê silav divêt".

Zekîye sala 1965'an de li bajarê Kelkîtê qeza Gümüşhanê ji diya xwe bûye. Kurda dimîlî(zaza) bû. Di sala 1984'an ji bo xwendina bilind hatibû Dîyarbekirê. Di Fakulta Tenduristîyê de dixwend. Ew li Dîyarbekirê bi şêweyekî aktîf beşdarî tekoşîna gelê xwe dibû. Di meşên prosteyê de, di grewên birçîbûnê yên yên bo mafên girtîyan de, di grewên karkeran ji bo mafên çînayetî de, di munaqeşeyên sîyasî de, di têkoşîna xwendekaran de Zekîye her beş-

NEWROZ ÎSAL JÎ BÛ ROJA TÊKOŞÎNÊ

Wekî her sal îsal jî Cejna Neroz, li hin deran bû roja şahîyê li hin deran bû roja berxwedan û têkoşînê.

Li Dîyarbekirê li bajêr xelk û li Univesîta Dicleyê Xwendakaran ala kurdî li ba kirin, agirê Newrozê pêxistin û li dor êgir govendê girtin. Polîs û leşkerên tirk wekî segên har ketin kûçên Dîyarbekirê ji bo ku têkoşerên kurd bigrin.

Li gelek gund û bajarên Kurdistanê serîhildana gelê kurd ku piştî bûyera Nisêbînê dest pê kiribû, xwe gihand roja Newrozê jî. Her weha roja biranîna Helebçê, serîhildanên gelî li Kurdistanê û Roja Newrozê bi hev re meha adarê kirin meha têkoşînê. Daxwaza bêdenghiştina gelê kurd, di gewrîya dijmin de ma.

Li welatên Ewrûpê û li Swêdê jî pîrozkirina Newrozê bi şevên şahî li dar ket.

Federasyona komelên kurdistanê û gelek komelên endam bi şevên şahîyê bi hezaran kurd anîn ba hev da ku bi hev re govendê bigrin û stranên xwe bêjin.



Li Dîyabekirê xwendekarên Universîta Dîclê li dor agirê Newrozê, ala rengîn li bakirin û bi govendê girtin.

Dengbêja hêja Şêrîn, 21'ê adarê li Stenbolê beşdarî li şeva Newrozê kir. Şêrîn ne neheq e ku dibêje " Di vê şevê de amadebûna min, bo min dîrokî ye".

www.arsivkurdi.org

Îsmaîl Beşîkçî Sala 1987'an ji girtîxanê derket û pirtûkeke din bi navê "Kurdistan, kolonîyeke di navbera dewletan de" weşand:

Îsmaîl Beşîkçî dîsa hat girtin

*** Dewleteke kolonyalîst, bi îdololojîya xwe ya nemeşrû, li hemberî sosyologekî hişaza û rastgoyekî nimûne, Îsmaîl Beşîkçî bêçare maye. Qanûnên bi cezayên giran, dadgehên leşkerî û girtîxanên "taybetî" jî bêfêde ne.**





Berbang hejmareke taybetî li ser Îsmaîl Beşîkçî derxistibû. Biner Berbanga 5/87

Îsmaîl Beşîkçî, ji sala 1967'an vir de ye, her li ser kurd û Kurdistanê dinivîsîne, her nemeşrûbûna îdeoljî û qanûnên resmî yên dewleta tirk eşkere dike û her ji bo vê tê girtin. Cara dawîn di gulana 1987'an de ji girtîgehê derketibû û heta wê çaxê 10 sal û 10 mehan li girtîxanan de jîyabû. Hîç ne xema wî bû. Wî dîsa di kovar û rojnamên tirk û kurdan de dîtinên xwe digot, beşdarî munaqeşeyên li ser pirsa kurdî dibû û rexne li durûtîya ronakbîrên tirk digirt. Bingeha tewrê xwe weha dida zanîn:

"Ku gotinên meriv hebin, divê li her derê bên gotin. Divê qanûnên cezayî an jî qanûnên esasî wekî asteng neyên dîtin. Ev qanûn, bila ji alîyê penc general an jî 450 parlamenteran hatibin qebûlkirin, eger li dijî azadîya raman bin, nemeşrû ne. Meriv divê ramanên xwe eşkere bibêje, ku ceza jî bidin ne xem e. Li hember dezgehên wan jî divê meriv ramanên xwe biparêze." Ji ber vê ye ku Îsmaîl Beşîkçî her ramanên xwe eşkere dinivîse, diparêze û bêxem singa xwe dide ber cezayên dadgehê.

Îsmaîl Beşîkçî di destpêka salên 1960'an de, li Kurdistanê dibe karmend û dûre bo vatiniya xwe ya leşkerî diçe Bîtlîsê. Wê çaxê rewşa kurdan û Kurdistanê nas dike. Li unîversîtê ji bo doktorîya beşa sosyologîyê, li ser eşîreta Elîkan tezekê amade dike. Dûre dest bi lêkolînên xwe yên ilmî dike û pirtûkên bi navê "Analîza Mitîngên Rojhilatê" û "Pergala Rojhilata Anadolê" diweşîne.

Ji ber van xebatên ilmî, Dewleta tirk mamostetîya unîversîtê ji Îsmaîl Beşîkçî digre û di sala 1971'an de davêjin girtîxanê. 1974'an ji hefsê derdikeve û lêkolînên xwe didomîne. 3 Pirtûkên din "Metodê Ilmî", "Teza tarîxê ya tirkan, teorîya ziman û pirsa kurd" û "Desatûra Firka Gelî ya Cumhî û pirsa kurd" diweşîne û sala 1979, ji nû ve tê girtin. Di sala 1981'e du mehan li derve dimîne û ji ber nameyekî ku ji Yekîtîya Nivîskarên Swîsrê re nivîsîbû, 10 sal ceza girtîmayinê digre. Ji gulana 1987'an Îsmaîl Beşîkçî li derve bû û dîsa xebatê xwe didomand û pirtûka xwe ya nû weşand.

Li tirkîyê û li dervayî welêt, ji bo azadîya Îsmaîl Beşîkçî gelek kampanyayên cuda cuda dest pê kirine. Li Îsatanbûlê Komîteyek pêk hatîya. Komîta Girtîyan ya Federasyonê jî qertên îmzedayinê çapkiriye û kesên bixwazin dikarin imza bikin û ji Serokkomarê Tirkîyê Turgut Özal re bişînin.

Beşdarî kampanyayê bibin! Îsmaîl Beşîkçî ji bo me dengê xwe bilind dike, divê em jî ji bo wî bêdeng nemînin!

www.arsiv.org

BO GIRTÎYÊN SÎYASÎ
DENGÊ XWE BILIND BIKIN

*** Komîta Piştgirîya Girtîyên Sîyasî ji bo ku bala raya giştî ya mirovperwerên cîhanê û bala şoreşger û demokratên kurd bikşîne ser rewşa girtîyên sîyasî û ji bo ku ew bêdeng nemînin, dengê xwe bilind bikin, belavokek belav kir.**

*** Komîta Girtîya ji bo azadîya Îsmaîl Beşîkçî kampanya vekir.**

Wekî hûn dizanin Komîta Girtîya 2 sal berê ji alîyê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê hatibû damezrandin. Ev du sal in ku komîte kar û xebatên xwe didomîne, ji alî maddî û manewî de piştgirî û alîkarîya girtîyên kurdên sîyasî dike.

Piştî kongra 10'em ya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, hejmarên endamên komîtê bi beşdarbûna xuşka Zîlan û heval Henefî Celeplî zêde bû. Komîten ji bo sala nû programeke xebatê amade kirîye. Li gor vê programê komîte wê piştgirîya têkoşîna azadîya girtîyan bike, alîkarîya xwe ya maddî û manewî pêşkeşî wan bike, jîyana giştî ya li girtîxanan û rewşa taybetî ya girtîyan bi raya giştî bide nasîn.

Komîtê biryar girtîye ku ne tenê ji bo mafên tevayîya hemû girtîyên sîyasî, herweha dê ji bo azadîya girtîyên taybetî jî bitêkoşe -wekî ku ji bo Îsmaîl Beşîkçî. Li gor vê biryarê, Komîta Girtîya ji bo azadîya Sosyologê tirk Îsmaîl Beşîkçî dest bi kampanyeke giştî kiriye û qertên îmzayê bi wênê Îsmaîl Beşîkçî çap kiriye ku kesên bixwazin dikarin li Komelên Endamên Federasyonê an jî yekser li Federasyonê bi dest bixin, îmza bikin û ji serokomarê Tirkîyê Turgut Özal re bişînin.

Komîta Girtîya li ser rewşa girtîyên sîyasî belavokek jî belav kirîye. Beşekî belavokê li jêr e:

"..Dewleta tirk êdî nikare îşkence, zulim û wehşeta xwe veşêre. Zilma wê gelek caran ji alîyê rêxistinên demokratîk û însanî ve hatîye xuya kirin. Vê dawîyê 'Yekîtîya Avûqatên Newyork' di rapora xwe ya li ser mafên mirovî cî da zilma li ser girtîyên polîtîk û eşkere kir ku "li Tirkîyê îşkence her berdewam e". (08.12.1989) Girtîyên polîtîk li dijî zilma dewleta tirk hertim li ber xwe dane; qanûnên li dij jîyana însanî, rewşa nebaş ya girtîxanan, îşkence û lêdan tim û tim bûn sedemê berxwedana girtîyan û ev berxwedanên ha jî carna bi şehîdketina çend girtîyan, biserketine.

Dewleta kolonyalist niha jî dixwaze bi riya "hucrên yekane" û bernama "bi tena serê xwe derketina hewşê" girtîyên polîtîk dûrî hev bike. Girtîxanên 'Eskişehir' û 'Doloyboya-Istanbul' li gor vê sîstemê hatine avakirin. Armanca vê yekê jî tenêhiştina girtîyan û ji alîyê psikolojî ve hilweşandina bîr û ramanên wan e.

Li hemû girtîxanên Tirkîyê bêhuzûrîya vê yekê tê jiyîn. Dewlet dixwaze dest deyne ser gelek mafên girtîyan ku bi mirinê hatibûn bidestxistin. Girtîyên nexweş bo nexweşxanan



nayên hinartin, girtî bê derman û doktor dihêlin. Heta niha bi dehan girtî ji ber van sedeman mirine. Bo nimûne; li girtîxana bajarê 'ydinê girtî Sedat Karaagaç bi nexweşîya kanserê ketîye. Dîsan li vê girtîxanê Kemal Aktaş, Remzî Kaya û Şükrü Göktaş ku ji ber rojîya birçîbûnê di mejîyê wan de tehrîbatin bûne, pir nexweş în û eger neçin nexweşxanan dê di demeke nêzîk de bimrin. Li girtîxana bajarê Gaziantepê girtî Feyzi Özdemir û gelek girtîyên din di vê rewşê de ne.

Eger em naxwazin dewleta tirk qetliyameke din bike, divê ji niha de em dengê xwe bilind bikin, li hember vê rewşa girtîyên polîtîk bêdeng nemînin. Divê em li girtîyên polîtîk û li berxwedanên wan xwedî derkevin.

- Azadî bo Ismail Beşikçi!
- Bila sîstema Hucreyên yekmirovî û bînvedana bi tena xwe betal bibe!
- Bila girtîyên nexweş bên tedawî kirin!
- Bila girtî Sedat Karaagaç yekser bo nexweşxana kanserê bê hinartin!
- Bila Beyanama 1'ê tebaxê bê rakirin!
- Bila zîndan bên valakirin!

Komîta Piştgirîya Girtîyên Polîtîk
Ya Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê.

www.arsiv.kurdi.org

Kurdê welatperwer Kerîm Muhemedzada li mala xwe hat kuştin.

Kes nizane kê kuştiye

*** Roja 2.3 1990'î li Nynäshamnê, endamê komela Kurd li Nynäshamnê li mala xwe kuştî hat dîtin. Heta niha kes nizane Kerîm Mihemmedzade ji alîyê kê û ji bo çi hatîye kuştin. 10 polîsên Nynäshamnê li şopa kuşdaran digerin û tu agahdariyê nadin der.**

Roja 2.3.1990'i li Nynäshamnê, hevalên Kerîm Muhemedzade ji bo seredanekê diçin mala Kerîm, lê kes ne li mal e. Kerîm rojên dawî li tu derî xuya nake. Ji derîyê postê li hundir dinêrin. Li paş derî li erdê xwînê dibînin û agahdarîyê didin polîs. Polîs derî vedikin, dikevin hundir û li hemamê Kerîm kuştî dibînin. Kuşdarên Kerîm li du xwe tu şop nehiştine. Bes cuzdana peran wenda ye. Şikek heye ku kesên diz Kerîm kuştibin. Polîs wekî îhtîmalên din, îhtîmala cineyetekî sîyasî jî mumkun dibîne. Polis heta nuha li ser kuştina Kerîm tu agahdarîyek belav nekiriye. Deh polîs li şopa kuşdaran digerin.



Kerîm Mihemedzade kurdekî 30 salî û ji Kurdistana Îranê bû. Di dawîya sala 1988'an de 15 peşmergeyên birîndar yên Partîya Demokrat a Kurdistan-Îran, hatin Swêdê ku yek ji wana Kerîm Muhemmedzade bû. Kerîm bi alîkarîya dewleta Swêdê ji bo tedawîyê hatibû. Hê birînên wî rehet nebûbû û tedawîya xwe didomand.

Kerîm berîya ku were Swêdê di refên pêşmergeyên KDP-Îranê de li dijî rejîma Îranê şer dikir.

Kerîm Mihemedzade li beledîya Nynäshamnê bi cî bûbû û li wir dest bi xwendinê kiribû. Wî li gel hevalên xwe yên kurd başdarî li xebata damezrandina Komela Kurd li Nynäshamnê kir û yek ji endamên komelê bû.

Hevalê Kerîm, nûnerê KDP-Îran û endamê Komîta Kargêr ya Federasyonê Îbrahîm Çorapçî li ser pirsa kuştina Kerîm weha digot:

-Rewş û danûstandina heval Kerîm baş bû. Ez hê jî bawer nakim ku sedemek hebe ku kesek bixwaze Kerîm bikuje. Em pir xemgîn in ji ber ku Kerîm hevalekî welatperwer û pêşmergeyekî zîrek bû.

Li dibistana Kerîm jî, hevalên wî yên xwendevan û mamostên wî jî xemgîn in. Rektorê dibistanê Odd Andersson ji rojnama Nynäshamns Posten re weha dibêje:

-Em niha di navbera xwe de li ser vê bûyerê dipevin ku em ê çawa vî rewşa dijwar berteref bikin. Bi rastî gelek dijwar e ku hevalekî me bi vî şêweyî ji nav me diçe.

Bêdengîya çapemenîya swêdî ya li ser bûyerên li Kurdistanê, ji alîyê Federasyonê ve hat protestokirin.

Di roja 14.04.1990'an de bi serpereştîya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, kurdên li Swêdê li dor avahîyên rojnamên mezin yên swêdî û li ber avahîya radyo û televizyona swêdî civîyan.

Di pankart û bandrolan de, Federasyonê bi nivîs û sloganên li dijî bêdengîya radyo û tv. û rojnamên swêdî nerazîbûna xwe xuya kir. Serokê Federasyona Kurdan; Keya Îzol li ber avahîyên rojnaman û li ber avahîya radyo û televizyonê, li ser armanca civîna protestoyê peyivî: " Li her çar perçên Kurdistanê jî, li dijî gelê kurd şerekî barbarî dom dike. Li ser bûyerên li welatê me, çapemenîya gelek welatan nûnerên xwe dişînin Kurdistanê, bûyerên li wir ji nêzîk teqîb dikin û di rojnamên xwe de dinivîsin. Lê çapemenîya swêdî, -tevî şer û bûyerên li dijî gelê me jî- heta niha jî bêdeng maye. Em vê bêdengîyê protesto dikin. Berpirssîyarên Federasyonê belavokên li ser bûyerên li Kurdistanê û armancên protestoyê gihandin berpirsîyarên rojname û radyoya swêdî. Cihgirê şefê redaksîyona rojnama 'Dagens Nyheter' Jan Wifstrand li ser gotinên karmendên Federasyonê weha peyivî: " Ne rast e ku em li ser bûyerên li Kurdistanê bêdeng in. Me di rojnama xwe de gelek caran li ser vê yekê nivîsandîye. Lê bi ya min sedemekî bêdengîyê ew e ku em nikarin rastîya dengûbasan kontrol bikin, çunkî me îmkanên hinartina nûneran ji bo cihên bûyeran tune. Sedemeke din jî ew e ku vê dawîyê li rojhilata Ewrûpayê pir tişt diqewimin." Ji televizyona swêdî, berpirsê beşa nûçeyên derve, Bengt Norborg jî li ser îddîayên karmendên Federasyonê weha axaft: " Bêdengîya me ne bi zanîn e. Lê ez qebûl dikim ku me bi awayê ku pêwîst bûyer ron nekirine. Dîsan bûyerên li Ewrûpa rojhilat cih li nûçeyên din teng kirine. Lê ez bawer nakim, yên ku hatine jibîrkirin bi tenê kurd in"

Ji destpêka civînên protestoyê, heta dawîya civînan belavokên bûyerên Kurdistanê hatin belavkirin.

www.arsiv.kurd.org

Komela Demokrat a Jinên Kurd
konferansek li ser "8'ê adarê roja jinan" civand:

8'ê adarê roja jinan pîroz be

Roja 11'ê adara 1990'î, Komela demokrat a Jinên Kurd li Stokholmê ji bo pîrozkirina 8'ê adarê -Roja Jinan-, konferansek pêkanî. Ji her çar parçên Kurdistanê jinên kurd yên li Swêdê, nûnerên rêxistin û komelên kurd û mêvanên swêdî li ser navê rêxistin û dezgehên resmî beşdarî konferansê bûn.

Ew kesên ku di konferansê de li gorî mijarên cûrbecûr peyivîne, ev in

Şermîn li ser navê Komela Demokrat a Jinên Kurd peyivî û rewşa jinên kurd li Swêdê, zilma hukumetan li ser jinên kurd, zilma li ser jinên girtî li Kurdistanê û komela jinan kat kir.

Iris Olsson li ser navê Daîra Bîyanî ya Beledîya Stockholmê, qala girîngîya hebûna komelên biyanîyan li Swêdê kir û piştgirîya daîra xwe ji bo komela jinan û xebatên wan da xuyanî kirin.

Margaret Björn li ser navê rêxistina jinan K.K.F di programê de cih girt û bi tevayî behsa pirsa perwerdekirinê kir.

Bermal bi kurtî dîroka 8'ê adarê -roja jinan- anî ser zimên. Bermal di axaftina xwe de bûyera 6 jinên kurd ya ku sala 1979'an li Tirkîyê, ji ber pîrozkirina 8'adarê bi 48 salan hatibûn mehkûmkirin, bi bîr anî.

Emîne li ser 8'ê adarê peyivî.

Şermîn li ser mijara "Jinên kurd ji do, ta îro" peyivî û bi hatina desthilatîya îslamî, li Kurdistanê tesîrên dînî û rewşa jinên kurd berpêş kir.

Nezîha Qoçanî behsa rewşa jinên kurd li Kurdistana Îraqê kir.

Perwîn: Li ser rewşa jinên kurd li Kurdistana Îranê, sîyaseta rejîma îslamî li ser jinên kurd, adet û toreyên kevin, cil û berg û jiyana rojane ya jinên kurd, peyivî û konferans jê serwext kir.

Di konfreransê de belavoka girtîyên sîyasî yên li girtîxana Sagmalcilar hat xwendin. Li ser navê Federasyona Komelên kurdistanê li Swêdê Sedat Enter axaft û piştgirîya Federasyonê bo têkoşîna jinên kurd da xuyakirin. Komela Kurd li Spångayê jî bo piştgirîya jinên kurd axaftinek kir. Jinên kurd li Östersundê, mesajek xwendin û daxwaz kirin ku komela jinan alîkarîya wan bike bo pewendîyeke bi rêkûpêk bête çêkirin.



Jineke kurd di 70 salîya xwe de li welatê xwe bûye penaber. Ma ji bo jinên kurd ji pirsa jiyanek mirovane girîntir pirs heye?

Nêzî 100 kesên kurd û swêdî di konferansê de beşdar bûn.

Nîşe: Em ê di rûpelên Berbangên dahatû de cih bidin hin aftinên konferansê û wana li dû hev biweşînin.

Berbang

Huqûqnasên Kurd li Swêdê rêxistina xwe saz kirin.

Huqûqnasên kurd li Swêdê roja 4.3.199O'î li bajarê Uppsalê civîyan û "Yekîtîya Huqûqnasên Kurd li Swêdê" damezrandin.

Ev demeke dirêj e ku huqûqnasên kurd ên li Swêdê dijîn, ji bo damezrandina rêxistinekê dixebitîn. Xebata damezrandinê, bi pêkhatina kongrê bi dawî hat. Kongra huqûqnasan roja 4.3.1990'î li bajarê Uppsalayê di lokala Komela Kurdistanê de pêktê.

Di kongrê de, erk û vatinîyên huqûqnasên kurd li Swêdê, pêwistîya rêxistineke huqûqnasan, armanc û destûra rêxistinê hate munaqeşekirin. Piştî munaqeşan, destûr bi şiklê dawî hate tesbîtkirin. Her weha bi navê "Yekîtîya Huqûqnasên Kurd li Swêdê" rêxistina huqûqnasan hate damezrandin.

Li ser navê Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, Hesen Mizgîn li kongrê amade bû û mesaja Federasyonê pêşkeşî kongrê kir.

www.arsivakurdi.org

Kongreya 10'em ya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê civîya

DEH SAL BI HEV RE



Foto: Serko Amîn

- **Kongra 10'em ya Federasyonê, di rojên 10-11.02 1990 de, li bajarê Stockholmê civîya.**
- **Di kongrê de ji 130 nûnerên 27 komelan, 110 nûner amade bûn.**
- **Wezîra Biyanîyan ya Swêdê, Maj-Lis Lööw, 51 rêxistinên kurd û biyanîyan mesajên piştgirîyê bo kongrê şandin.**
- **Nêzî 200 kurdên welatperwer du rojan kongrê temaşe kirin.**

Roja şemîyê 10.12.1990, di salona konferansê ya Folketshusa Stockholmê de, 110 nûner li ser navê 27 komelên endam, bo kongra 10'em amade bûbûn. Kongre bi hilbijartina dîwanê û bi sirûda EY REQÎB dest pê kir. Rojev hat tesbît kirin. Li gor rêza yekem ya rojevê, Keya Izol li ser navê Federasyonê pêşî bi kurdî û dûre bi swêdî peyivî. Di axaftina xwe de Keya Îzol behsa bûyerên pozîtîf bo demokrasî û aşîtîya li cîhanê kir û li ser rewşa tevayî ya Kurdan weha got:

"Par di warê piştgiriya xebata kurdan de, li Ewrûpayê pêşveçûnên berbiçav çêbûn. Lê mixabin vê xebat û însîyatîfê heta îro jî nikarîye pirsa kurda bîne rojeva navnetewî. Îro di vî warî de em tu derîyên vekirî nabînin. Vajîya wê hin îşaret hene ku xebatên weha ku di warê navnetewî de hatine li dar xistin, wekê Konferansa Parîsê, ya Ingilîstanê, ya Kanada û yên ku wê çêbibin, wekê konferansa li Stockholmê, li Danîmarkayê û li Swissrê, dikevin tengasîyên mezin ji ber ku hukumetên van welatan jidil û bi her awayî piştgiriyeke xurt û pêwîst nadin ji bo wan xebatan ku ev konferans problema kurd bînin rojeva navnetewî û zixtê bidin li welatên zordar. Her weha ew ji mehkûmkirina dewletên

www.arsivakurdi.org

dagirker direvin. Encama vê ew e ku biryar, yan deklarasyonên konferansên weha ji rastîya rewşa me dûr in û di pratîkê de jî tesîra wan kêm e. Divê xebatên weha bi alîkarîya hukumetên van welatan bi awakî berbiçav û vekirî pirsa kurda bînin rojeva xwe, hewl bidin daku têkeve rojeva organên navnetewî jî û riya munaqeşeyên li ser doza kurd, li rêxistin û organên bilind vebe.

Keya Îzol di axaftina xwe de, cih dabû rewşa kurdên li swêdê jî û bala beşdarên kongerê dikişand ser problemên kurdan:

"Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê par jî wek rêxistineke rûniştî, her çû mezintir bû. Gelek komelên me yên nû ava bûn, gelek mirovên kurd tevî xebata Federasyonê bûn. Ji ber van sebeban û ji ber bûyerên ku li welatê me berdewam in, îro çarçova xebata me firehtir, berpirsiyariyên me wek rêxistin mezintir bûne.

Divê em bikaribin bi van karan li gor vê berpirsiyarîyê rabin. Divê em bi awakî baştir û ciddî bikaribin bi penaberên kurd re yên ku tên Swêdê, eleqedar bibin: piştî qanûnên nû yên li ser penabertîya li Swêdê, wek rewşa tev penaberan, rewşa penaberên kurd jî li Swêdê nexweştir bûye. Divê em bi awayekî aktîftir li dijî wan qanûnan têbikoşin.

Divê em bi awakî cidî û aktîf ji bo çareserkirina problemên zarok û ciwanên xwe bixebitin ku beşine girîng in ji grûba me li Swêdê. Ji bo pirsên jinên kurd hîn aktîftir xebat bikin, hewl bidin ku ew di karên demokratîk de wek mêran, beşdar bin. Divê em li ser pirsên pêşerojî yên kal û pîrên xwe li Swêdê ji îro bifikirin. Divê em bi awakî xurt piştgirîya xebata Komîta Swêd ya ji bo mafên Kurd bikin. Li Ewrûpayê divê em ji bo danûstandin û hevkarîya di navbera rêxistinên demokratîk yên kurd de înîsîyatîfên baştir li dar xînin, riyên hevkarîyê vekin.

Ya dawî, ku gelek girîng e, divê em kurdên li Swêdê riyên nû bibînin ku bi şêweyekî baştirîn bikaribin xwe di nav rêxistinên sîyasî, mirovatî û yên sendikalî de xwe bi rêk bixin. Ev yeka kilîta xebata pêkanîna awira giştî ya swêdîyan e û tenê bi vê riyê em dikarin piştgirîya wan bo xwe qazanc bikin, endamên wan mobîlîzê xebata ji bo kurdan bikin."



Bi hezaran kurdên li Swêdê di şeva Newrozê de tên ba hev, bi hev re bi dilşahî cejna xwe pîroz dikin. *Foto: Serko Amin*

Wekî her sal, îsal jî mêvanên kurd û swêdî li ser navê rêxistin û partîyên xwe, ji bo piştgirîyê hatibûn kongrê. Hin ji wan piştgirîyê xwe bi axaftinekê dan xuyakirin.

Li ser navê Partîya Çep ya Kommunistan -VPK, serokê berê ya partîyê C. H. Herrmansson peyivî û got: *"Ez sipasiyên VPK pêşkeşî we dikim... Bi salan e ku me daxwazên gelê kurd anîne zimên. Gelê kurd bi salan e ku di bin tadeyî û zordestiyê de ye. Em dixwazin gelê kurd bigihîje mafên xwe yê netewî û demokratî. Em dixwazin "kommunarrest" ji holê rabe... Her bijî pitgirîya ji bo gelê kurd "*

Inger Koch ji Partîya Moderat, jî bi kurtî weha digot:

"Hevalên hêja, em gelek kêfxweş bûn bi dawetnama we... Gelê kurd tim û tim hatîye pelçiqandin. Şerê Îran û Îraqê cardin zirarek mezin da gelê kurd. Bi bombeyên kîmyawî hukumeta Îraqê daxwaza xwe ya qirkirina gelê kurd eşkere kir. Eynî şertên dijwar li Tirkiyê jî heye. Multecîyên ku li Tirkîyê ne di bin tade û zorê de ne. Divê kar û barên însanî ji bo multecîyên li Tirkîyê û Îraqê bête kirin. Divê xebat bê kirin ku mesela kurd bibin Yekîtîya Netewan... Em ê piştgirîya we bikin."

Sune Hansson, ji Daîra Biyanîyan Ya Dewletê -SIV, teqîrnama daîra xwe ji bo xebatên Federasyonê anî ser zimên û bi kurtî got:

"Pir mixabin, şefê me Christina Rogerstam nikarîbû li vê derê amade be. Ez silavên wê pêkeşî we dikim. Lewra divê ez teqdîrnama SIV'ê ji ber kar û barê Federasyonê pêkeş bikim. Hûn karên hêja dikin. Piştgirîya karên we, di pêşerojê de jî berdawam be.. Cardin silavên germ.

Maria Munter, li ser navê "Komîta Swêdî ji bo mafên kurdan" di axaftina xwe de got:

"...Hûn nebin em nikarin bi serê xwe tiştekî bikin..."

Piştî axaftinên mêvanan, dor hat roporên xebatê ya sala 1989'an. Di sala 1989'an de komîta kargêr ji bo hin kar û barên Federasyonê yên beşên taybetî komîtên nû ava kiribûn, bi van komîtan karên bingehîn hatibûn organîzekirin. Lewra her komîtê raporên xwe cuda û bi nivîskî amade kiribûn û ji bo nûnerên kongerê belav kiribûn.

1- Komîta kargêr rapora kar û barê giştî ya Federasyonê,

2- Redaksîyona Berbangê, rapora Berbangê,

3- Komîta aborî, rapora aborî ya Federasyonê

4- Komîta pêwendîyê bi komelên en-

dam re, rapora pêwendîya navxwe,

5- Komîta Kargêr ya Yekîtîya Ciwanên Kurd li Swêdê, raporên xebat û aborîyê yên YCK,

6- Komîta penaberan rapora xebatê ya ji bo penaberan,

7- Komîta girtîyan, rapora xebatê ya KG.

8- Komîta Helebçeyê, rapora KH.

Ev hemû raporên jorîn di kongrê de nehatin xwendin ji ber ku xwendina hemû raporan wê gelek wext bigirta. (Mixabin Berbang jî nikare di vê hejmarê de cih bide van hemû raporan.) Lê dîsa jî di roparên xebatê yên komîtan de hin xalên girîng hene ku meriv dikare bi kurtî behs bike.

Li gor rapora Komîta pêwendîyê bi komelên endam re, sala 1989'an 4 komelên nû bûn endamê Federasyonê: 1- Komela Kurd li Katrineholmê, 2- Komela Kurd li Upplansväsby, 3- Komela Kurd li Sanviken, 4- Komela Kulturî Kurd li Nynänhamnê. Komelên Kurd li Salayê û li Lindesbergê jî piştî kongreya 10'em bûn endam. Bi van komelên nû, hejmara komelên endam yên Federayonê bûye 30 komele. Li gelek dever û kampan, komîtên kurdan hene ku wekî komeleyeke endamê Federasyonê kar dikin. Û dîsa gelek komele û rêxistinên pîşeyî yên kurdan, weke grubên muzik, tîyatro, sînemakar û hwd hene ku dixwazin bibin endam. Ji van rêxistin û komelên kurdî, KOM-KAR li Swêd, Komela Jinên Kurd û Yana Kurdistan muracatên xwe bo endametîya Federasyonê bi nivîskî şandibûn. Lê kongre endametîya van rêxistinan qebûl nekir.



Meşê protestoyê, li dijî çar dewletên dagîrkerên Kurdistanê, karekî ji karên Federasyonê ye. Meşa bîranîna Helepçeyê îsal jî pêkhat û bi beşdarîkirina Anarşît û endîkalîstên swedî xurtir bû. *Foto: Serko Amîn*

Ji bo Berbangê jî dîsa rexneyek hat ku Berbang di wexta xwe de û mehê carekê dernakeve. Redaksîyona Berbangê, piştî kongra 9'em 7 hejmar derxistibû. Yek ji sedemên girîng ku di rapora Berbangê de hatîye xuya kirin ev e: Redaksîyona Berbangê dereng pêk hat. Sedema din "astenga teknîkî" ye. Dereng pêkanîna redaksîyonê problemeke her salî ye. Di kongreyê de pêşnîyarek bo guhertina desturê hat ku girêdayî vê problemê jî, bû. Li gor vê pêşnîyazê, salê carekê kongre civindan bi xwe re gelek astengan derdixe pêşîya xebatê û dihat xwestin ku du sala carê kongra Federasyonê bicive. Kongê vê pêşnîyarê qebûl nekir.

Li gor rapora Berbangê îsal abonên Berbangê zêde bûne. Îsal cara pêşîn e

Mesajên ku ji bo kongra 10'em hatine

1- Bi navê Akademîya Kurdî, Ömer Şêxmûs,; 2- Berey yekgirtûy demokratî Kurdistan; 3- Komela kurd Li Upplansväsby; 4- Federasyona Suryanî, Besim Yanku; 5-Hevgirtina Gelê Kurd li Sûrîyê- Rêxistina Swêd; 6-Maggi Mikaelsson-Parlamenterê VPK; 7-Li ser navê Federasyona Asûrîyan - Azîz Asmar; 8-Maja Bukovac-Re, li ser navê Federasyona Yugoslavî; 9-Navenda Çanda Kurdî -Berlin, H. Yildiz; 10-Yekîtîya Demokratên Kurdistan; 11-Enstîtuya Kurdî ya Brukselê, Derwêş M. Ferho; 12-Hevkarîya Demokrata Kurd li Sûrîyê; 13-Komela Kurdistanê li Uppsalayê; 14- Maj-Lis Lööw, wezîra biyanîyan.; 15-Komela Demokrat a Jinên Kurd li Swêdê; 16-Freddy Weitzel, Serokê Federasyona Şîlîyan; 17-KUK-Berpirsîyartîya Ewrûpa; 18-Sosyoldemokratên kommuna karkeran ya Sundsvallê, Joao Pinheiro; 19-Buraya Mihaciran ya Beledîya Sundsvallê, Johnny Stolpe -Şef; 20- VPK-Sundvall, Jan Sundin; 21-Komela Kurd li Trolhettan; 22-Komela Kurd li Linköping; 23-Komela Kurd li Spånga; 25-Komela Kurd li Eskilstuna; 24-Li ser navê Komela Kurd li Örabroyê, Huseyin Aserî; 26-KOÇ-KAK li Swêd; 27-Komela Kurdên Pêşverû li Swêdê; 28-Li ser navê KOÇ-KAK, Qedrî Xonav; 29-Li ser navê Komela Jinên Kurd li Swêdê, Novîn Harsan; 30-Komela Kurd li Norrköping; 31-Komîta Girtîyan; 32-Komela Kulturî Kurdistan li Göteborgê; 33-Yekîtîya Nivîskarên Kurd-Swêd; 34-KOMKAR-Almanya Rojava; 35-Federasyona Tirkan; 36-TEVGER; 37-Ala Şoreş-Lijna Swêd; 38-Yekîtîya Sosyalît a Kurdistanê-Swêdê; 39-Ala Rizgarî-Komîta Swêd; 40-Enstituya Kurd li Parîsê; 41-Partî Demokrat a Kurdistana-Iranê; 42-Partîya Demokrata Kurdistan; 43-Partîya Çepî Kurd li Sûrîyê; 44-Yekîtîya Niştimanî Kurdistan-Rêxxirawê Swêdê; 45-Nûnerayetîya Partîya Demokrata Kurdistana Îranê li Derveyî Welat-Parîs; 46-Redaksîyona Kovara BERGEH; 47-Hêvîya Gel; 48-Desteyî Nivîsaranî Serdemî Nû; 49-Berey Kurdistana Îraq-Buroya Skandînavyê; 50-Partî Demokrat a Kurdistan-Îran, Rêveberê Soşesge; 51-Pasok;

ku nusxayeke ji çend hejmarên dawî yên Berbangê, ji bo arşîvê di dest me de nemaye. Ji ber vê yekê, ji hejmara 59 û vir de, Berbang her carê 1200 nusxa tê çapkirin. Îro 1104 abonên Berbangê hene.

Komîta girtîyan îsal jî karê xwe berdewam kiribû. Alîkarîya maddî û xebata piştgirîyê bo girtîyên sîyasî ji par zêder bûbû. Li gor raporê, Komîta girtîyan di sala 1989'an de 39.747 kronên swêdî berhev kiribû û 29.550 kr. jî ji bo girtîyan weke alîkarî hatibû şandin. Di gel vî, komîtê bi şandina name, pirtûk û kovarên kurdî û kampanyên piştgirîyê, alîkarîya xwe ya bo girtîyan berfereh kiribû.

Di van salên dawîn de kar û xebatên Federasyonê bi deng û bi hêztir bûne. Piranîya kurdên li Swêdê çi endamê rêxistinên sîyasî û çi kesên nerêxistinî di kar û barên Federasyonê de cih digrin. Piranîya rêxistin û partîyên kurd piştgirîyê Federasyonê dikin û beşdarî xebata wê dibin. Ne kêmî 2000 kesan beşdarî meşekî prosteyê dibin. Ne kêmî 3000 hesar kesan beşdarî şeveke weke ya Newrozê dibin.

Deh sal bi hev re

Federayona Komelên Kurdistanê Li Swêdê, di bahara 1980'î de bi lihevhatin û biryara komelên kurd li Swêdê hatibû avakirin. Wê çaxê komelên kurd li swêdê bi ser rêxistinên sîyasî yên kurdî bûn. Her rêxistineke sîyasî komeleyên xwe hebûn û hemû di platforma Federasyonê de bi hev re dixebitîn. Berpirsîyarî û vatiniyên Federasyonê sal bi sal girantir û ferehtir dibû, lê kar û barê Federasyonê sal bi sal qelstir dibû. Ji ber vê Federasyon di sala 1985'de ket kirîzekê. Kêmasîyên kadro û îmkanên madî jî dest ne dida ku Federasyon kar û barê xwe bimeşîne. Bes karê Berbangê bi dijwarî dihate meşandin.

Di sala 1986'an bi kongreya istîsnayî sîstema rêxistinî ya Federasyonê hat guhertin bi destureke nû Federasyon ji nû ve hate organîzekirin. Federasyon wê dîsa ji komelên endam pêkbihata, lê ne komelên ser bi rêxistinên sîyasî. Ji komelên beledîyan. Hemû kurd bi hev re wê li beledîya xwe komeleyek avabikira û di her beledîyekê de tenê komeleyek bikaribûya bibûya endamê Federasyonê. Û wusa jî bû. Ji wê rojê û vir de ye her ku diçe hejmara komelên beledîyan, her weha hejmara komelên endam yên Federasyonê, zêde dibe. Îro 30 komelên kurd, endamê Federasyonê ne. Her komele di nav xwe de seksîyoneke bo jinan û yek jî bo ciwanan pêkanîye. Seksîyona ciwanan ya her komela endam bi hev re di bin baskê Federasyonê de "Yekîtîya Ciwanên Kurd li Swêdê" pêk anî ye.

Her weha kar û vatinîyên Federasyonê jî girantir û berferehtir dibe. Ev yeka, ji daxwazên kurdên li dervayî welêt û ji rexneyên li kongreyê jî xuya dibe. Lewra îro ne tenê penaberên kurd li Swêdê, penaberên kurd yên li Tirkîyê, li Îspanyê, li Yewnanîstanê û heta yên li Pakîstanê jî ji Federasyonê alîkarî dixwazin. Lewra rexne tê girtin ku çima Komîta Girtîya ya Federasyonê tenê alîkarîya girtîyên kurd li tirkîyê dike. Hin dixwazin alîkarîya girtîyên li hemû parçên Kurdistanê, an jî alîkarîya hemû girtîyên sîyasî li Tirkîyê (kurd, tirk..) bête kirin.. Nimûnên weha gelek in. Komîta kargêr û komîtên xebatê jî yek tespît kiriye û di raporên xwe de eşkere bala kongreyê dikşîne ser giranîya meselê. Ji ber vê ye ku Komîta kargêr di beşa şirovekirina raporê de weha dibêje:

"Çarçova Federasyonê û girêdayî vê, kar û xebatê wê jî firehtir bûye... Her ku diçe karê me bêtir, berpirsiyarîyên me girantir dibin. Loma divê hevalên profesyonel bi van karan rabin. Eger Kongre bi awakî ciddî li ser vê meselê nesekine, karê Federasyonê piştî demeke nêzîk wê bixetime û êdî nema bikaribe bi vatinîyên xwe rabe. Kadroyên profesyonel îro ji her demî zêdetir bo me lazim e..."

Her çîqas problemên rêxistinî û civakî, asteng û kêmasîyên xebatê hebin jî, guhertinên baş û pêşveçûnên berbiçav xwe didin xuyakirin. Ev çend sal in ku êdî piştî kongreyên Federasyonê kes nabêje "Par ji îsal baştir bû", lê gelek kes dibêjin "îsal ji par baştir e". Li derveyî welêt bo eynî armanc û platforma xebatê, di warê hevkarî û yekîtîya kurdan de, bi serê xwe Federasyon bûye nimûneyekê tekane.

Bi hêvîya pêşveçûnên baştir, 10 salîya Federasyonê pîroz be!

N.Kirîv

Biryarên Kongra 10'em

* **Kongra 10'em zordestîya dewletên dagirker, Tirkiye, Irak, Iran û Surîyê ya li ser gelê Kurdistanê ku berdewam dike, bi tundî mehkûm dike û piştgirîyê xwe ji bo tevgera rizgarîxwaz ya Kurdistanê nîan dide.**
* **Kongra 10'em, şehîtkirina Dr.Qasimlo bi destê rejîma kevneperest ya Îranê, mehkûm dike û ji hukumeta Awusturya doz dike ku berpirsên vê terorê bi lez derxînin û ji bo cîhanê îlan bikin. Her weha kongra 10 em piştgirîya Dr. Qasimlo ji bo xelata aitiyê ya Nobelê dike.**
* **Kongra 10'em, pitî 27 salên xwe li zîndana rejima nijadperest ya Afrîka Başûr, serbestberdana serokê ANC, Nelson Mandela pîroz dike.**
* **Kongra 10'em piştgirîya xwe ji bo 5 parlamenterên kurd nîşan dide, ji ber ku parlamentoya Tirkiyê dixwaze mafên parlamenterîya wan ji holê rake.**
* **Kongra 10'em biryara nû ya hukûmeta Swêdê li ser guhertina qanûnê biyanîyan protesto dike û daxwaz dike ku Federasyonê hewl bide ku xebateke xurt ji bo pirsên penaberên kurd ku li Swêd in, bimeşîne.**
* **Kongra 10'em, biryar da ku Federasyon, ji bo zarok, ciwan û jinên kurd li Swêdê xebateke xurştir bimeşîne, hewl bide ku ew di xebata demokratîk de cîhê xwe baştir bigrin.**
* **Kongra 10'em birayar da ku Federasyon bi aktîfî xebat bike da ku weşana kurdî li Radyo û Televîzyona Swêdê pêk were**

www.arsivakurdi.org

Federasyona Kurd: Organîzasyonek netewî û demokratîk

M. Kîper

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, kongra xwe ya 10'em di rojên 10-11/2/1990'î de civand û herweha deh salîya xwe bi dawî anî..

Îro Federasyon xwedîya 30 komeleyên endam e. Her komeleyek li gor hejmara endamên xwe, nûnerên xwe şandibûn kongara Federasyonê. Kurdên ku ji çar parçên Kurdistanê, bi hev re komelên endam ava kirine. Hemû organên Federasyonê, ji hemû kurdan re vekirîye. Eger em kurdên Lublanê jî bihesibînin, kurdên ji pênc dewletan hatine, bi hev re rêxistineke yekgirtî û demokratîk li Swêdê ava kirine.

Divê em mukir bên ku ji alî raman, qerekter û xwedî tradîsîyonek demokratîk bûyin de, em gelek ji hev cihê ne. Ji ber ku mirovên me, qet rojek îmkan nedîtine li ser axa xwe û ji hemû parçeyan rêxistineke ava bikin, an jî di rêxistineke weha de bi hev re kar bikin. Lewra li welêt nayê nayê dîtin ku, bi hev re xebitîn, bi hev re rêxistineke yekgirtî avakirin û hemû di hemû organên wî de cih girtin, çiqas dijwar û bi problem be. Nayê heşê meriv ku em bi sedselan ji hev cihê jiyane û ji derveyî îrada me di ziman, zarava, mantiq û psîkolojîya me de, guhertinên bingehî çêbûne.

Kongra Federasyonê ya 10'em ji bo vê numûneyekê ber bi çav e. Pêşniyarên ku hatin, munaqaşên ku çêbûn, çi li dij û çi li gel, nîşan dan ku ev cudahîya ez bahs dikim, çawa bûye asteng ku em hevûdu têbigihên. Piştî kongrê jî axaftinên me bi hevûdu re, ev yek xweş nîşan da. Ji ber ku di vê rewşê de daxwaz û pêşnîyar baş nehatine fahmkirin, nûnerên kongrê dengê xwe şaş bi kar anîne. Gelek sedemên van tiştan hene. Min li jor bahsa hinek sedeman kir, wek ziman, zarava, kêmasîya tradîsyon û tecrubên xebata demokratîk. Tiştek eşkere ye ku em li welatê xwe xwedî tu mafên avakirina rêxistinên demokratîk nebûne. Rewş li Tirkîyê piçek cuda ye. Me li Tirkîyê carna îmkan bi dest xistîye, sendîka û komele ava kirine. Di nav xebata weha de, fersend çêbûye ku em fêrî hin tiştan bibin. Pir mixabin li perçên din yên Kurdistanê îmkanên weha bi dest me neketîne.

Li derveyî welêt ev îmkan hene. Bo me qet ne şerm e ku di vî warî de kêmasîyên me hebin. Ez bawer dikim, dema li Sovyetê parlamento vebû û dest bi xebatê kir, gelek hevalên me di TV'ê de dît çawa parlamenterên sovyetî wekî zarokan bi hev diketin û gelek şaşî dikirin. Ji ber ku piştî şoreşa Oktobirê cara pêşî parlamentoyek pêk hatibû û meriv bi azadî, lê bê tecrube û qaîde dest bi xebatek nû kiribû. Em ê jî bi van kêmasîyan kar û barê xwe bimeşînin, heta ku şert û şurtê wî fêr bibin.

Piştî ku me sîstema Federasyonê guherand, her sal hejmarê komelên endam zêde û her weha hejmarê nûnerên kongra Federasyonê jî zêde bû. Ev pêşveçûna ber bi çav, pêwistîya Federasyonê bi her awayî teyîd dike.

Her çiqas rêxistinek wek Federasyon, pêwist be jî, ez bawer dikim ku li ser armanca Federasyonê dîtinên cuda cuda hene. Divê em li ser armanca wê zelal bin. Xelk rêxistineke wek Federasyonê ji bo çi ava dike? Û me ji bo çi ava kiriye? Bê guman armanca wan ya eşkere ev e: li welatê ku lê dijîn, bê deng û bê rêxistin nemînin û bikaribin mafên xwe yên demokratîk bi rêya rêxistinên xwe bistînin. Em jî wek xelkên din ji bo vî armancî hatine ba hev û me Federasyona xwe damezrandiye. Em wekî xelkê din ne xwedîyê dewletekê ne ku bikaribin bi alîkarîya wê mafên xwe biparêzin. Yên xwedî dewletekê ne, dîsa bo parastina mafên xwe, rêxistinên wekî Federayonê pêwist dibînin. Lewra ev pêwistî bo me kurdan hîn girantir e. Ferqeke gelek muhîm ya me heye ku pir caran ji ber vê em di bin baskê Federasyonê de hatine ba hev. Ev ferq çi ye? Xelkê me bindest e û dijminên me ji çar alî welatê me dagir kiriye. Heta welatê me, gelê me di bin postalên dagirkeran de bimîne, heta xelkê kurd di bi zor û zilma dijmin de be, ev ferqa taybetî dê her hebe. Lewra vatinî, karûbar û pirsên me jî dê her hebin. Ji ber van tiştan divê em bi hev re bixebitin heta ku em wekî millet di daxwaz û armancên xwe de bi ser kevin. Jixwe ev vatinî, daxwaz û armancê me Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê qarekterîze dike. Federasyona me bê qeyd û şert alîkarîya doza kurd li her çar parçên Kurdistanê dike. Federasyon ne rêxistinek siyasî ye, bi xebata siyasî mijûl nabe û nakeve nav munaqeşên îdelojîk û xeta sîyasî. Federasyon menfeata giştî li ser menfeata grûbî dibîne. Ji ber ku menfeata grûba ne ya giştî ye. Lê menfeata giştî ya grubî ye jî. Di kar û barê Federasyonê de divê em vê prensîbê ji bîr nekin. Yên ku bixwazin welatekî rizgar bikin, divê şertên maddî yên ji bo vê yekê jî amade bikin. Rêya vê jî damezrandina rêxistinên netewî ye. Federasyonê munyatorê vê ye. Û cara pêşîn e ku bi rêk û pêk, kurdên ji çar parçên Kurdistanê bi awayekê demokratîk hevkarî kirine û bi hev re yekîtîyek pêk anîne.

Di kongara 10'em de tiştek bala min kişand. Ew jî ev e: Em kurd gelek "sîyasî" difikirin. Di bin her daxwaz û pêşniyarî de lîstikek digerin. Ev li ber me dibe asteng ku em nikarin biryar bistînin, nikarin desturê li gor pêwistî biguherînin. Di vî warî de radîkalîzm pêwist e. Noxteyek din heye ku divê li sêr munaqeşe bibe. Ew jî ev e: Piştî Komîta Kargêr rapora xwe pêşkêş kir, divê em ne tenê rexnê bê bingeh li hevalan bigrin? Kînga, li ser karên baş û serketî, pesnê hevûdu dan, dê li ba me bibe esas? Em ê kînga bikaribin, di nav atmosferek welatperwerî de, bê stres pêşnîyaran ji bo rojên pêş munaqeşe bikin. Divê em nebêjin "hele îsal jî em komîteyek hilbijêrin, salekê din xwedê kerîm e".

Piştî xebata 10 salan bi serbilindî karim bêjim ku kurd îro hîn zêdetir di her warî de muhtacê rêxistinên wek modelê Federasyonê ne. Di xebatek weha de hîmê yek netewe bûyin ê bê avêtin. Divê modela Federasyonê di kar û barê demokratîk de ji bo welatê me, ji bo gelê me bibe numûne. Xwedî dîtinên cuda cuda bûyin an jî, ji parçeyên cihê hatin, li derveyî welêt bo xebatek yekgirtî û demokratîk de nebe asteng.

www.arsiv.kurdi.org

Konferanseke Çanda Kurdî Çima Pêwist e?

Rohat

Ev deh sal in (1980-1990) li Ewrûpayê hejmara kurdan her ku çû zêde bû. Îro wekî em dibînin li gelek welatên Ewrûpê bi sed hezaran kurd dijîn. Di navbera van deh salan de, di warê çanda kurdî de her çiqas hin gavên xurt nehatibin avêtin jî, di nav gel de hêvî, daxwaz û bawerîyên mezin bejn didin. Lê belê li her welatekî Ewrûpayê ev kar û xebatên ha ji alîyê kom, partî û kesên bi serê xwe, ji hev dûr, belavbûyî û bê girêdan tên pêkanîn. Tunebûna sazgehên (muessese, institution) netewî rê nade ku çanda kurdî wek çandeke nûjen û hevdem di nav çanda cîhanê de cihê xwe bigre. Pêknehatina sazgehên yek-navendî(merkezî) di vî warî de aloziyekê peyda dike û hêvîyên yekîtîya netewî gelek dihejîne. Ev hej wê heta çi wextî bidomîne? Bi bawerîya min êdî dor hatîye bersivdayina vê pirsê.

Di nav van deh salan de îro em dibînin ku ji bîstî zêdetir rojname û kovarên kurdî tên weşandin. Hejmara kesên ku destê wan pênûs digre û hejmara weşanxanên kurdî roj bi roj zêdetir dibe. Di warê çanda kurdî de berhem, lêkolîn û efrandinên cuda-cuda tên amadekirin. Mirovên ku ji çar parçên Kurdistanê hatine û mirovên ku ji mêjve li derwayî welat bûn, pêwendîyên navbera wan, tesîr û bandura wan li ser hev kêm be jî, pêşta çû. Angorî salên berê, di nav van deh salên dawîn de heta niha xebatên nebûyî, nedîtî pêk hatin. Hemû ev karana di warê dîroka çanda kurdî de nîşanên proseseke nûh in. Ji alîyê din de, ji bo rojên pêş ev karana wek despêkekê an jî gaveke piçûk dikarin bên hesibandin.

Bê guman tunebûna dewleteke kurd, di vî warî de dijwarî û tengasîyên mezin peyda dike. Netewekî wek kurdan ji bo rizgarîya xwe serî hildaye, wek netewekî bindest pêwist e di nav xwe de sazgeh û otorîteyên xwe biafirîne, di warê parastin û pêştebirina çanda kurdî de wek dewletekê kar bike. Pêknehatina vê prosesê çawa em di jîyîna xwe ya rojane de dibînin zirareke gelek mezin dighîne yekîtiya netewî. Ji ber vê yekê jî, ji bo tespîtkirina çarçeweyên xebateke çanda netewî, pêwist e konferanseke çanda kurdî li Ewrûpayê pêk bê. Di vê konferansê de temsîlvanên çanda kurdî divê beşdar bin, serêşî, problem û dijwariyên xwe munaqeşe bikin, bi hev re bidin-bistînin û bi kêmanî bawerîyên xwe dîyarî hev bikin. Ev erk û berpirsîyarî îro dikeve ser milên ronakbîr û pêşketiyên kurd. Cara pêşîn pêwist e ku kurd di vî warî de bi xwe bibin xwedîyê însîyatîfekê û her tiştî ji dewletên Ewrûpayî hêvî nekin. Ji ber ku pirs pirsa kurdan bi xwe ye.

Di vê konferansê de kî dikarin beşdar bibin? Hemû kurdên nivîskar, zana, hunermend, sazbend, wênekêş, temsîlvanên komela û sazgehên çandî, temsîlvanên komelên civakî wek komelên karkeran, jinan û ciwanan, temsîlvanên kom û partîyên sîyasî, rojnamevan, weşankar... Bi kurtî kesên ku kêm-zêde di jîyîna çandî de beşdar dibin, divê di vê konferansê de cihê xwe bigrin.

Piştî konferanseke weha çanda kurdî û pêşketina wê dikare li ser kok û piyên xwe bîneke fireh werbigre. Çawa me li jor jî got, ev erk û berpirsîyarî tenê dikeve ser milên ronakbîr û pêşketîyên kurd. Ji ber dijwarî û serêşîyan, ronakbîr û pêşketîyên kurd yên ku ji jîyînê xeyîdîne, divê ji kulube û holikên xwe derkevin, ji êş û janan re bibin melhem û derman.

Di jîyîna rojana de ew kesên ku dibêjin "Min sond xwarîye ez naçim şîn û şahîyên kurdan, şevên Newrozê û civînên kurdan" ku ew xwe ji vê "jîyîna bohem" xelas nekin, ew ji berpirsîyarîyên xwe gelek dûr dikevin. Ji kûrbûna jan û êşan re dibine hevkar.

Li Ewrûpayê, di warê çanda kurdî de amatorîke gelek mezin bejn dide, îro "herkes bi her tiştî ve mijûl dibe" bo ku ji xwe re karekî bibîne, jîyîna xwe ya aborî bidomîne, hin kes bi pêwendîyên şexsî di rîya pêşketina kurdî de îro bûne asteng û bend, ji xwe re "meşqele" û "mijûlîkê" digerin. Bê guman riya ji ortê rakirina van serêşî û probleman di riya xebatên profesyonelî re derbaz dibin. Ji bo pêkanîna sazgehên netewî divê raya netewê kurd wek dewletekê fonksîyonekê bilîze. Her çiqas em ne xwedî dewletekî bin jî, pêwist e, em wek dewletekê kar bikin, hebûna xwe, hêza xwe nîşan bidin, divê dengê me yek be, ji her serî dengek dernekeve. Wek mîsal, yekî biyanî an jî rojnamevanek li ser kurdan bixwaze agahdariyekê bigre tenê dikare bi devkî çend zanîyarîyan ji hin kesan bigre. Tunebûna "Navendeke informasîyonê" ji bo netewê kurd wek kêmasiyekê ji nişkêva xwe nîşan dide. Wek vê nimûna piçûk bi sedan dijwarî û pirs bê bersîv mane.

Li Franse, Almanya, Swêd, Îngiltere û Belçîqayê di van deh salên dawîn de gelek instuti, akademî û navêndên kurdî vebûn. Gelo îro girêdanek di navbera van de heye an tune ye, çiqas kadroyên çanda kurdî li dora xwe berhevkirine, bi xebatên xwe ve çi bawerî dane netewê kurd, divê bersivên pirsan bên dayîn. Rewşa wan çi ye, ew çawa dikarin pêşkevin, divê ev pirsana jî di platformên fireh de bên munaqeşekirin. Wek Enstituya Bonê, xebatên ku bi navê gelê kurd tên pêkanîn pêwist e nebin benîştê nav dev-diranan û di nav gel de nebin çîrok...

Ji bo armancên mezin, wek netewekî pêwist e em cara pêşîn ji xebatên piçûk re çarekê bibînin. Ev tişt piçûk tên dîtin û nayên çareserkirinê. Her kom û Partîyê sîyasî di gel xebatên xwe yên rêxistinî, divê ji bo çareserkirina hin pirsên netewî jî, di nav xwe de hevkarîkê bikin, nêzîkî hev bin, guhdariya hev bikin. Wek ji bo pêkanîna Yekîtiya Nivîskarên kurd, Yekîtiya Hunermendên Kurd, Yekîtîya Jinên Kurd û hwd. Gelo ev rêxistin û partîyên kurd çend cara hatine bal hev û çi biryar girtine? Îro bersivên van pirsan nehatine dayîn. Heta ev pirs bê bersîv bimînin, di platformên navnetewî de cihgirtina kurdan ewqas dijwar dibe. Îro di platformên navnetewî de li ser çanda kurdî gelek tê peyivîn û ev pirsa bûye babeteke gelek aktuel. Ji ber vê yekê, pirsa çanda kurdî hem ji bo kurdan, hem jî ji bo biyaniyan bûye pirseke gelek giring. Kurd wek netewekî, beriya ku eniyan saz bikin û welatê xwe azad bikin, divê dezgeh û sazgehên xwe yên netewî pêk bînin û bibin yekdeng. Divê baş bê zanîn ku têkoşîn û tevgereke netewî wek avahîkê bilind dibe. "Em ji kêderê ve dest pê bikin?" Pêwist e, bersîva vê pirsê tam bê dayîn.

www.ekivaklund.org

Di edebiyata me ya devkî de

KER Û KERTÎ

Amed Tigrîs

Wekî ji alîyê her zanyar û ronakbîrî ve dîyar e, ku edebîyata kurdî gelek dewlemend e, ji ber ku netewê kurd li Rojhilata Navîn netewekî kevnare ye. Wî di avabûna şahrezayiya Mezapotamyayê de rolekî gelek girîng û mezin lîstiye. Lê hezar mixabin ku berhemên edebî ta niha ne hatine berhevkirin û nivîsandin. Ji ber zilm û zordarîya dagîrkeran, ew bi devkî maye. Ji hezar salan vir de, bi devkî di nav gel de ji nefşên kevn gehêştiye nefşên nû. Ji ber vê yekê jî ta îro jîndar e. Ziman û çanda kurdî dewlemend e. Wekî derya kûr ya bê binî ye. Ev kultura kevnare û dewlemend wekî çemên Firad, Dîcle, Aras, Zê, Xabûr, çem û newalên Kurdistanê diherike û diçe nav derya kultura bîyanîyên dagîrker!.

Ziman, edebîyat û çanda Kurdî welê dewlemend e, ku li ser heywanekî bi sedan gotin, metelok, biwêj (deyîm-utryck), helbest û hwd hene. Bi taybetî li ser ker û kertî, kûçik û kûçiktî, rovî û rovîtî gelek gotin, gotinên pêşîyan, biwêj û metelok hatine gotin. Ev jî li gor herêmên Kurdistanê û li gor devok û zaravayên kurdî cuda cuda ne. Ji ber ku ne hatine nivîsîn, her kes li herêma xwe bi şêwekî taybetî wan bi kar tîne. Haya herêmekî ji ya din tune, an jî gelek kêm e. Ev jî encax bi nivîsandin kare sînorên herêm, devok û zaravan ji nav rake. Ker û kertî di edebîyata kurdî de cîhek wê î girîng û taybetî heye.

Di edebîyata kurdî de, ker bûye sembola gêjî, bêhişî û ehmaqiyê.

Min li ser ker û kertîyê ta niha 87 hevok berhev kirine. Piranîya wan ji herêma min, ji derdorê Dîyarbekirê ne. Lê ta ku ji destê min hat min ji herêmên din jî çendek berhev kirin.

Bê guman, ji çavkanîyên dewlemendiya her zimanî, yek jê jî gotin, gotinên pêşîya, biwêj, çîrok û metelok in. Dema mirov wan baş nizanibe û bi kar neyîne; zimanê axaftin û nivîsandinê gelek qels û jar dimîne. Wî çaxî ziman dibe wekî skeleta bê goşt, ra (damar) û jî (qas, masûlk). Tama ziman namîne. Zimanê şêrîn roj bi roj tirş û tal dibe.

Di hejmarên pêş de jî ez dê li ser kûçik û kûçiktî, rovî û rovitî û ga û gayitî binivîsim.

1- Ker, ker e; tu lê bixî dere û lê nexî nare.

2- Kar, ker e; tu bajoyî dere û najoyî nare.

3- Ker ker e; li serî û li qûnê bixî, ferq nake.

4- a) Nikare bi kerê, radibe kurtên.

b) Bi kerê nikare, baz dide kurtên!

Ev gotin ji bo wan kesên serdest û zorba re nikaribin dengê bikin, lê ji yên bindest re serdestiyê bikin re tê gotin.

5- a) Roja ku gul dibarin ez diçim bal keran.

b) Wexta ku xêr dibare Elê li ber keran e.

6- a) Ker diçe bal keran dihewise (fêr-dibe) tir û fisan.

b) Keran li ba keran girêbidî, ew ji hev hînî tir û fisan dibin.

Mirov hevalê kê be, dibe wek wî/wê.

7-a) Ker carek dikeve çamûrê, êdî riya xwe dadigerîne.

b) Ker, ku ker e, carekê dikeve çamûrê.

Mirov carekê tê xapandin.

8-a) Ha min got, ha ker zirî.

b) Ha te got, ha ker zirî.

Dema mirov guhdariya gotina mezinê xwe neke.

9- a) Kerê pîr, hevsarê sor.

b) Sera pîran, zingilê keran.

Dema yên kal û pîr li gor temenê (emrê) xwe karekî seyîr(ecayîb) bikin, ji wan re tê gotin.

10- Kertirînê kertirîn.

Tiştên ku bi mirov nekevin jî li mirov neye.

11- a) Çiqas caşên kerê zêde dibin, hewkas jî êmê wê kêm dibe.

b) Çiqas daşikê kerê zêde bibin, êm kêm dibe û bar giran dibe.

12- a) Xwedîyê kerê dikeve ew dibêje; "wey stuyê te bişkê!"

Yanî ker ji xwedîyê xwe re ne sadiq e. Ji bo ew kesê ku ji heval û mirovê xwe re ne sadiq be, ji wî re tê gotin.

13- Ker û ga nabin bira.

Ji bo kesên ku ne hêjayên hevdu tê gotin.

14- Şîrê kerê vexwariye!

Tu dîn bûyî, te eqilê xwe wendakirîye, tu korefam bûyî.

15- Ji kerê ketî!

Tu dîn bûyî, tiştê tu dibêjî û dikî ne karê her kesê bi aqil e.

16- a) Ker û xweşav

b) Ker ji xweşavê çi fam dike.

Ji bo kesên ehmaq û nefam.

17- Ker û kerbeş.

Ew jî ji bo kesên ehmeq û nezan.

18-Xwarina mêran (mîran) çayira keran.

Ji bo ew kesên ku tiştek di mala wan de tunebe û ew quretî û mezinatiyê dikin.

19- Kerê min heywanê xwedê.

Ji bo ew kesên ne zîrek tê gotin.

20- Meleyê biharê.

Dema bihar tê, ker gîha dixwe û heşerî dibe û dizire.

21- Keça meleyê biharê.

Keça kerê.

22- Kerîtî ne mêranî ye.

23- Dinya hemû ka be, devê kerê min pê nabe.

Dema kar û fêda tiştekî ji mirov re tune be tê gotin.

24- Dema canê kerê kotek dixwaze, zira wê tê.

Nepeyive ez dê li te bixim!

25- Dema laşê kerê dixwure, dizire.

Dema yek lêdanê heq bike, ev gotin jê re tê gotin.

26- Ker û kurî!

Ew kesên ku bê şexsiyet be û li dûv yekî din here, bi gotina wî/wê bike.

27- Ker û kurî, barê herî!

Ji bo kes û tiştên bê qîmet û sivik tê gotin.

28- Serker.

Ji bo kesên serhişk, rikok û kêm aqil tê gotin.

29-Ku te got û kir, mêr î û ku te got û

www.arsivakurdi.org

ne kir, kerê nêr î!

Ji wan kesên ku tu karî nakin, lê mezin û zêde dipeyivîn re, tê gotin.

30- a) Di garanê de digere dîsa diçe ba kera xwe.

b) Ji garanê hemîyê li gor makera xwe dizivire.

Ji bo ew kesê ku nikare bi xelkê, lê karibe bi mirov û nêzên xwe.

31- Ker û garan.

Dema tiştên ku eleqa wan bi hevdu ve tune be.

32- Kurê birayê makarê.

Ji bo ehmeqî û bê eqiliyê gotineke îndîrek e.

33- Bar naçe ba kerê, ker diçe ba bar.

Bi xebatê kar dimeşe, ji ber xwe ve kar nameşe.

34- Dilê yekî diçû goştê kerê, digot: guhên wî wek yê kevroşkê ye.

35- Dinya bi tira bûya, dê hemû para keran bûya.

Ji bo kesê virek û derewker tê gotin.

36- Du berû barê kerî.

37- Feyda gavanan,siwarbûna keran e.

Ji bo ew karê ku fêda wê tunebe.

38- Heta struyên(qiloçên) kerê neyên ma her cehşik e?

Ji bo ew tişt û kesên ku mirov ji wan bawer neke re tê gotin.

39-Hemû keran bi wiske ne ajê!

40- Ji kerê me yê maker hêrî ye.

41- Ji bîhna kebabê çû, bi ser daxdana keran ve bû.

Ew kesên ku negehên armanca xwe re tê gotin.

42-Mîr kerê gazî, xelk çûn tazî

43-Mezin bibe ker, divê mirov nebe ser.

44- Ne kerê min e û ne gayê te ye.

Fêda wê ji yekî re jî tune.

45- Ne ker li garanê û pirsiyar li gavanê.

Xwedî li malê xwe dernekeve û xelkê neke bin berpirsiyariyê.

46- Piştî baranê, kerê bi cil (kurtan) neke.

Berî hezra xwe bike. Bi ser û ber be.

47- Sofiyê Remezanê wek kerê li garanê.

Yê bi tenê di meha Remezanê de ibadet bike, bê feyde ye.

48- Xwelî li wî serî, ku ga da bi kerî.

Ji bo ew mirovên ku tên xapandin.

49- Xewna gayî li kerê ye.

Dema yek xirabîyekê bi mirovê xwe bike, tê gotin.

50- Ker ji çoyê hez dike.

Ji kesê rik û bê aqil re ço divê.

51- Ker û rik bira ne.

Rikîtiya vala, ehmeqî ye.

52- Ji kerî por kir herî.

Ji ehmaqî kal û pîr bû.

53- Çû ceneta keran.

Bîlleheq mir.

54- Yarîtî nîne, kerîtî ye.

Ji bo ew kesê ku henekîya qebe bike re tê gotin.

55- Kerîtî ne mêranî ye.

Bê aqilî ne mêranî ye. Divê mirov baş bifikire.

56- a) Lawik çû seferê, dîsa hat kerê berê.

b) Kurê malê çû seferê û dîsa hat kerê berê.

Ji bo ew kesê ku bi salan bigere û bixwîne, lê dîsa jî ne serwext û zana re tê gotin.

57- Ker û ga li hevdu dixin, golik di nav nigan de dipelçiqin.

Dema ku kesên bi hêz, an dewlemend bi hevdu bikevin û kesên belengaz û xizan di navê de zerar bibînin...

58- Kulmek ceh zêde bide kerê, tayek bar zêde lê bike.

Dema mirov li heywan û tiştên xwe baş binêre, berhem û encam jî baş dibe.

59- Ker dikeve çamûrê, ji xwedîyê xwe zeximtir yekî nabîne.

Di roja teng û giran de yek ji mirov re alîkarî nake. Divê mirov bi xwe karbike.

60- a)Ker jî dibe qurban.

b)Ker nabe qurban, bihayê kerê dibe qurban.

Ji bo tişt û bûyerên ne cih de bin tê gotin. Tiştê ku nebe..

61- Ker îblîs e, derman werî e.

Di derheqê kesên rik û zorba de dîsa kesên zorba dertê.

62- Ji kerê kurtan dimîne, ji mêran nav dimîne.

Ji xerabî û nezanîyê tiştek namîne, navê kesên baş û zana dimîne.

63- Ker best, xem berest.

Ji bo kesên ku hîç nafirkire.

64- Ker bîhna sah nake.

65- a)Kerê memire heta qîvar hişîn bibe.

b)Kero memir buhar tê, kalo memir pincar tê.

Dema tiştek bêjin ku gelek dûr be an jî nekeve serê mirov, tê gotin.

66- Kerê mêvanê herê.

Herduyan hevdu dîtîye, herdu jî rastî hevdu hatine.

67- a)Ker bi karwanan qelew nabin.

b)Karwan bi keran qelaw nabin.

Ji bo kes û tiştên ku mane û qîmeta wan bi hinekan nayêne guhartin.

68- Keran serê pirbêjan birîye.

Mirovên nezan serê gelek mirovên zana û hêja jêkirine.

69- Karêz, karêz dîsan kerê boz.

Ji bo ew kesên ku tiştek bi ser bêjingê nexin, dîsa ji paş ve dest bi karê xwe bikin.

70- Ker e, ne kurî ye.

Dema mirov ji yekê re bi îma tiştekî bêje.

71- Keran guh nîne, tirê hê caşik e.

Tiştekî amadekirî li navê nine, lê ji xwe re vala dipeyive.

72- Ji kerê re tir û fis yek e.

Ji mirovê nezan re başî û xirabî yek e. Şerm nîne.

73- Ker çi zane zefran çi ye?

Ji bo wan kesên nezan, ne şahreza û ferqa navbera tiştan nizanibin, tê gotin.

74- Ker bi kutên çênabe.

Bi cil û bergan mirov, nabe mirov. Zanabûn pêwist e. Lêdan ne baş e.

75- Ker dixebite hesp dixwe.

Dema hinek kar bikin û hinekê din jî ji keda wan bixwin.

76- a)Kerê xwe baş girêde û cîranê xwe meke diz.

b)Kerê xwe rind girêde, paşê li xwedê biwesîne.

77- Kero bi te re me,mêvan tu guhdar bc.

Dîwar ez ji te re dibêjim, bûkê tu fam bike!

78- Ker ji kadînê nayê der.

Bale û ehmeq bi aqil nabin.

79- Ji kerê zehmetkêştir nîne, lê dema dikeve, xwedî dibêje:"Hey stuyê te bişkê".

Ji bo yên ku çêyî ji wan re pere nake, yên nankor.

80- a)Ji kerê re gotine: "cinet çi ye?", gotiye: "gewzik e!".

b)Cineta keran gewzik e.

Kesê nezan bi xweşî û qencîyê nizane.

81- Kerê kurmî diçe li ser çavîyê av vedixwe.

Kesên pîs û qilêr xwe kîbar dibînin û bi her kesî qayil nabin.

82- Kerê qule û mêrikê kose, pişt bi wan nayê girêdan.

83- Xwediyê kerê, dimîne li şevderê.

www.ensarkurd.org

ÇÎROK

KESERA NEYNIKAN

Dr. Kurdo Husên

Her stiran/ava di xew de/ya evînê ye
Her stêrika diçirisîne/ava di xew de/
ya dem e/ya girêka dem e
Û her keser/ava di xew de/ya qîrînê ye
-Fredico Garcia LORCA

Rastiya ku Hêvî di neynik û caman de didît, bi gelekî naziktir û bedewtir bû ji rastiya sade, rastiya tazî. Ji dema ku rehên wî ji zemîna nîştimanê wî hatin rakirin û bajarekî ewropî ew sipart bajarekî din û wî tenhayî, serma û aloziyên surgûnê naskir, wî cîhanek nû ji xwe re di lîstik û hevpeyvinên cam û neynikan de ava kir. Heger di pencerên Mêtro de bûya yan jî di camên dikanan de, wî jîyana dora xwe mêze dikir û bi vî hawî, wî nêrînên xwe ji çavên "biyaniyan" diparast. Neynik bûbûn mîna mirtalekî û li pişt wan, di kûrbûna wan de, wî xwe vedişart, xwe diparast, dijiya. Herdem bi dizî, wî di pencerên Mêtro de, di tariya tûnelan de, li dora xwe dinêrî û bi wan kesên ku dilê wî dixwest, dida û distend, hildibijart. Pêşî, dema ew nû gihîştibû Ewropa, bajarê Parîsê, dilê wî pir dibijiya ku ew bi wan Ferensiyan re pêwendiyin xurt bihûne û nemaze bi wan keçên porzer û çavşîn re. Lê, her cara wî xwest xwe nêzîkî wê jiyanê bike, wan Ewropyian di wî de awirin tûj vedan. Ji ber vî tiştjî, bê guman, ew bi wan re, di neynikan de, di wan salên dawî de, dijiya. Bê ku ew wan keçên nazîk bitirsîne, bê ku ew ji ciyê xwe bilive, wî bi kêfa xwe, li wan temaşe dikir û xwe di şûna xortên bi wan re didît û carna jî, wi wan hembêz dikir, ramûsanin dirêj ji lêvên wan yên sorî dagirtî direvand. Wî destên xwe li dora newqên wan keçên bejinzirav dikir mîna bazin li dora dest, mîna gustilkek teng li dora tiliyek dagirtî û pir kêfa wî dihat. Heger çavên wî li çavên wan kesan biketibûya, ne di hundirê caman de, ew pir poşman dibû û rûyê wî sor dibû. Bê neynik, tu xweşbûna wê jiyana nû nebû. Bê cam, jiyana wî li Parîsê bê mane bû, vala bû, pûç bû.

Wê roja ha, Hêvî nû alîkariya mehane ji hukûmetê girtibû û ew ne di hundirê Metro de bû, û ne bi giranî di camên diknan de temaşe dikir. Baranek xurt dihat û ew li çayxanekê digeriya. Dema çavên wî li çayxanekê ketin û wî deriyê wê vekir, germeke xweş ew hembêz kir û pê re, laşê wî sist bû. Wî çavên xwe li maseke vala gerand. Merovên ku wek wî, ji ber baranê bazdabûn, hundirê çayxanê dagirtibûn lê, car din jî, çend ciyên vala mabûn. Hêvî, wek hercar ciyekî dûrî rûniştiyan helbijart, rûnişt, qahwak xwest, çixarak vêxist û bê ku haya wî ji wî hebe, wek hercar, ew ket nava gerînokên bûyeran û ew dûrî tevliheva çayxanê ket.

Hêvî fincana qehwê xist nava her dû destên xwe û germek pir xweş di hemû canê wî de xwe belav kir. Piştî firra yekem ji wê qehwa germ, wî du-sê hilmin xurt li çixara di nav tiliyên xwe yên zerbûyî de xist û pê re, bêhna wî hat ber û dilê wî hinekî fireh bû. Heja destê wî jî hinekî kêm bû.

Bê guman, ew cara yekem bû ku lingên wî diketin wê çayxanê. Wî xwest nas bike gelo ew li kîjan taxê ye li bajarê Parîsa bê hawe, tevlihev û fireh, lê, wî wê rojê kir û nekir ew negihîşt tu rastiyê û gumanên wî bê bersîv man. Berî ku ew xwe berde nava germa çayxanê, wî li ser cadên şil, baş baz dabû, di nava barana ku bi hêrs ji asman dibariya de. Tevî ku her dem serê wî giran bû ji tiştên tevlihev, du tiştan eşkere hiştin ku ew yekcar nema bizanibe ew li kû derê ye, di çi cax û zemanî de ye. Tiştê yekem ew bû ku di pencera mezin ya ku li cadê dinêrî re, wî tiştekî nedidît ji ber ku barana xurt dibû mîna dîwarekî qalind, mîna merşekî reş û wê nedihişt awirên wî di wê de herin û wê nêrînên wî bi kurtî dibirîn.Tiştê din ew bû ku pirbûna neynkan li ser dîwarên çayxanê merov gêj dikirin û rastî tev li hev dikirin. Di orta wan de, di kûrbûna zîvî û rohniya neynikan de, herkes dibû du, çar, deh, sed, hezar kes. Her merov bê dawî perçe-perçe dibû, ji hev diket, ji hev derdiket.

Hêvî nema da dû pirsên xwe tevî ku wî pir xwest navnîşana wê çayxanê nas bike. Wî di dilê xwe de got: Wey Xwedê, ez li ciyekî wilo li asmanan digeriyam û ew li erdan bi dest min ket. Tevî ku dema ew buhurî hundirê çayxanê, wî bawer kir ku ew xortê poreş û xwedî simbêl yê bi tenê bû, wî, ji ciyê xwe, di wan neynikan de, pir xortên wek xwe dît û ji xwe re got ku ew ne bi tenha xwe bû li wî bajarî. Bi dîtina wan xortan re, germek xweş xwe berda nava Hêvî û pê re, ew di nav diranên xwe de bişirî. Ew pir dilgeş bû dema wî dît ku ew poreş û xwedî simbêl jî wek wî bişirîn, tevî ku xemgîniyeke bê dawî, mezin li ser rûyên wan xweş dihat xwendin. Porzeran yek car guh li kenê wî nekirin, bê guman çelqiyabû û ew bi xwe re dikeniya û hinan ji wan jî bawer kirin ku bîraniyek xweş yan pêkenokek hatibû bira wî. Lê ew bi xwe daketibûn û nedixwestin ku yekî wek Hêvî bala wan bikşînê û yan kêm bike.

Gerek, di wê rojê de, Hêvî ji kêfa bask ji wî re çê bibûna ta ku ew di asmanê şahiyê de xwe winda bike, lê, ew li wê çayxanê dilşikestî bû. Her ku wî xwe li ber devê deriyê Buroya Alîkariya Biyaniyên li surgûnê didît û destê xwe dirêjî wan peran dikir, agir bi nava wî diket û wek miriyê ku serê wî li kevirê gorê bikeve, ew bi belengaziya xwe dihasiya. Tevî ku li ser hemû dîwarên wê çayxane, neynik bê haw pir bûn, dilê Hêvî ji her tiştî şikestibû, tevî ku ew pir geş bû bi peyda kirin û dîtina wê

www.arsivakurd.org

çayxana li gor dilê wî.

Di neynika li hember xwe, wî li rûyê xwe mêze kir û wî dît ku, di wê neynikê de, wî nikarîbû ji bilî xwe kesekî yan jî tiştekî din bibîne. Çawan nêrînên wî di kûrbûna wê de diçûn xwar, ew wilo jî li wî vedigeriyan. Di cî de, bêhna wî teng bû û ew li çarekê ker û gêj bû, çawan ew dê xwe azad bike ji pençên wjê neynika serhişk. Wî serê xwe bi vî alî de anî û bi wî alî de bir, lê nêrînên wî girtiyên wê kûrbûna zîvî û şahitok man. Ji nişkê ve, bûyerek ji zarokitiya wî, bi hêrs, hate bîra wî, êrîşî xeyala wî kir. Çavên wî yên reş û porê wî yê şil, di wî neynika ne wek neynikên din de, teyrê Xelilko anî bîra wî.

Dem dawiya zivistanê bû. Tevî ku ro ne pir bi tîn bû, wê keldûman ji zikê axa têrav derdixist. Dema Xelîlko bi teyrê xwe yê ecêb nêzîkî wan bû, zarokên gund derketibûn ser bênderê û bi xar û kaban dilîstin Xelîlko hûrik û kinik bû û bi qerf û pêkenokên xwe pir kêfa zarok û mezinên gund dianî. Wê rojê, li ser çîmên xwe yên kin û zirav, bi payin giran, wî di bin barê xwe de, xwe li gund girtibû û dixwest deqak berî deqê tiştê ku wî bi çavên serê xwe dîtibû, şanî merovên gun bidaya. Ereb di havînan de dihatin gund û hiriç yan jî leymûnên qûnsor bi xwe re dianîn û bi xêra wan lawiran, jî xwe re pere didan ser hev. Xelîlko di dilê xwe de, ji xwe re xweş dikir û digot: "Xwedê ev teyrê ecêb ji min re şand, de belkî ez jî bi xêra wî hinek pere ji xwe re bidim ser hev. Ma kê ji me teyrekê bi vê ecêbê bi çavên serê xwe dîtiye!"

Xelîlko teyrê xwe danî ser bênderê, bi çavên ji kêfan mişt, xweş li wî mêze kir û paşê li zarokan nêrî û bang li wan kir. Deh deqe nebuhirîn ku salixdan û pesnê teyr gihaşt mezinan jî û wan jî xwe li bênderê girtin. Teyrê Xelîlko bi kêmanî bi du caran ji qazek qelew û têrgoşt mezintir bû. Dema Xelîlko baskên wî vekir, gundî û nemaze zarokên wan dev ji hev û matmayî man. Hemû gundîyan çîrokên li ser qelafet û hêza teyrê Sîmir, di şevbuhêrkên de, ji devên dengbêj û çîrokvanan bihîstibûn û wan di serên xwe de got: "Ev heye tune ye çêlika Sîmir e!" Lê ew çawa hatibû gund û bûbû malê Xelîlkê qeşmer? Ji kîjan çîyayê Qahf hatibû? Çawa ew teyrê ku qehreman û pehlewanên dastan û efsanan ji tengasîyan derdixist, ketibû wê zehmetîyê? Kesekî nikarîbû bersîvên wan pirsan bide û her merovên gund li dora teyr digerîyan û gumanek dixistin şûna gumaneke din.

Nikilê teyr bê hawe dirêj û pehn bû û mîna telîsekî ji çermekî nerm bi jêra wî ve daliqyayî bû. Xelîlko destê xwe rada hundirê nikil û berê xwe ber bi mezinên gund ve kir û bi dengekî bilind got: "Bi xwedê tenekek genim û bi tiştên din xweş dikir. Wî destê xwe ji hundirê nikil kişand û çavên wî yên reş û hûrik ji kêfa mişt bûn.

Tiştê ku wê rojê bala Hêvî kişand ne bi tenê dirêjbûna nikil û mezinbûna gewdê teyr bû. Ji her du reşîkên çavên teyr xemgînî û êş dibarîya. Çavên teyr mîna du neynika bûn, hem kûr bûn, ham vala bûn. Teyr bi zorê xwe li ser her du çîmên xwe digirt û her ku wî baskên xwe mîna du depên derî vedikir, sînga xwe ber bi asman ve dikir û tekan dida xwe ku bi jor bikeve, ew wilo jî dihat xwar bi gewdê xwe yê ku serma, birçîtî û qelsiyê girantir kiribû. Ew diterpilî û bi ser nikilê xwe de diket. Zarokên gund perçên nan li ber wî danîn û hinek av xistin qutîyek vala ku li ber mirîşka bû, lê teyr guh li xurekan nedikir û wî her bi êş li asmanê şîn dinêrî. Dilê Hêvîyê dilpaqij bi teyrê Xelîlkê qeşmer şewitî û wî pir xwe nêzîkî wî kir û bi her du destên xwe yên qels, wî xwest wî ji ser axa têrav rake, lê gewde giran bû û dest qels bûn. Du caran, deh caran, bist caran Hêvî xwest wî lawirî bi asmên xe, lê teyr bêhêz mabû û bi ser de jî, Xelîlko serê perîkên baskên wî, bi kêreke tuj birîbû. Hêvî girrê xwe ji teyr venedikir û ji nişkê ve, teyr awirên xwe ji asman birrî û çavên xwe xist çavên Hêvî, wekî ku bixwaze jê re bibêje: "De girrê xwe ji min veke ha! Ma tu nabînî ku ez ji kîsê xwe çûme?" Dema Hêvî vegerîya malê û koma merovên gund belav bû, wî kir û nekir, nedikarîbû her du çavên xwe bide ser hev. Piştî du-sê rojan, teyrê Xelîlko mir li ser axa bênderê, bê ku kesek bizanibe navê wî çi ye, ew ji ku hatibû. Zilamên gund bawer kirin ku ew ji birçîbûnê mir, lê Hêvî xweş dizanîbû ku ew ne ji ber birçîbûnê mir. Ma xurek kêm bû?

Di vê çayxanê de, di wê roja han de, teyrê Xelîlko di wê neynikê de, di çavên Hêvî de dinêrî. Wî çavên xwe zoq xistibû çavên wî û ew êşa han, ew xemgîniya han, mîna barana wê rojê, ji wan dibariya. Ruyê Xelîlkê qeşmer di nav dûya cixaran de xwaro-maro dibû, lê teyrê wî, di wê neynika li hember ruyê Hêvî xweş dihat xuya kirin.

Dema Hêvî gihaşt Parîsê, piştî ku wî pir ûrdegeh guhertin, rojekê sûretê Teyrê Xelîlko wî li ser qaba kovareke frensî dît. Bi xwe wî xweş dizanîbû ku ew lawir ne çêlika Sîmir bû, lê wî navê wî nas nedikir û tiştek jî li ser nizanîbû. Destên wî lerizîn dema wî pelên kovarê vekir û li navê wî tebayî geriya. Teyr teyrê masîyan bû, masîxur bû, masîxurk bû? Ew çilo ketibû kûrbûna wan neynikan û çavên wî yên reş li hêvîya çi bûn, çi dixwestin? Di wê çayxanê de, ji nişkê ve bû xure-xura nava Hêvî û ew ji nêza dikir bêhiş bikeve. Wî destê xwe, bê hemdî xwe bilind kir û garsonê çayxanê, mîna muçesemekî, li ber wî li ser serê wî rawestiya. Bi perê alîkariya biyanîyên li surgûnê , wî dikarîbû, wê rojê her tiştî bixwe.

- Masî li cem we hene? Ez pir birçî me.

Garsonê çayxanê li bendî daxwaziyek wilo amede nebû. Wî serê xwe hejand û got:

-Na xêr, masî li vir nînin, lê eger tu dixwazî sendewîçên bi penêr û goştê berêz hene?

Hêvî li xwe matmayî ma, ji ber ku wî yekcar ji goştê masîyan hez ne dikir û wî nema dizanîbû çima dilê wî çû wî goştê ku pi kêm bû li gundê ew lê mezin bûbû. Berî ku ew dûr bikeve, garsonê çayxanê xwest tiştekî din bifroşê:

- Eger dilê te wilo dibije masîyan, ez dikarim qutîyek goştê tona ji bo te vekim. Ew jî masî ye û pir xweş e?

Berî ku Hêvî bersîva xwe bide, wî li neynika li ber ruyê xwe kûr nêrî. Nêrînên wî pêrgî nêrînên teyrê masîyan hatin.

- Na, zor sipas.

Wî perê qahwa xwe da û xwest derkeve, tevî ku baran herdem bi hêrs ji asman dihat xwar, bi ser bajarê Parîsa tevlihev. Dema wî xwest rabe ser xwe, ew bi giranbûna laşê xwe hesîya û wî bi zor xwe li ser lingên xwe girt. Lê cardin jî, ew ber bi derî ve çû ta ku masî peyda bike. Bi derketina wî, xortên poreş û xwedî simbêl jî derketin û teyrê Xelîlko, teyrê masîyan da dû wan.

Helbest

Sirûştê, na !

Zinarê zordaran ji çawîrê hilînin,
gupikên teze dibişkivin, serî hildidin"

Amed

Sirûştê, ha!
Xweşikê, wa!
Delalê, tu kok nabêjî "na!"
Em hemî dibêjine te "ka!"
Loma,
Te datînim gotineka mê.
Te pal vedaye ji destpêkê,
Ra nivîsandina vê helbestê.
Tu bi a min bike,
Dev bigere ji a Xwedê.
Keran kurtan meke,
Bergîrên berredanî
Hevsaran bi ser ve ke.
Keran, bergîran û SEDAMAN
Bigere di newala HELEBÇE wer ke.
*** * ***
Sirûştê, ha!
Xweşikê, wa!
Tunehiyê, çima nabêjî "na!"
Li hember çîçik hêz(1),
Tewrî tu ji hêzan(2),
Xurtirîn hêz,
Xwe zû dimelisînî.
Li ser te şer dikin,
Serok-merok, padîşa û axa.
Tu bûyî pariyek nanî qolayî,
Ketî devê evên ha!
Te hiltînin, te datînin.
Te dişon, te vedişon.
Te pak dikin, te çak dikin.
Te dixwin, te vedixwin.
Te dadiweşînin, te hildiweşînin.
Te nû dikin, te dû dikin(3).
Bombên atomî û hîdrocênî
Li ser te diçînin,
Gazên jehrîn te dişewitînin.
Ku min hay ji xwe tune ye,
Te hay ji xwe hebe.
Te ji ciyê te vediçengînin!
Min li ser vediweşînin!
SEDAMAN diran tûj kirine,
Avê li ber dilên xwe direşînin.
Çiqasî wa mêyik bûyî?(4)
Ne ez zanim te mêyik dikin?
Dîyar e tim a paşîn,
Rastir e ji a pêşîn.
Bi vê bûnê(5),
Dadmendî koç bar kir,
A genî hêlîn çêkir,
Hat kete şûnê.
Bênan, bêhêz, bêziman,
Jê dêşin.
Kulên leglegê ji ber dikêşin(6).
Çawa kef dikare
Hêrişê bibe ser dirêşê?(7)
*** * ***
Car carina, sergerm dibî,
Bi hêrs dîn dibî;
Dînîtiyeke welê
Wujadanê jî napejrînî.
Ge barana te ye,
Ge volkanê te ye,
Dîsa ne xema zordaran a te ye!
Te hûrhûrî dikin.
Sed ji sedî, bê fedî,
Em bejî bûn, me tu kirî kedî.
Kedîtiyeke pir erzan,
Kar tê de nîne, tev de ziyan.
Axa te çiqasî pir e,
Mar li ber firefir e,
Wekî dinê, dixwe bi qinyat.
Mirhovên xudan tac
Têve didin, lê didin (8),
Bi lingan vê dikevin (9),
Ji keran pîstir kirin, pêlê dikin.
Kok li ber te nakevin;
Ne li ber ên dinê dikevin.
Bawer dikin bi a Sultan Silêman:
"Dinya dûvê berên e"(10).
Şer e, gurtî ye, qirên e.
Te çi pîsî kir,
Te çi rindî nekir,
Ji te re dimêne.
*** * ***
Baviko "na!",
Dayikê "na!",
Sirûştê, Ha!
Delalê, wa!
Mêyikê, na!
Felekê, ta!

Parîs, 14.04.1989

Nîşeyên helbestê:

1- çîçik: piçek
2- tewrî: tevî ku

Ferat

Ahmed Husseynî

"Carekê"
-eger tu hatî
û lehîyek..
bo min kir xelat
-eger te ez daweşandim
ji toza
tirsê..
-eger te ez meşandim
li ser pêla
pirsê..
-eger te ez hiştim
di hêtûna
hewarê de..
-eger te ez kuştim
di dûmana
dildarê de..
-eger te wêneyên kovanê
bi şebnemê
şilkirin..
-eger te çar rexên cîhanê
di birîna kewê mîn de
kilkirin..
-eger te rengê xwe ji
keskesorekê
kirî..
-eger te "ronahî"ya min
bi dizî
dî..
tu bi xwedê kî bêje:
Bo çi, ta çi jînê
tu ê hêsran birêjî..?
Bo çi ro li ser serê te
xav û gêj e...?

13.1.1990

3- dûkirin: şewitandin

4- mêyik: gotineke naxweş e. Kesê ku kêmaniyê û nerindîyê qebûl dike û dengê xwe nake.

5- bûn: fact, fait, waqi'a

6- Kula Leglegê: kuleke bê derman e.

7- dirêş: derzîya mezin ku pê çêrm qul dikin

8- têvedan: a) hêvotin, b) xerckrina pir

9- vê dikevin: pê dikevin

10- berî ku Sultan Silêman bimire qewîtiyên xwe kirin ku li rex laşê wî li ser darebestê dûvekî beranan deynin û kêrekê jî tê de daçikînin û ji xelkê re hewaldin ku dinya mîna dûvê berên e, te di ku re jê birî, ew ji te re dimîne.

www.akademiakurdi.org

* * * Weşanên Nû * * *Weşanên Nû * * * Weşanên Nû * **

ÇÎYAYÊ AGIRÎ
Roman
Yaşar Kemal
Weşanxana Çanda Kurdî
Şerefnaz ev romana Yaşar Kemal ji tirkî wergerandîye bo kurmancî. Roman bi wêneyên Abîdîn Dîno ve hatîye nexşandin û 128 rûpel e.

ORDÎYA MÊŞÊN HUNGIV
Çîrok
Bekir Yildiz
Weşanxana Çanda Kurdî
Ev çîrok ji alîyê Şerefnaz hatîye vergerandin û bi kurmancî ye. Îsmaîl Gulgeç bi wêneyên xwe çîrokê xemilandîye.

XWENÇE-Cild I
Gotinên pêşîyan, kilam-dîlok û çîrok
Zeynelabîdîn Zinar
Weşanxana Çanda Kurdî
Xwençe 278 rûpel e û ji sê beşan pêk hatîye. 1-Gotinên pêşîyan, 2-Kilam, 3-Çîrok. Di vê berhemê de nimunên edeyata gelêrî ya devkî hatine berhevkirin. Pirtûk bi kurmancî ye.
Adresa Xwestina hersê pirtûkan:
Weşanxana Çanda Kurdî
Box:161 39
103 23 Stockholm/Sweden

MÎRSAD-UL ETFAL
(Amadegaha Zarûkan)
Sêx Mihemed Kerbela
Weşanên Jîna nû
Mîrsad-ul Etfal ferhenga Kurdî-Farisî ye, ji 16 beş û 320 beytan pêk hatîye. Zeynelabîdîn Zinar ev berhem ji tîpên erebî wergerandîye bo latînî.
Adresa xwestinê:
Jîna Nû Förlaget
Post Box: 240 12
750 24 Uppsala/Sweden

NAVÊN KURDÎ
Amed Tigrîs
Weşanxana Apec Tryck & Förlag
Di vê pirtûkê de 1554 navên keçan û 1185 navên lawan cih girtine.

Adresa xwestinê:
Box: 33 18
163 03 Spånga/Sweden

GULBIJÊREKE NAVÊN KURDÎ
Fexredîn
Pirtûk bi du zaravan û bi du elfabeyan (Kurmancî û Soranî) hatiye çapkirin. Navên keç û lawên kurdî di vê pirtûkê de hatine berhevkirin.
Adresa Xwestinê
Sara Bokhandel
Dalagatan 42
113 24 Stockholm/Sweden

ZEVIYÊN SORO
Roman
Nûrî Şemdîn
Weşanxana Kurdistan
Ev roman berhema yekem ya Nûrî Şemdîn e û bi kurmancî hatîye nivîsîn. 313 rûpel e.

BERBANG
Roman
Erebê Şemo
Weşanxana Kurdistan
Rêber Dilşêr ev roman ji tîpên kirilî wergerandîye bo tîpên latînî. 131 rûpel e.
Adresa xwestina herdu romanan:
Weşanxana Kurdistan
Box 14
142 21 Trångsund/Sweden

İTTİHAT-TERAKKİ ve KÜRTLER
Lêkolîn
Naci Kutlay
Weşanxana Vejin
Nivîskarê pitûkê Naci Kutlay, lêkolîna xwe ya li ser tevgera ittihat-teraki û pirsa kurd bi tirkî nivisîye. Pirtûk 160 rûpel e.
Adresa Xwestinê
Weşanxana Vejîn
Box 39 122
100 54 Stockholm/Sweden

ŞÎLAN
Kurteçîrok
Torî
Weşanên Aza
Pirtûk ji 7 kurteçîrokên Torî pêkhatiye û bi kurmancî ye.
Adresa Xwestinê:
Weşanên Aza
Gemeenteplein 32
3200 Kessel-lo/BELGIE

---

dewama rûpela 26'an

destan bin di bê û destan bin di binalê. No wino bidomno, destanbindimendena ma jî do bidomno. Ma no hesab a nêşenê serkewê.

Bewnîrê rewşdê dinyay ra, senî pê tepşenê, senî pî ya serehewadanê, meselanê xo pîya halkenê û benê ser.

Ewro dinya di bol çî yo viryêno. Însanî, mîlletî yê benê jew û qandê meselandê xo serehewadanê û kewnê ray. Dinya di çî yo viryeno labrê rewşê ma yo nêviryêno. Roj şino rojî berbatêrî beno.

Ma Kurdî 24 24 milyonê. Ma yê nêşenê panc merdiman bîyarê pê heti, jew bê û pî ya bigirweyê. Ma do senî û çi hesab a pê di kar bikerê û serkewê? Hergî jew o sazê dano piro. Hergî yew o rayê tepşeno û rayên a şino. Ma misayê estorda şarî nişê, şemşêrê şarî bigirweynê û qandê şarî lej bikerê.

Wa rojê bo, wa helê bo, ma qandê xo, qandê mîlletê xo bigirweyê. Do wexta ma ra biweryo, yan jî çîyê do ma ra kemî bo?

Bê jewbîyayenî, bê doşîpêdayenî welatê ma nêreyêno.

Bahdê heme çî, yanî roja didini, se'atandê peyenan di, bi şeklêdo demokratîk a nûneran enbazê ki organandê Federasyon di kar bikerê, weçînay.

Ez ê enbazan hemini bi zerî da weş a û germey a pîroz kena.

'Emeleya mi yena, ê do kar û barê xo weş ray o berê û serkewê.

Lazim o ma ê enbazan tenîya kar û barî bin di nêverdê û alîkareya înan bikerê.

No bar barê ma heme Kurdan o. Eke ma pîya barê xo hewa dê, bar do şenik (sivik) bo û ma do pa nêtewê. Bar barê ma yo, kar karê ma yo.

Ez heme nûneran û meymanan pîrozkena, qandê jewbîyayenda înan.

Selamanê xo yê birayey qandê înan

www.arsivekurdi.org

Kongreya Federasyonî

Koyo Berz

Kongreya Federasyonî ya desini (10) bi weşey û serfîrazey a ravêrdi.

10 û 11 dê sibata 1990 di sûkda Foketshus-Stockholm di Kongreya Federasyondê Komelêndê Kurdistanî virazîyay.

27 Komelê Kurdistanî û nûnerê ci amey û başdarê kongreda xo bî.

Kongre bi marşa Ey Reqîb ya abî û dest peykerd.

Xeylê partîyan, organîzasyonan û komelanê Kurdan, Swêdîyan û xerîban qandê pîrozkerdenî û serkewtanda Federasyonî mesaj û selamê xo kongre rê riştbî û dosteya xo nîşan dêbî.

Namey nuneran jew bi jew amey wendinî.

Xêylê meymanî û nûnerî ameybî û beşdarê kongrî bîbî.

Bahdê abyayenda kongrê serokê Federasyoni Keya Îzolî dest bi qisandê xo kerd. Qisandê xo di behsê meselandê Kurdan, rewşdê Kurdan û problemê i vijyênê Kurdan vernî, kerd û derheqdê kar û bardê Federasyonî di malûmat da.

Bahdê qiseykerdenda serekê Federasyoni dostandê Kurdan ê xerîban ra, Partîya Çepa Komunîstan (VPK) ra, C. Herrmansson, Partîya Muhafezekaran ra Maria qisey kerd û qisandê xo di bahsê meselandê Kurdan û rewşo ki ê yê tey di yê kerd, meselandê Kurdan ser o vinderdî.

Wezîrê daîreyê Xerîban jî qandê Kongre nameyê riştbî û Kongre pîroz kerdbî.

Nê wirna rojan mîyan di pers û persandê Kurdan ser o munaqeşe amekardinî û kar û bardê Federasyonî ser o ame vinderdeni.

Bi raştey tay persî û perskerdenî û rexney û hesabperskerdenî cadê xo di bî.

Labrê taydê ci jî azmîn ra û 'erd ra bî, yanê aw û hawa ra. Tay pers û perskerdenî bî, to qeçekê biyardê şermî ra ê pers û perskerdenî nêkerdê. Tay rexne cadê xo di nêbî û bîleheq ameyê munaqaşa kerdinî.

Lazim o çîyo ki kes bişo bikero û çîyo ki destê kesî ra bîro, kes ey ser o vindero, ey ser o qisey bikero û ey ser o rexnanê xo bikero. Kes ey ser o tawrê xo bigîro.

Ma tay çîyan wazenê ki ewro no rewş di, no hal di kalik û pîrkekê ma mezel ra werzê zî nêşenê halbikerê, virazê û ray fînê. Wexto ki kes rexne bigîro, lazimo verê coy kes bi xo raşt bo, durust bo ki kes jewnay ser rexne bigîro.

Qandê çiçî ma bîleheq qiseyê girdî kenê? Hetan ki ma raştey nêvînê, raştey nêvajê pê di raştî nêbê ma nêşenê serkewê û meselanê xo halbikerê.

Verê heme çî ma rê jewbîyayeni, raştey, durustey û destêpêtepiştenî lazim a.

Qandê nê hesabî lazim o ma jew bê, destanê pê tepşê, alîkareya pê bikerê û salme salme qisey nêkerê û forsî nêdê xo.

Wexto ki ma forsî bide xo, lazim o ma destan bin di nêbê û destan bin ra vijyaye bê.

Wexto ki ma gird kisey kenê, jew do nêvajo "la oxil, ti yê çiçî rê wina gird qisey kenê, bin di nîyê?" Wexto ma do çi babet a, çi hesab a cewabê ey bidê?

Qiseyêda girdandê ma esta, vanê "Veyvi vana mi bidê cado dûrî, ez xo rê bikero bol bol zûrî".

Ma çiçî şenê û destê ma ra çiçî yeno, ma ey bikerê û ey ser o vinderê. Ma qandê Kurd û Kurdistanî bigirweyê û Kurdeya xo bizanê. Kurdistanê xo, milleta xo û rewşo ki ê yê mîyan di ey xo vîra nêkerê.

Bi raştey no kongre di ma heme bol û bol kêfxweşî bî û kêfê ma ame. Sebebê ci no yo: Çihar heme paçandê Kurdistanî ra nûner û meymanî ameybî û bi zerîda weş a, bi birayey û wayey a destê pê tepiştîbî û jew bîbî.

Ameyina înan, jewbîyayena înan paştî dayma û ma kêfweşkerdî.

Lazimo no tenîya teberdê welatî di dom nêkero û kilm nêramo.

Lazim o roj bi roj gird bo û vila bo.

Welatî zeredî jî wina bo, heta diha ravey şiro.

Kurd jew beden, jew rih û jew qise bo.

Wina nêbo ma nêşenê çîyê qezenc bikerê û xo destanê bin ra vejê, serkewê. Hendi ki ma pê di dişmeney bikerê, fekê tifingandê xo hetê pê ya bikerê, ma nêşenê serkewê. Faydey ney do tenîya dişmenî rê bibo.

Eger ma hergî jew hetê kiştên a bancê û rayê tepşê, ma do vinî bê û tim

dumahik r. 25

CEZA Û XORTÊ MACÎRAN

Gore yê îstatîskandê resmî, Swêd di, xortanê ki serra parî sûc kerdê û mahkeman ceza dayê ci, zaf biyê vêşî. Nê xortan miyan ra, ê ki serrê ci 18'î bin di rê heme zî qeçê macîran ê. Gore yê serr da pêrarî (1989), amorê ceza giroştişê nê xortan % 20 (se ra vîst) biyo vêşî. Ki ci ra vernî nêgîriyo, amorê nînan do hewna zî vêşî bo.

Qandê coy, gerek her pî, may, komel û Federasyona Kurdan na mesela ser o vindero.

SEMINERA UPPSALA

Di 10.3.1990 di, komela Kurdistanê ê Uppsala semînerê hadre kerdi. Qisekerdoxê semînerê, semînerê Federasyonda Kurdan Keya Îzol bi. Mewzî yê semînerê, "Swêd di muhim biyayişê xo organîze kerdişê kurdan, kar û bar û sîstema Federasyonê" bi.

Keya Îzol'î dûr û derg nê mewzî ser o qisey kerdî û malûmat da goştarekerdoxon. Dima zî goştarekerdoxan persî Keya Îzol'î re kerdî.

Semînerî bi awayên do weşa dest pa kerd û bi awayêndo winaya zî qediyê.

Zeki yeno zanayiş, di Swêd di 30 komelê kurdan girêdayeyê federasyon ê. Ki semînerê winay di komeland bînan di zî viraziyê, do nabênê komelan û federasyonê hewna weşêrî bo. Xo ra di kongreyê federasyoni, ê peyênî di, na mesela ser o delegan xeylê gazincî kerdî.

Heyder Xoce

www.arsivakurmanci.org

Arêkerdox: Mihem Himbêlij

HIMBAZÊ TO Ê WERÎ

Welatan ra yew welat di yew (jew) mêrdek beno, o û cenîya xwi û yew lajê jê beno. Pî lajikî hal û wextê yê baş o, debara jê gelek baş a, Rojê mêrdek lajdê xwi ra vano: paştîya xwi bi her însanî ra girê medi, xwi rê çimanê xwi aki, bira çew to nêxapêno. Dema gi ti xwi rê dost peyda kenê, bira dostê to ê werî nêbê, bira dostê to dostê xasî bê.

Lajê jê vano:

- Wa bo bawo.

Nabên ra zaf toy şono mêrdek hewnêyeno ki tim di xortî lajdê jê reydi gêrenê. Rojê mêrdek lajdê xwi ra perseno, vano:

- Oxil ay kam î, hertim to reydi gêrenê? Ez veynena ti şonê kora tim ê to rey dayê.

Lajik vano:

- Bawo, ay wirdî xortî himbazê min ê. Pî jê ti ra vano:

- Oxil, mela himbazê to başî bê.

Lajik vano:

- Bawo himbazê min cay çinyî, gelek baş î û sadiq î.

Enê wirdî xortan ra yew qama jê derga û dekerde wo, xorto bîn yew dergo barî wo. Hal û wextê wirdê xortan zî baş nîyo, debara jîn rind nîya. Heme hîrê xortî dema gi yenê tê het, kenê kêf û sohbetî, zaf yewbînan ra hes kenê. Heme hîrê zî zaf xwi ra bawer î. Çi bîro jîn ser di xemê jîn nîyo. Şonê ko ra tim tê rey da şonê, yew bê yewerî nêşono gidê xo zî ser. Şonê kora se, lacê mêrdekî mesrefê wirdê himbazandê xwi keno. Wirdî xortî zî zaf qedra, lacdê mêrdekî gênê û gelek qiymet danê lacikî. Pî lacikî yew zemano dûr û derg jîn taqîb keno, hewnîyeno ki enê wirdî xortî dostê lacdê jêyê raştikînî nîyê. Mêrdek hewnîyeno ki eni wirdî xortî hertim lacdê jê ra çerenê. Rojê mêrdek veynda lacdê xwi dano, vano:

- Lajê min, ez vana qey ay xortê gi tim to reyda gêrenê himbazê toyê raştikînî nîyê, himbazê to yê werî yê.

Hema lajê ji pêrdê xwi ro hêrs beno, ti ro qîreno, vano:

- Bawo, ti însanî nişinasnenê, ti derheqdê jîn di bîla sebeb xirab dişmiş benê. Enê embazê min gelek baş î, ez jîn ra zaf memnun a, ez vaja şorê ko ra, nêvanê "ma nêşonê", ez vaca "bimrê", ê ca di mirenê.

Pî lajik ti ra:

- Lajê min, sey (zey) to nîya.

Lajik tim pêrdê xwi ro hêrs beno. Pîyê jê vano:

- Bira bo, bira sey to bo.

Rojê mêrdek şona çarşiya merengozan, şono dikandê yew merangozî vano:

- Silamû'eleykum. Merangozcî silama jê gêno, de rê çay qehwexana ra wazeno. Çaya mêrdekî yena, mêrdek çaya xwi weno, merengozcî ti ra perseno, vano:

Xalo, to xêr o, mirazê to çi yo?

Mêrdek vano:

- Usta efendî, ez wazena ti mi rê darda gozêr ra yew tabût virazê.

Merengozcî vano:

- Xalo ti qaydê xêrdê xwi rê semedê camî virazenê?

Mêrdek vano:

- Nê usta, ez semedê xwi virazena. Ez wazena hetanî ez ganîya wazena xwi rê yew tabût bida viraştiş, ja bera keye di rona, vexta gi ez bimira bira mi dekê ja zere û bi tabût ra mi defnê 'erdî bikê.

Merengozcî de rê tabûta jê virazeno. Wexta gi mêrdek wardeno şono keydê xwi, merengozcî veynda di şagirtanê xwi dano, vano:

- Xaloy reydi ena tabûtî berê keydê jê.

Şagirtî vanê:

- Serî û çiman ser. Û mêrdekî reydi şonê keydê ji. Ceniya ji hewniyena gi mêrdê ja ha yeno keye û di hebî şagirtan yew tabût girota xwi polî ser ha mêrdekî rey di yenê ber bi keydê jîn.

Cenik tersena û bi xwi rê vana gelo a çi tabûta mêrdê min ano keye. Wexta gi mêrdek keye reseno, şagirtan ra vano:

- Lajê min bi qurban, biyarê eno koşedê, heyat di ma ja tîk bikê. Şagirtî tabût koşedê heyat di tîk kenê, mêrdek toy pera dano her yewînî û wirdî şagirtî tepa agêrenî şonî cay kardê xwi.

Senî şagirtî keydê jîn ra vejîyenê teber, hema cenikê bi hêrs mêrdedê xwi ra vana:

Rebî to ro varo! Ena çi tabût to arda keye, ti mi dekenê ya xwi? Mêrdek vano:

- Cenikî mi semedê xwi arda.

Ceniki wardena boxçika xwi gêna şona keydê pêrdê xwi. Key pêrdê cenik zî cadê jîn ra teqrîben rayîrê di roj û şewan o. Welhesil ceniki keydê perdê xwi resena. Çend rojî nabên ra vêreno.

Pîya ja ti ra vano:

- Keyna min to xey ro?

Cenik vana:

- Bawo, ez cigriyaya.

Pîya ja ti ra vano:

- Keyna min, qey ti naşî ya? Ti hindî wayirî yew lajî ya, lajê to pîl o (gird o), xort o.

A pêrdê xwi ra vano:

- Bawo, mêrdê min bîyo delû (xînt). Ez nêşina jê reydi debari bika. Di hîrê rojî ra ver hame, keye yew tabûti xwi reydi girota arda, o hindî qalanê tewşan keno.

Pîyê cenik vengê xwi nêkeno. Beno şan, lajê mêrdekî yeno keye pêrdê xwi ra vano:

- Bawo, kanî maya mi se ra şîya?

Mêrdek vano:

- Oxil, may to çendê şîya keydê bawkaldê to. Nabên ra yew aşmi vêrena mêrdek hewnîyeno cenîya ji nîna, lajdê xwi ra vano:

- Lajê min, key bawkaldê xwi maya xwi bîyari.

Lajik vano:

- Wabo bawo.

Û dano piro şono key bawkaldê xwi. Wexta gi lajik şono, hema pî ji wardeno şono çarşî qesabxanan, yew dikandê qesabxanî ra yew leşa beranî erîneno, beno keye di leşa beranî ademaqikilî tumî sûr keno û jê dekeno yew pêlekî mîyan, fekê pêlekî zî gêno û pêlekî dêkeno zeredê tabût mîyan, fekî tabût mêxkeno. Beno şan, mêrdek şono veynda wirdî himbazandê lajdê xwi dano, himbazê lajdê jê yenê keye. Mêrdek de rê xizmet keno. Ê vanê:

Xalo, ka lajê to?

O vano:

- Lajê min şîyo key bawkaldê wxi.

Dima mêrdek vano:

-Şima zanê mi çi rê veynda şima dawo?

Ê vanê:

- Nê.

Mêrdek vano:

- Min abîşo yew mêrdim kişto, şima gerê alîkarîya (ardimê) min bikê, ma jê berê axurdê ma di dekê bindê 'erdî.

Wirdî xortî vanê:

- Xalo ma vinderê bira lajê to jî bêro.

Mêrdek vano:

- Nê, qey ferqê şima û lajdê min çi yo? Şima zî sey lajdê min î. Bawerîya min bi şima esta. Ez înan nêkena şima

yewerî ra vanê.

Ê vanê:

- Ma senî yewerî ra vanê.

Mêrdek jîn beno heyat di tabût bide navneno û jîn ra vano:

-Haydê ma şêrê axur ez şima ra vaja ko ra korti bikenê.

Wirdî xortî û mêrdek şonî axur, mêrdek xortan ra vano:

- Ewta bikenê.

Hama wirdî xortê korti kenenê, tabûti dekenê korti miyan. Serê kortî ademaqilî gênî. Wexta gi kê cadê kort ra hewnîyenê tew belî nîyo gi kê wêra korti kenda. Wirdî xortî wezîfê xwi temam kenê. Mêrdek himbazandê lacdê xwi ra vano:

- Elah şima ra razî bo, ez ena hewla şima qetîyen xwi vîrî nêkena.

Wirdî xortî vanê:

- Xalo qey ma se kerdo? Ma amê tikê alîkarîya (ardimê) to kerdo. Lajê to her roj alîkarîya ma keno. Wirdî xortî xatir mêrdekî rawazenê û şonê keydê xwi.

Maneno rojo bîn. Lajê mêrdekî û maya xwi yenê kêye. Mêrdek lacdê xwi ra mesela vernî ra heyanî peynî vano. Lajê ji ti ra vano:

- Bawo, wexta gi to mêrdek kişt, çewerî ti dî ya nê?

Mêrdek vano:

- Nê, çewerî ez nêdîya. Lakim min veynda wirdî himbazandê to da, ê amey, ma axurdê ma di yew kort kend, ma meytê mêrdekî dekerd bindê 'erdî.

Lajek vano:

- Bawo embazê min saxlem î, çewerî ra nêvanê.

Mêrdek vano:

- Ez nêzana, ti min rindêr jîn şinasnenê. Lakim oxil eger ti rojê xwi embazandê xwi ra bicigirnê, himbazê to zî rojdo teng di şorî gerê ma qerekol di bikê se, ay himbazê to saxlemî nîyê, eger gerê ma nêkê se himbazê to saxlem î.

Lajik vano:

- Ti rast vawî, bawo.

Lajik çendê xwi himbazandê xwi ra cigirneno. Himbazê jê se kenê nêkenê lajik jîn reydi aşt nêbeno û goş bi jîn ra nêkiweno. Di hewtey nabên ra vêreno, wirdî xortî yewbînan ra vanê:

- Ma enê embazdê xwi ra çî nêvato, çi rê jê xwi ma ra cigirnawo? Xorto dergo barî, xortê dergê qalîndî ra vano:

- Ti zanê eno himbazê ma hindî qedra ma nêzano, hindî ma ra hez nêkeno, o zî sey pêrdê xwi quretey keno, pîyê jê temê kerdo. Hindî xêrê jê ma rê çinîyo. Xorto zaîf zortê qelewî ra vano:

- Bê ma yew derbi bidê piro.

Xorto bîn vano:

- Ma senî hewa derbi bidê piro?

Xorto dergo zaîf vano:

- Ma şorî gerê pêrdê ji qereqolî di bikê.

Xorto bîn vano:

- Ma zî alîkarîya pêrdê jê kerd, ma zî bî sey ji suckar.

Xorto zaîf vano:

- Ma seroktê qereqolî ra vanê "pî jê perey day ma, co ra ma alîkarîya pêrdê jê kerda".

Welhasil kenê tê sere, şonê qereqol. Serokî qereqolî jîn ra vano:

- Şima xêr o, şima hamê ewta?

Ê seroktê qereqolî ra vanê filankesî yew mêrdek kişto, ha axurdê xwi di kerdo bindê 'erdî. Serokê qereqolî jîn ra vano:

- Şima çi zanê?

Ê vanê:

- Filankesî veynda ma da, ma alîkarîya jê kerd, o pî himbazdê ma wo. Lajê jê keye di nêbi, pî jê hame veynda ma da, ma şî alîkarîya jê kerd.

Serokê qereqolî wirdî xortan ra vano:

- Şima zî sey jê suckar ê.

Wirdî xortî vanî:

Pî jê perey dayê ma, co ra ma alîkarîya jê kerd. Ê didin zî pî himbazdê ma wo, eger ma alîkarîya pêrdê jê nêkerdênê se, ga (ka) pî jê lajdê xwi ra vajo, ga lajê jê ca di ma bikişo. Ma tersa ver di alîkarîya jê kerd.

Serokê qereqolî veynda çend hebî cendirman dano û şonî keydê pêrdê lajekî. Serokê qereqolî mêrdekî ra vano:

- Ma eşnawito ki to yew mêrdim kişto û meytê jê to axurdê xwi di kerdo bindê 'erdî.

Mêrdek vano:

- Nê, mi mêrdim nêkişto.

Serokê qerekolî vano:

- Înkar meki, ma mesela sere ra hetanî peynî zanê, filankesan ma ra vato.

Mêrdek vano:

- Wabo, lakim ez yew şertî reydi cay meytî şima rê vana, şima gerê şorê veynda seroktê qeza û miftî dê, bira ay wirdî zî bêrê ez hema cay meytî şima nawnena.

Serokê qereqolî di hebî cendirman erşaweno seroktê qeza û miftî dim a, ê wirdî zî yenê keydê mêrdekî. Mêrdek vano:

- Ez inka şima bena cawo gi mi meyt dekerdo bindê 'erdî.

Jîn gêno beno axurdê xwi, seroktê qereqolî ra vano:

- Cay meytî ewta wo.

Serokê qerekolî emir dano cerdirman, cendirmey wêra kenenê, hewnîyenê gi raşta yew tabût a korti mîyan da. Tabût vejenê, hera serdê ja pank kenê. Mêrdek vano:

- De qapaxê tabût akê.

Cendirmey qapaxê tabûti akenê, hewnîyenê gi yew torbo sipî yew çî ha te de wo û fekê yê beste wo. Fekê pêlekî akenê, çi bewnê? Eger yew beran, leşa yê tûmî sûrkeyda ya, zeredê torbî da. Beranî vejenî, boya goştî sûrkerdî zeredê keyî mîyan di bena vila, ti vanê qay to newe goşt sûr kerdo. Serokê qereqolî vano:

- Xalo qey to eno hewa kerdo?

Mêrdek vano:

-Enê wirdî xortê gi amey gerey mi to heti kerd, ê himbazê lajdê min ê. Enê xortî wexta gi lajdê min reydi bî himbazî, ez tim hewnîyaynî ki enê wirdî xortî semedê menfe'etî bîyê himbazî lajdê min. Min lajdê xwi ra va ki "enê embazê to ê werî yê, imbazî to yê rojdo teng nîyê", lajê min mi ra hêrs bi, mi ra cigirîya, mi ra va gi "ti neheqey himbazandê mi kenê". Ez zî werişta min eno plan viraşt gi ez enê himbazanê lajdê xwi biceribna, bira lajdê mi rê eno bibo se yew ders.

Hama lajê mêrdekî şono destê pêrdê xwi, ti ra 'uzirê xwi wazeno, vano:

- Bawo ti mi 'efo biki.

Pîyê jê ti ra vano:

- Lajê min, wexta gi yew to ra pîlêr bi û to ra va gi "ena mesela enhewa ya, ti sey mi biki", bizanibi gi ay mêrdimo gi to pîlêr o, a mesela jê sere ra vîyarta. O zano koray a mesela kar o, koray ja zirar o. Ti goşdarîya ay mêrdimî biki. Çimkî to ra bi tecrubeyêr o, a mesela yê sere ra viyerta, o zano kora çewt a, kora raşt a. Hema wê ra serokê qerekolî, serokê qeza û miftî destê mêrdekî gênê û vanê hinzar şikir aqildê to rê xalo!

Mesela ma ewta qediyena, bimanê weşîyê di. (*)

(*) Min ena mesela fekdê yew Ermenî re eşnawita.Mihem Himbêlij

باری نەتەوایەتییش هەر هەموویان کوردن. لازەریف لەجێی ئەم ئاخافتنانە، دەبوایە بیگوتایە هۆی دوورکەوتنەوەی لوور و بەختیارییەکان لە نەتەوەی کوردن، لە ئەنجامی سیاسەتی داڕێژراوی شایەکانی ئێران بووە. بەتایبەتی لەپاش دروستکردنی سیاسەتی «ئوستان» لە ئێران. لەتەنیشت دروستکردنی «ئوستانی کوردستان» کە بەشێکی کەمی خاکی کوردستانی ئێران دەگرێتە خۆی، ئوستانی لوورستانیشیان لە ژێر ناوی دیموکراسیەت، کە لوورەکانیش کەمەنەتەوەیەکی تری ئێرانن و پێوەستە ئوستانی خۆیان هەبێ، دروست کرد. هەر ئەم سیاسەتەش کاریگەرێتی زۆر خراپی لەسەر لوور و بەختیاریەکان هەبووە.

لازەریف، پارچەی کوردستانی بن دەستی تورکیا بە پێشکەوتووترین پارچەی کوردستان دەزانێ، بەڵگەشی ئەوەیە کە لە ٤٥ ساڵی رابردوودا، تورکیا هەنگاوی زۆر گەورەی بەرەو پێشەوە هەڵهێناوە. زانا لازەریف روونی نەکردۆتەوە ئاخۆ ئەم پارچەیە لە چ بوارێکدا پێشکەوتووە؟! لە بواری رامیاری، ئابووری یان کۆمەڵایەتی‌یەوە! ئەوەتا جەنابی لازەریف بۆ خۆشی دەزانێ هەر ئێستاش ١٦ ملیۆن کوردی ئەو پارچەیە بە «تورکەکێویلکە» بانگ راهێشتن دەکرێن. بە دیتنا من ئەمە بۆ خۆی لە بواری رامیاری بەرپەرچدانەوەیەکی باشە بۆ جەنابی لازەریف. لە بواری ئابووریش خولاّ لە دەمی لازەریف گوێی لێ بێ... سوبحانەللاّ، لە دەوڵەتی تورکیای پێشکەوتوو کە ئەمیش کە هەر ئەوانن، کارخانە و کۆشک و سەرا و هاوینەهەوار لەو پارچەیەی کوردستان دروست دەکەن و بایەخ بە ئاوەدانکردنەوەی دەدەن. لە بواری کۆمەڵایەتیش ئەوە هەر دەوڵەتی تورکیای پێشکەوتووە، وانەکانی ڕۆشنبیری، میۆزوو و فەرهەنگ و هونەری فێری دانیشتوانی ئەو پارچەیە دەکا. لەوانەیە لازەریف خۆی لەمە لابدا، مامۆستا تورکەکان کە دەنێردرێنە کوردستان بەو نیازە دەچن کە زارۆکەکانی کوردستان فێر بکەن کە ئەوان تورکن و بابەگەورەیان ئەتاتورکە. لە تورکیا منداڵی کورد، لە یەکەم ڕۆژی ژیانی قوتابخانەیدا دەبێ بڵێ من تورکم، یەنی بە زۆری لێدان و تێهەڵدان لەلایەن مامۆستاکان، منداڵانی کورد دەبێ خۆیان بە تورک بناسن و زمانی کوردی قەدەغەیە لێیان. ئەز تێدا هەڵوەدام لەوەی کە جەنابی لازەریف پێشکەوتنی ئەم پارچەیە لە چ بوارێکدا دەبینێ!.

پرۆفیسۆر لازاریف دەبێژێ: «لەم دە ساڵەی دواییدا کێشەی کورد لە گشت جیهاندا دەنگی داوەتەوە و دانی پێدانراوە، ئیدی کەس ناتوانێ بایەخی پێ نەدا». لەمەڕ پێڕۆسترۆیکاش دەڵێ: «لە ئەنجامی پیرۆستزیکا لە سۆڤیەت و وڵاتانی هاوکار لەگەڵ سوڤیەت، کاریگەریەتیی ڕاستەوخۆی بۆ سەر کێشەی کورد دەبێ». لازەریف جارەکی دی لایەنگر و سیاسیانە دەئاخفێ، چونکە ئەگەر لەو دە ساڵەی ڕابردوو کێشەی کورد لە جیهاندا ناسرابێ، ئەوە لە لایەن سۆڤیەت کەمترین بایەخی پێ نەدراوە. پرۆستزیکاش هەتا ئێستا (هەڵبەت دەرگای ئایندە بە کراوەیی بەجێ دەهێڵین)، بچووکترین کاریگەرێتیی نەک ڕاستەوخۆ، بەڵکو ناڕاستەوخۆشی بۆ سەر کێشەی خەڵکی کوردستان نەبووە. کارەساتەکەی هەڵەبجەی شەهیدیش هاوکاتی پیرۆسترۆیکایەکەی کەرەملین بوو، کە سۆڤیەت نەک هەر عێراقی مەحکووم نەکرد بەڵکو پاکانەشی بو کرد و تەنانەت کاتێ فەرەنسا و ئینگلیز و ئەمریکا داوایان لە نەتەوەیەکگرتووەکان کرد بۆ ئەوەی لیژنەی لێکۆڵینەوە بنێرنە کوردستانی بندەستی عێراق بۆ ئەوەی لە چۆنیەتی ڕووداوەکە بەئاگا بن، سۆڤیەت و چینی گەلێر تەنیا دەنگ بوون کە دژی ئەم داخوازییە دەنگیان دا و لە ئەنجامی ئەم هەڵوێستەی وان، کار، لە بەرژەوەندی عێراق تەواو بوو. هەر لە سەردەمی پێڕۆسترۆیکاش بوو کە پراڤدای سۆڤێتی نووسی: «عێراق چەکی کیمیایی لە دژی کوردەکان بەکارنەهێناوە، بەڵکو ئەمە پروپاگەندەی چەند کوردێکی هەڵاتووە». دیارە پرۆفیسۆر لازەریف لەم بارەیەش لایەنگیرانە خۆی بواردووە.

جەنابی لازەریف دەبێ بزانێ وەکو کوردناسێ، خەڵکی کوردستان چاوەڕوانی پشتگیری و یارمەتیی پتری لێ دەکا و داوا دەکا کە جەنابی لازەریف پتر سەرنج بداتە تایبەتمەندێتییە نەتەوایەتییەکانی خەڵکی کوردستان بۆ ئەوەی لە ئایندەدا تووشی بەکارهێنانی ئەم جۆرە بۆچوونانە نەبێت. □

* مەبەستی لازەریف ئەوەیە- ئایە کورد نەتەوەیەکی سەربەخۆیە، یاخود لە ڕێگای تەکامڵدایە... چونکە لەنێو کۆمەڵ شناسانی سۆڤیەت تا ئێستاش هەندێ زاراوە هەیە بەپێی مەرجەکانی ستالین لە یاسای نەتەوەکان تەماشا دەکرێن.

بەربانگ

کەچی هەرکەسێ تەماشای نەخشەی ئێستای کوردستان بکا و لەگەڵ ئەوەی لە میژوودا باسی لێوە کراوە بەراوردی بکا، بۆی دەردەکەوێ کە نەخشەی ئێستای کوردستان بچووکترە و مەزنتر نییە. چونکە ئەگەر تەماشای نەخشەی سەردەمی شەرەفخانی بەتلیسی بکەین، دەبینین کە گەورەترە. نەخشەکە لە ئەدەنەوە بۆ مەلاتیە و لەوێوە هێڵێکی راست بۆ یەریڤان و لەوێشەوە بۆ خوارەوە، و خۆی لە ئەسفەهان و شیراز دەدا و تا دەگاتە سەر تەنگەی هورمز، لەوێشەوە هێڵێکی راست بەرز دەبێتەوە و بە تەنیشت بەغدادا تێدەپەڕێ و خۆی دەگەیەنێتەوە ئەدەنە. ئەم نەخشەیە موسڵ و تکریت و هەمەدان و شیراز و ئەسفەهان و یەریڤانیش دەگرێتەوە، کەچی ئەو شارانە و گەلێ جێگەی دیش ئەورۆ لەو نەخشەی جەنابی لازەریڤ کە بە گەورەی دەزانێ دانین. لازەریڤ بەهیچ جۆرێک باسی ئیمپراتۆریەتی میدیا ناکا، کە لە سەدەی هەشتی پ.ز. تا سەدەی شەشەمی پ.ز. گەورەترین دەسەلاتی سەردەمی خۆی بووە. لەوانەیە لازەریڤ ئەوەش بە هی فارسەکان بزانێ!!

کوردناسی سۆڤیەتی دەڵێ: «کوردستان و کوردەکانی رۆژاوای تورکیا، قەفقاس، خۆراسان، لوبنان و تەنانەت پەنابەرەکانیش دەبێ مافی چارەنووسی خۆیان هەبێ». بێگومان ئەمەیان هەڵوێستێکی مرۆڤانەیە و خەڵکی کوردستانیش سوپاسمەندی هەڵوێستی ئەوهایە. بەڵام کاک لازەریڤ لە جێگەیەکی دی ئۆتۆنۆمی بۆ چارەسەرکردنی کێشەی کورد لە سەردەمی ئێستاکە رەچاو دەکا، و لەگەڵ بۆچوونی مافی چارەنووس نییە... کە هەڵبەت ئەم هەڵوێستەش بە پێچەوانەی هەڵوێستی سالی پاریەتی کە لە وتوێژێکا گوتی: «کوردەکان، لە شەڕی نێوان ئێران و عێراقدا، هەلی راگەیاندنی دەوڵەتی سەربەخۆیان لەدەست دا».

پرۆفیسۆر لازەریڤ، لەمەڕ ژمارەی کوردەکان دەبێژێ: «ئەو وڵاتانەی کوردستانیان لەنێو خۆیاندا دابەش کردووە، هیچ کاتێک بە راست و دروستی ژمارەی کوردەکان ناخەنە روو و دەخوازن کورد وەکو چەند خێڵ و هۆزێ نیشان بدەن». لێرە لازاریف وەکو مرۆڤێکی رامیار، نەک وەکو زانایەکی میژوو، تانە لەم دەوڵەتانە لەمەڕ هەڵوێستی تەسک و نامرۆڤانەیان بەرانبەر بە کوردەکان دەدا. بەڵام بە هیچ جۆرێک سەرنج ناداتە ئەو ناوچە ئۆتۆنۆمیە کوردیەی کە لە کۆماری ئازەربایجان، لە ئەنجامی هەڵوێستی مرۆڤانەی لێنین دروست بوو و لەگەڵ مردنی لێنینیش ستالینی دەست سۆر بە خوێنی گەلانی سۆڤیەت، لە سالی ۱۹۲۹ ناوچە ئۆتۆنۆمییەکەی هەڵوەشاندەوە و کوردەکانیشی تەفر و تونای کۆمارەکانی تری سۆڤیەت کرد. لازاریف، باسی هەڵوێستی خراپی کاربەدەستانی بەنێو کۆمۆنیستی کۆماری ئازەربایجان ناکا، کە چەند ناپاکانە هەوڵی کەم نیشاندانی ژمارەی کوردەکانیان داوە. بڕوانە بەربانگ، ژمارە ٦١، وتارەکەی د. جەمشید حەیدەری، کە ئەویش بە سەرچاوە لە د. شاکری محوی وەرگرتووە و دەبێژێ: «لە سالی ۱۹۲۱، ژمارەی کوردەکانی ئازەربایجان ۳۷,۷۸۰ کەس بوو، لە سالی ۱۹۲٦ ژمارەی کوردەکان گەیشتۆتە ٤١,٠٠٠کەس. دیارە لە نێوان سالەکانی ۱۹۲۱-۱۹۲٦، ژمارەی کوردەکان تەنها چوارهەزارێکی زیاد کردووە. کەچی لە سالی ۱۹۳۹، یەنی پاش ۱۳ سال، ژمارەی کوردەکانی ئازەربایجان گەیشتۆتە ٦,٠٠٠ کەس. لەماوەی ئەم ۱۳ سالە، بەجێی ئەوەی ژمارەی کوردەکان پتر بێ، ۳٥,٠٠٠ لێ کەم کراوەتەوە... تا لە ئەنجامدا لە سالی ۱۹٦۹، ئیدی هەر بە جارێ کورد لە ئاماری ئازەربایجان نەماوە». ئەگەر وەکو لازەریڤ رادەگەیەنێ، نیازی دەوڵەتە داگیرکەرەکانی کوردستان لەو بارەوە جێبەجێکردنی سیاسەتی شۆڤێنیزمانەیە. کە بێگومان لەو رووەوە لازەریڤ راست دەبێژێ. بە دیتنا من دەبوایە لازەریڤ سیاسەتی کاربەدەستانی خۆیانیشی لەو بارەیەوە شی بکردایەتەوە.

زانای کوردناس، دیارە جارەکی دیش، زۆر لایەنگر و سیاسیانە چاو لە باسی کۆماری کوردستانی سالی ۱۹٤٦ دەپۆشێ و باسی ئەوە ناکا کە ستالین کۆمارەکانی کوردستان و ئازەربایجانی بۆ گوشارخستنە سەر ئێران بۆ سەودای نەفت دروست کرد.

پرۆفیسۆر لازەریڤ، بۆ تەواویەتی کوردبوونی لوور و بەختیاربیەکان، ئایینزای شیعە دەکاتە بابەتی باسەکەی خۆی، کە گوایە ئەمانە شیعەن و کەچی زۆربەی خەڵکی کوردستان سوننەن. ئێمە لە هیچ شوێنێ نەماندیوە و نەمانزانیوە کە ئایین بۆ پێناسەی نەتەوە بەکاربهێنرێ. لازەریڤ دەبوایە بزانێ، لە کوردستان لەتەنیشت ئاینزاکانی شیعە و سوننە، ئایینزای مەسیحایی، یەزیدی، کاکەیی، جوو و هی دی هەن و لە

www.arsiwakurd.org

ناسراوە. نەتەوەی کوردیش خودی میژوویەکی دوور و درێژ و کەلتوورێکی دەوڵەمەند و زمانێکی هاوبەشە، کە ئەمانە هەموویان بەندە بنەڕەتییەکانی دڕووستبوونی نەتەوە پێکدێنن. لازەریف ئەگەر کوردناسێکی ڕۆژاواییش بوایە، دەمانگوت: «خەم ناکا»، چونکە ڕۆژاواییەکان بوونی نەتەوە ڕاستەوخۆ بە دەوڵەت و دەسەلاتی ڕامیاری دەبەستنەوە، بەڵام بۆ لازەریف وەکو مرۆڤێکی کۆمۆنیست دەبوایە لانی کەم ئەمەی لەبەرچاو بوایە کە لە بۆچوونی کۆمۆنیستەکاندا، خاک و زمان و کەلتوور و میژوو، وەک لە سەرەوە باسمان لێوەکردن بەسن بۆ ناساندنی نەتەوە.

لازەریف لە جێگەیەکی دی دەبێژێ: «تایبەتمەندێتیی نەتەوە بۆ کورد، بە شێوەیەکی گشتی تائێستا ناشکرا نەبوون و ... یەکێک لەو تایبەتمەندێتییە بنگەییانە کە دەبێ لە نەتەوەدا هەبێ «زمان»ە. دیارە هەتا ئێستا جەنابی لازاریفی کوردناس گومانی هەیە کە «کوردی» زمان بێ. چونکە دەڵێ: کە ئەز ناتوانم بێژم کورد زمانێکی نەتەوەیی هەیە.

باشە جەنابی لازەریف وەکو خۆی دەبێژێ کە زمانەوان نییە، بۆچی وا بە سووک و هاسانی دەخوازێ بێ زمانمان بهێڵێتەوە!

لازەریف دەبێژێ: دیالێکتەکانی کوردی ئەوەندە لە یەکتری دوورن کە تا ئێستا بۆ زاناکانی سۆڤیەت و ڕۆژاوا ساخنەبۆتەوە، داخوا دەکارن شێوەی کرمانجی، سۆرانی، زازایی و لوڕی بە یەک زمان دابنێن یان نا؟! و دەڵێ هەندێک لەو باوەڕەدان کە ئەمانە یەک زمان نین، پێم وایە ئەوە دەبێتە دەستدرێژییەکی مەزن بۆسەر نەتەوەی کورد. لێرە جەنابی لازاریف جارێکی دی کورد بە نەتەوە نێودەبا... ئەز وا تێدەگەم لازاریف پێش ئەوەی خۆی تێکەڵی ئەم باسە بکردایە، دەبوایە لە کرمانج و سۆران و زازایی پرسیار بکردایە داخوا ئەوانە چ نەتەوەیەکن و بە چ زمانێکیش دەپەیڤن؟ خۆ لوڕەکانیش ئەگەرچی لە ژێر سیاسەتی خراپی شایەکانی ئێران هەمیشە هەوڵ دەدرا کە نێوی کەمایەتییەکی تری ئێرانیان بەسەردا بسەپێنن، ئەمەش بۆ ئەوەی لە قەوارەی نەتەوایەتی کورد و خاکەکەیان کەم بکەنەوە. بەڵام، هەروەک لازەریف خۆشی دەبێژێ: زۆر لە لوڕەکان دەڵێن کە ئەوان کوردن.

لازاریفی کوردناس، دیارە وا تێدەگا کە تەنێ لەناو کوردەکان جودایی دیالێکتی هەیە، کە وا پیشان دەدا لەبەر جودایی دیالێکتەکانی کوردی، ناتوانن بڵێن کورد زمانی هاوبەشی هەیە. پرۆفیسۆر لازەریف دەبێ ئەوە بزانێ کە جودایی دیالێکتی شتێکی زۆر سروشتیە و ئەمەش لە ئەنجامی هەڵکەوتی جوگرافیایی دڕووست بووە و لەناو هەموو نەتەوەیەکی ڕووی زەویشدا هەیە.

لازەریف لە جێگەیەکی دی دیاریکردنی سنوور دەکاتە هۆ و پێشگر لە ناساندنی گەلی کورد و دەبێژێ: «ئەگەر بە مانای زمانی فارسیی کۆن لێکی بدەینەوە و بڵێین کوردستان ئەو جێگەیە کە کوردی لێ دەژی، ئەوکاتە ئەوە وشەیەکی ماناتەسکە و ناتوانێ سنووری بۆ دابنرێ».

بەڵگەشی بۆ ئەمە ئەوەیە کە ژمارەیەکی زۆری کورد لە دەرەوەی خاکی کوردستان دەژین، جەنابی لازەریف چاک دەزانێ کە مەبەست لە کوردستان تەنها ئەو خاکەیە کە ئێستا لە نێوان تورکیا و ئێران و عێراق و سووریادا دابەشکراوە و نزیکەی ٥٥٠٠ سالە کوردەکان لەسەری دەژین، و سنووری جوگرافیاییشی هەیە. بڕوانە (Goode's World Atlas) چاپی ٦ی سالی ١٩٨٢، لە لاپەڕە ١٥٠-١٥١، لەمەڕ زمانەکانی ئەوروپایی. لەو لاپەڕانە نەخشەی جوگرافیای کوردستان زۆر بە تێر و تەسەلی چاپکراوە و تەنانەت لوڕ و بەختیاریەکانیش کە جەنابی لازەریف دووڵە لە کوردستانی بوونیان، هەموویان سەر بە نەتەوەی کوردستان. ئەم سەرچاوەیە زۆر لە زانکۆکانی ئەمریکا، لە کۆرسی جوگرافیا دەخوێنرێ، یەکێک لەو زانکۆیانە، زانکۆی (Middle Tennessee State University).

کوردستان، مانای ئەوە نییە هەر جێگەیەک کوردی لێ بژی، پێویستە بە کوردستان بناسرێ. جەنابی لازەریف باش دەزانێ کە «ستان» یەنی (Land)، وەکو (England، Tysk-land، Scotland) بە مانای خاکی ئینگلیزەکان و خاکی ئەڵمانەکان و خاکی سکۆتیەکان. کوردستانیش یەنی (Kurdland) و تەنیا بەو جێگەیە دەگوترێ کە لە میژوودا بە خاکی کوردەکان ناسراوە. خەڵکی کوردستان، هیچ کاتێک جێگەی کوردەکانی لووبنان، جەزایەر، پاکستان، سوید و هی دی بە کوردستانیان نەزانیوە و ناشزانن.

لازەریف ئەم نەخشەیەی ئێستای کوردستان بە گەورەتر لەو نەخشەیەی کە لە میژوودا باسکراوە دەزانێ.



چەند تێبینییەک لەمەڕ سەمینارەکەی پرۆفیسۆر لازەریڤ

کرمانج گوندی - دانمارک

پرۆفیسۆر لازەریڤ لە سەرەتای ئاخافتنەکانی خۆی دەبێژێ، کە ئەو نوێنەری دەوڵەتی سۆڤیەت نیە کە بە ناوی دەوڵەت بئاخفێ، بەڵکو وەکی زانایەکی کوردناسی دەپەیڤێ، ئەمە مانای ئەوەیە کە را و بۆچوونەکانی وەک مرۆڤێکی رامیار (سیاسی) دەرنابڕێ.

لە ژمارە ٦٢ی گۆڤاری بەربانگ لاپەڕەکانی ٥٣ تا ٥٧، بابەتی ئەو سەمینارەی پرۆفیسۆر لازەریڤ، لە بەرواری ١٩٨٩/١١/١١، لە ستۆکهۆڵم لە هۆڵی (folketshus)، لەسەر مێژووی کورد و کوردستان پێشکەشی کردبوو، خوێندمەوە. سەرنج و بۆچوونەکانی لازەریڤی کوردناس وای لێکردم چەند تێبینییەکم لەسەر سەمینارەکەی هەبێ!

پرۆفیسۆر لازەریڤ دەبێژێ: ژمارەی گەلی کورد ٢٠- ٢٥ ملیۆن کەسە، گەلێکی بێ وێنەیە، واتە لەگەڵ ئەم ژمارە گەورەیەی هەیەتی و هەتا ئێستا وڵاتی ئازادی خۆی نییە. لێرە پرۆفیسۆر لازەریڤ، مخابن بۆ گەلی کوردی بن دەست دەخوا، کە گەلێکە و گەلێکی بێ وێنەشە و پێویستە وڵاتی سەربەخۆی خۆی هەبێ. لە جێگەیەکی دی دەڵێت: «ناوی کورد بێ کێشە بەکارناهێ، لەبەرئەوەی وەکو جەنابی وی دەبێژێ هەتا ئێستاش بۆی ڕوون نەبۆتەوە ئاخۆ کورد گەلە یا گروپێکی ئەتنۆگرافییە، واتە گەل وێنە! ئەمە بە پێچەوانەی بۆچوونی جەنابی لازەریڤە کە دەڵێ کورد گەلێکی بێ وێنەیە. بەڵام لێرەدا گومانی هەیە کە کورد گەل بێ، چونکە دەڵێ لەوانەیە کورد گروپێکی گەل شێوە بێ و دەبێژی کە هەتا ئێستاش کوردناسەکان لەم بارەیەوە هاوڕەنگ نین. لێرەدا ئەز دەخوازم لە جەنابی لازەریڤ و کوردناسەکانی تری وەک وی بپرسم: ئاخۆ ئەوانە چ کوردناسێکن کە هەتا ئێستا بۆیان ڕوون نەبۆتەوە داخوا کورد گەلە یان گەلشێوە؟!

دەبوایە جەنابی لازەریڤ هەندێ نموونەی گەلشێوەی بهێنابایەتەوە تاوەکو ناوەڕۆکی ئاخافتنەکانی ڕوونتر بوایە. ئەو گەلشێوەیەی وی سەرنجی بۆ ڕادەکێشێ و نێوی ناهێنێ، بێگومان لەگەڵ چەند گەلشێوەیەکی دی نەژادێک دروست دەکەن کە خزیانی پێ بناسێنن. چونکە هیچ گەل یا نەتەوەیەکی ڕووی زەوی نییە مێژوو شایەتیی بۆ دابێ کە وەکو کوارگ لە بن بەردێک بەبێ ڕیشەیەکی مێژوویی سەری دەرهێنابێ کە کورد یەکێک بێ لەوانە، تاکو پرۆفیسۆر لازەریڤی کوردناس وەکو گەلشێوە بیناسێ.

ئەگەر مەبەستی لازاریف کەمەنەتەوەیی بێ، ئەوە وشەی کەمەنەتەوە هەر لە بنچینەدا ڕاست نییە و ئەوەی هەشە لە ئەنجامی دابەشکردنی وڵاتانی خەڵکی بەسەر وڵاتانی دی لەلایەن زلهێزەکانەوە دروست بووە.

نەتەوەی کورد بە لەبەرچاوگرتنی سەرچاوە مێژووییەکان ٣٥٠٠ ساڵ پ.ز. لەو سەر زەمینەی ئێستا پێی دەگوترێ کوردستان نیشتەجێ بووە و لەپێش ئەم ناوەش کورد بە میدی و کوردستان بە میدیا ناسرابوون. میدییەکان لەبەر مێرخاسی و ئازایەتییان، لەلایەن گەلانی هاوسێ بە گورد، واتا ئازا و نەترسی ناویان ڕزیبوو، کە بێگومان میدییەکانیش ئەم نێوەیان بۆ ناساندنی خۆیان بەلاوە خۆش بووە و گەلەک جێگە لە دەرەوەی وڵاتەکەیان، خۆیان هەر بە گورد دەناساند، تا وای لێهات ئەو نێوەی کە وەکو پێناسەی تایبەتمەندێتی وان بەکاردەهێنرا، بوو بە نێوی نەتەوایەتی وان و «گورد»ەکەش بە ڕەوتی ڕۆژ بوو بە کورد. ئەم کوردەش خاوەنی خاکێکی تایبەتییە کە لە سەدەی یازدەیەمەوە بە کوردستان

www.arsivakurdi.org

تیپی مۆسیقای ناز



ناز، تیپێکی خنجیلانەی کەمدەرامەتی مۆسیقای کوردییە، ساڵی ١٩٨٥ لەلایەن چەند لاوێکی دڵسۆزی کوردەوە لە ستۆکهۆڵم دامەزرێندرا. تا ئێستا لەبەر دەستکورتی نەیانتوانیوە ئاهەنگی تایبەتیی خۆیان بکەن، بەڵام لە زۆربەی ئاهەنگە کوردییەکاندا هاوبەشییان کردووە و لەگەڵ زۆربەی هونەرمەندە کوردەکانی وەک شڤان، ڕەزازی، نەجمەدینی غوڵامی، گوڵستان و ...هتد مۆسیقاژیان چالاکیان نواندووە و لە زۆربەی شارەکانی سوێد مۆسیقایان لێداوە.

تیپی ناز لەم دواییانەدا کەوتۆتە چالاکییەکی باش و نیازیان پێکهێنانی گروپی مۆسیقای منداڵانە لە ستۆکهۆڵم، بە نیازی ڕاهێنانی منداڵانی ٦-١٠ ساڵان لەسەر لێدانی ئامێری هەمەچەشنەی مۆسیقا و کۆراڵ.

ئەندامانی ئەم تیپە بڕێتین لەم لاوانەی خوارەوە:

١- حەمە ڕێدار: گۆرانیبێژ.
٢- سامان جەلال: گۆرانیبێژ.
٣- هێرش هاشم: ئۆرگ.
٤- دانا ئەحمەد: جاز.
٥- جاسم مەجید: گیتار.
٦- هەڤاڵ قادر: تانگۆ.

هیوای سەرکەوتن بۆ ئەم تیپە و ئەندامە دڵسۆزەکانی دەخوازین بۆ پێشخستنی مۆسیقای کوردی.

سەرکەوتووبن.



www.arsivakurdi.org

دەیگێڕاوە، ئەو چەند ساڵەی دوژمن دەستی بەسەر گوندەکەدا ڕۆیشتووە واتە ١٩٧٥- ١٩٨٠، سەخت و قورسترین ڕۆژانی ژیانی ئەو بووە، بگرە ئەو ڕۆژانە سەرەتای دەست پێکردنی تەمەنی پیرێتیی ئەو بوون، چونکە بۆ یەکەم جار بوو، ساچمەکەی لێ قەدەخەکرابوو، تەنیا دەبوایە بەداو بچێتە ڕاوەکەوان... ئیتر بەدەم قاسپەقاسپی کەوانەوە دەرگەڵە بەدوای سالی ١٩٨٠وە، سەرلەنوێ چووەوە باری ناوچەیەکی ڕزگارکراو و هێزەکانی پێشمەرگە تێیدا دەحەسانەوە و هاتووچۆیان دەکرد. تا سەردەمی سالی ١٩٨٧ کە دوژمنی فاشی بڕیاری شەڕی زەوی سووتاندنی بەسەر کوردستاندا دا و ئەم جارەش دەرگەڵە لە شەوی ٢٢/٢١-٤-١٩٨٧دا داگیرکراوەتەوە و هێزەکانی دوژمن بەوپەڕی دڕندەیی کەوتوونەتە سووتاندنی خانووبەرەکانی بە بلدۆزەر و ئەوەشیان بۆ نەکراوە بە مادەی تی.ئێن. تی. تەقاندوویانەتەوە، وەک قوتابخانە و نەخۆشخانە و مزگەوت و دوکان و چەندان سەکۆی دانیشتن... کەچی ڕۆڵە دڵێر و وەفادارەکانی گوندەکە بۆ پایزی هەمان ساڵ، ئەمجارەش خانووبەرەی نوێیان بنیاد ناوەتەوە... بەڵام تۆ بڵێی دوژمن وازی لێبێان هێنابێ؟

نەخێر... وێنەکان بە چاکی وەڵامان دەدەنەوە... ئەم جارەش فاشستەکان لەبەرئەوەی بەرنامەکەیان وێران کردنی کوردستان بوو، نەوەک هەر وازیان لە «دەرگەڵە»ی بێ تاوان نەهێنا، بەڵکو ئەو کەرەتەیان لە ڕۆژانی ٩٨٨/٥/٢٤دا بە شالاوێکی دڕندانەتر تەڕ و وشکیان پێکەوە سوتاند، واتە لە ڕۆژی ٩٨٨/٥/٢٤ دا لە ئەنجامی هێرشێکی بەربلاوی بەرسێبەری تانک وفڕۆکەی هەمەجۆر بە یەکجارەکی گوندەکەیان لەگەڵ خاک تەخت کرد و ئێستاکە شوێنەواری «دەرگەڵە»ی قەشەنگ، چۆڵەوانیە. تەنیا جەندرمە ئێشک گرە داگیرکەرەکان لە دەوروبەری هەڵنیشتوون و پاسەوانی لە دار و بەرد دەکەن، بەڵام هێشتا بۆیان نەکراوە دڵی خۆیان بدەنەوە کە کاریان تەواو بووە، کورد براوەتەوە، چونکە هێشتا چریکەی چۆلەکە و کۆترە کێوێلکە، قاسپەقاسپی کەوی ڕەنگاوڕەنگی سپی و زەرد و بەڵەک، شنە و شەمالی باووبۆ، ڕەهێڵ و با و بۆران، شەختە و بەفر و کرێوە، لووڕەلووری گورگ و چەقەڵ، لار و لەنجەی نەمام و داربەڕووی کوردستان بنبڕ نەکراون، هەر دەڵێن... بەڵێ ئێستاکەش هەندێن و هەڵگورد یەکتر دەبینن، هێشتا کەوەکانمان کۆستان و گەرمێنێ دەکەن... بۆیە دوژمن با چاک لەوە بگات ئەگەر ئەمڕۆکەش نەهێڵێ «دەرگەڵە» و گوندەکانی مەڵبەندی ژیان ئاوەدان بکرێنەوە، سبەینێ کە نەوەی نوێ هەموو گوندێکی کوردستان لە جاران جوان و قەشەنگ تر بە ئاوەدان کراوی دەڕێ... گەلەکەشمان لە نووچ دان ڕاست دەبێتەوە.

* لە نووسینی ئەم باسەدا زانیارییەکانی نامەیەکی کاک (م. دەرگەڵەیی) لەزۆر ڕووەوە سەرچاوەی ناوکی باسەکەمان بووە و وێنەکانیش هەر لە لایەن ئەوەوە پێمان گەیشتووە کە جێگای سوپاس و ڕێزلێگرتنی تەواوە...

بەداخەوە هەموو وێنەکان لەبەر دەستدا نەبوون، بۆیە تەنیا هەر چوار وێنە بڵاودەکەینەوە.

پاشماوەی چالاکییەکان

کوردستانی باکوور

بەبۆنەی کارەساتەکەی هەڵەبجە لە کوردستانی باکوور ،کۆبوونەوەو خۆپیشاندان لە زۆر شوێنی وەک :دیاربەکر، ئەلعەزیز،سیلیڤانو قزلتەپە ،جزیری بۆتان و مەلاتیە کراوە.هێزی لەشکر و ژاندەرمەی تورک پەلامار و هێرشی خۆپیشاندەرەکانی داوە،زۆر کەس بریندار گیراون. بەڵام نەهێرشی دەوڵەتی تورک و نە گرتن و بریندار کردنەیتوانیوە لافاوی خۆپیشاندانی نارەزایی خەڵک کپ بکاتەوە. لە هەندی شوێندا چەند ڕۆژنامەنووسی بێگانە لەلایەن پۆلیسەوە گیراون .

تورکیا

لە زور زانکۆ و دانیشتگاکانی تورکیا،لە شارەکانی : ئە ستەمبۆل، ئەزمیر ئەنکە را وئەدەنە خوێندکارانی کورد و تورکە پێشکەوتنخوازەکان مانیان لە خوێندن گرتوە و،یادی هەڵەبجە یان زیندوو کردۆتەوە. لەهەندێ شوێندا لێکدان لەنێوان پۆلیس و خوێندکاران ڕوویداوە.
لەئەستەمبۆل کوردەکان کۆمیتەیان دامەزراندوە و کەمپانیای ئیمزا کۆکردنەوەیان دەست پێکردوە ،بۆ ئەم مەبەستەش پەیوەندیان بە فیدراسیۆن گرتوە. چالاکی ئەم ساڵ ئەوەمان بۆ دەردەخا کە گەلی کورد یادی ئەو کارەساتەقەت لەبیر ناکا و خەبات دەکە بۆ ئەوەی ڕۆژی ١٦ ئادار بکرێتە ڕۆژێکی جیهانی بۆ نە هێشتنی چەکی کیمیاوی .

نزیکترین نمونەش هەر لەسەرەتای دەست پێکردنی شۆڕشی ئەیلولی ١٩٦١ەوە ئەم گوندە وەک ناوچەیەکی رزگارکراو، مەڵبەندی بەڕێوەبردن و شوێنی حەسانەوەی شۆڕشگێڕان بووە، زۆربەی سەرکردە و کادیر و پێشمەرگەکانی شۆڕش کە لە ناوچەکەدا بووبن و پێیدا گوزەریان کردبێ، دەرگەڵە میوانداریی کردوون. زۆرجاریش بووەتە شوێنی حەشاردان و شاردنەوەی کادیر و سەرکردەی یەکێک لە حیزبەکانی کوردستان و عێراقی.

لێرەدا جێی خۆیەتی ئەوەشمان لەبیرنەچێت، نمونەی بەشداربوونی رۆڵەکانی ئەم گوندە لەهەر جۆرە بەسەرهاتێکی گەلەکەماندا، ئەوەبوو کە یەکێک لە پیاوەماقوولەکانی ئەم گوندە خۆی بۆ هاوەنگی لەگەڵ موقاوەمەتی بارزانیەکان بە ناوی «سلێمان بەگی دەرگەڵەیی» هاوڕێ لەگەڵ مەلا مستەفای نەمر چووەتە سۆڤیەت.

بەم چەشنە هەروەک چۆن لەدەمی گوندیەکانی «دەرگەڵە»م بەرگوێ کەوتبووە، بەدرێژایی سالانی بەسەرچوو بەهۆی شالاوی رنوهێنانی بەفری قەدپاڵی هەندرێن، گەلێ سال وابووە چەندان خانووبەرە ژێر بەفر کەوتوون و گوندەکە هەتا هاتووە زۆرتر بەرەو قەدپاڵ و لووتکە ئەو «زینوە نەوێیەی» لاپاڵێکی هەندرێن چوەتە خوارەوە، وەک لە نمونەکان دەردەکەوێ، بەڵام هەرگیز وەیشوومەی بەفر و زستانی کوشندە و هەتا بەسەرهاتە یەک لەدوای یەکەکانی هەرەسهێنانی خەبات کردن ملی بە دەرگەڵە شۆڕ نەکردووە و کۆڵی پێ نەداوە، بەڵام دوژمنانی کورد وا دیارە هەر لە زووەوە رق و قینیان لەم گوندە قارەمانە هەڵگرتوە، بۆیە یەکەم شالاوی سووتاندن و وێرانکردنی گوندەکە بۆ رۆژانی جەنگی جیهانی یەکەم دەگەڕێتەوە کە بە دەستی جەندرمە تورکە عوسمانییە رەگەزپەرستەکان ون بووە، بەڵام خەڵکەکەی دوای ماوەیەکی کورت زۆر لە جاران پتەوتر بنیادیان ناوەتەوە.



دیارە شالاوی بەعسیە فاشستییەکان لە بەهاری سالی ١٩٧٤دا بۆ سەر گەلی کورد و ناوچە رزگارکراوەکان، گوندە شیرینەکەی «دەرگەڵە»شی گرنوەتەوە. هەر لەو سالەشدا دوژمن بەوپەڕی جانەوەری لەرێگای هێرشی ئاسمانییەوە زۆر بە خەستی لە کۆتایی بەهاردا بۆردومانی کردوە و زۆربەی خانووەکانی بەسەریەکدا رووخاندوە، کە ئەوکات خەڵکەکەی لە خۆپاراستنی هێرشی ئاسمانیدا پەنایان بردووەتە بەر حەشارگە و ئەشکەوت و پەنابەرد و قەدپاڵی شاخەکانی دەوروبەر... بەڵام دیسانەوە جوتیارە زەحمەتکێشەکانی ئەم گوندە قارەمانە دەستیان بە خۆدا شۆڕ نەکردۆتەوە و وەریان بەرنەداوە، بە هێز و وزەیەکی نوێ خانوبەرەی خۆیان دووبارە ئاوەدان کردۆتەوە. کەچی لەگەڵ میژووی خامۆشی هەرەسهێنانی ئەوێ رۆژێی شۆڕشدا، بۆ یەکەم جار دوای سالانێکی زۆر «دەرگەڵە»ش وەک سەرتاپای کوردستان کەوتە بەر چنگی داگیرکەران و دوژمن بە چەندان سەنگەر و تەپکە دەوروبەری گوندەکە، واتە بەسەر لوتکە و ئەولا و ئەولا خۆی هەڵاس دابوو، بەچاوی پڕ لە رق و دوژمنایەتی بۆ جوانی و قەشەنگیی گوندەکە و ژیانی هێمن و دڵخۆشانەی خەڵکەکە دەیان ڕوانی... لەو رۆژانەش زۆربەی رۆڵەکانی گوندەکە کەوتبوونە کرێکاری کردنی رێگاوبان بەسەر ئەو تۆڕە رێگایە عەسکەریەی دوژمن خەریکی بوو بۆ سەر لوتکە و ناوچە شاخاوییەکانەوە.

مام «وەسمان» کە یەکێک بوو لەو پیرەپیاوانەی هەرەتی تەمەنی بۆ دەرگەڵە و لە دەرگەڵە سەرف کردبوو، راوچیەکی هێمن و قسەخۆش بوو،

پەیدابوونی ئاسەواری ژیان لەم هەواردا...

گوندی «دەرگەڵە» هەمیشە کوانوێنکی هەڵقوڵاوی خەبات کردن و بنکەیەکی قایمی موقاومەتی گەلەکەمان بووە لە دژی داگیرکەراندا، هەر لەبەرئەوەی خاوەنی شوێنێکی جوگرافی بەنرخ بووە و بۆ خۆحەشاردان و شاردنەوەی شۆڕشگێران، هەمیشە لە شوێنێکی هێجگار سەخت دا جێی خۆی گرتبوو کە بەدرێژایی رۆژگار کەم وابووە دوژمنان دەستیان بەسەردا رۆیشتبێ. بگرە خەڵکەکەی هەمیشە خۆی کاروبار خۆی ڕاپەڕاندووە و دۆخی ژیانی وەک پێویست لەگەڵ دەوروبەر سازاندووە، زۆرجاران گوێم لەوەبووە هەندێ پیرەمێردی گوندی «وەرتێ» بالەیی کە بە دەگمەن گوندی «دەرگەڵە» و «وەرتێ» سەرانەیان داوەتە هەتا باجگرەکانی ئیمپراتۆریەتی عوسمانلی، دوابەدوای ئەمەشەوە لە رۆژانی سەرهەڵدان و هاتنەسەرپێی ئیمارەتی سۆران، خەڵکی ئەو گوندنە پاڵپشتێکی لەبن نەهاتووی هێزەکانی ئەو ئیمارەتە بووینە. زاراوەی ئاخافتنی گوندەکە بە تێکڕا وەک لقەزمانی کرمانجی خواروو بەپێی شارەزایانی زمانی کوردی، پاراوی و پاکی خۆی لەچاو شێوەکانی تری زمانی کوردی بە ڕەسەنی پاراستووە. بەدەگمەن وشەی بێگانە لە ئاخاوتنی خەڵکی ناوچەکەدا دەبیسترا.

لە دێرزەمانەوە خەڵکی ئەم گوندە لەپاڵ خەریک بوون بە هەندێ کاروباری بازرگانی و هێنان و بردنی کەلوپەڵ لە نێوان ئێران و عێراق دا، زۆربەی خەریکی کشتوکاڵ کردن و



ئاژەڵ بەخێوکردن بووینە و داهاتی ژیانیان پێ دابین کردووە. خەڵکەکەی لەگەڵ دەست پێکردنی بەهار و توانەوەی بەفر، بە شان و باڵی چیاکانی دەوروبەری، هەتا دەگاتە بەرەوکۆتایی چوونی پاییز، رووبان لە کوێستانە دڵگیر و سازگارەکانی باوەشی هەندەرێن و کارۆخ کردووە و ڕەز و باغ و باغاتی پڕ میوەی هەمەجۆریان بەخێو کردووە و لەبەرەکەیان خواردووە، زۆربەی خێزانەکانیش لە رۆژانی هاوین ئەو کوێستانانە هەواری ژیان و گوزەرانیان بووە.

لە پاڵ ئەماندا باری خوێندەواری و پێشکەوتنی کۆمەڵایەتی گوندی «دەرگەڵە» لە ناوچەکەدا بێجگە لە ڕەواندز نموونەی نەبووە، چونکە هەر لە زووەوە رۆڵەکانی ئاشقی فێربوون و زیاتر لە دنیا گەیشتن و خۆپێگەیاندن بوونە، هەتا مێژووی کردنەوەی یەکەم قوتابخانەی سەرەتایی لەو گوندەدا بۆ ساڵی ١٩٥٣ دەگەڕێتەوە کە بەدەگمەن گوندی کوردستان ئەوکاتە قوتابخانەی تێدا هەبووە و لەو گوندەشدا کچ و کوڕ هەر لە سەرەتاوە بۆ خوێندن پێکەوە دانراون، بۆیە لەناو رۆڵەکانی ئەم گوندەدا چەند پزیشک و ئەندازیار و مامۆستا و ئاوقات و فەرمانبەری گەورە گەورە بە تێکڕای عێراق بلاوبوونەتەوە.

من یەک بەخۆم ئەوەندەی بە کوردستان و گوندەکانیدا گەڕاوم، زۆر گوندی ناوچەی کوردستان دڵ و دەروونیان ڕاهەژاندووم، بۆ چەندان گوندی وەک «سەرتەک»ی باوەشی چیای بەمۆ و «گورگە»ی شەمێران و «هەشەزین»ی بناری قەرەداغ و «نازەنین»ی خۆشناوەتی و «وەرتێ»ی بالەی کزەم لە جەرگەوە دێت، بەڵام دێمەنی دڵڕفێنی دەرگەڵە و جوامێری و پیاوچاکی و سەخاوەتی دانیشتوانی دەرگەڵەم هەرگیز لەبیر ناچێت. بۆیە جێی خۆیەتی گوندی «دەرگەڵە» و گەڵێ لەو گوندانەی کوردستان دەیان لاپەڕە و نامیلکەیان لەسەر بنووسرێت.

وەک لە پێشەوەش ئیشارەتمان پێداوە، گوندی «دەرگەڵە» لەرووی بەشداری کردنی بەرگری و خەبات کردندا شوێنی دیاریی خۆی هەیە،

مرۆڤ پەروەر نەبین کە لێرە و لەوێ بۆ هاوەدەنگیان لەگەڵ گەلەکەماندا، ویژدانیان بە جۆش هاتووە... چونکە ئەم کارەساتەی بەسەر گەلی کورد هێناوە و دەهێنرێ، ئەگەر بێ دەنگی لە ئاستیدا بەشداری کردنێکی خشکەیی هەردوو جیهانە زاڵەکەی جیهان «سۆسیالیستی و سەرمایەداری» نەبێ، ئەگەر قڕکردنی بە کۆمەڵی هەزارەها کورد لە چەند دەقیقەیەکدا «لە هەڵەبجە و بادینان دا»، لەکەیەکی چڵکنی نێوچەوانی ئەو بەناو داواکارەکانی مافی مرۆڤ نەبێت! دەبێ نیشانەی چی تر بێت؟



لە تەماشاکردنی وێنەی دووەمی زستانی «دەرگەڵە»دا بۆتان دەڵێم:

گەڵۆ لەگەڵ هەموو ئەوەشدا، نامانەوێ هاوکوف لەگەڵ ئەو دەنگانەی ڕەش و سپی پێکەوە ئاگرباران دەکەن، ئێمەش لە خۆمانەوە ئۆبالی سەرەکیی کارەساتە جەرگبڕەکانی گەلەکەمان بەتایبەتی لە کوردستانی عێراقدا بۆ فاکتەری دەرەکی بپێچینەوە، بەڵکو جێگای خۆیەتی بێ سڵەمینەوە، قامک بخەینە سەر ئەو ڕاستییەی کە دەڵێ، نەبوونی ستراتیژییەکی ڕوونی سەربەخۆیانەی جوولانەوەی نیشتمانی دێموکراتیی گەلی کورد، خۆکردنە پارسەنگی کران و سووکی تەرازووی ململانێ و ناکۆکییەکانی نێوان ڕژێمەداگیرکەرەکانی ولاتەکەمان و تێکەڵکردن و تێک هەڵشێلانی ناکۆکییەکان لە شێوەی سیناریۆیەکی چەند بارەوە کراوە، فاکتەری هەرە پێشەوەی ئەم بار و دۆخە بوونە و پێویستە هەموو دەنگێک لە نزیکەوە هەستی پێ بکات و بە خۆماندا بچینەوە...

بەڵێ لە دێمەنی سێیەمی «دەرگەڵە» لە وەرزی بەهارێکی دڵگیری هاتنە گۆڕ قاسپەقاسپی کەوان دڕێژە بە قسەکانمان دەدەین:

ئەوەی ئەمڕۆ بەسەر گەلی کورددا هاتووە لە کوردستانی عێراقدا، لە دنیادا نموونەی نەبینراوە، بەتایبەتی فاشیستەکان لە پەراوێزی ئایدۆلۆژیەتی فاشیانەی خۆیاندا گرەویان لە هەر جۆرە فاشیەت و ڕەگەڕپەرستییەکی سەرتاپای دنیا بردۆتەوە. لە ولاتی ئێمەدا، بەرانبەر گەلێکی بێ تاوان و دەست بەتاڵ، شاڵاوێکی دڕندانەی ئەوتۆ دەست پێکراوە کە بە شێوەیەکی ئاشکرا دەیانەوێ سەرچاوەی زندووی ژیانی گەلەکەمان ببڕنەوە، ئەوە ئاسەواری ژیانیان لە سەرتاپای گوندەکانی کوردستان لە زاخۆوە بگرە تا دەگاتە خانەقین لە ڕەگ و ڕیشە هەڵتەکاندووە، واتە ئەو هێزە جوتیارییەی هەتا ئەم دواییەش هێزی لەبن نەهاتوو و بەشداری کاری سەرەکی خەباتی میللی ڕەوای گەلەکەمان بوون، بۆ شار و دوورخستنەوە لە کشتوکاڵ و نەفی کردنیان بۆ ناوچە عەرەب نشینەکان هەڵتەکاندووە... بەشی هەرە زۆری کوردستان چۆڵ کراوە و ئاوەدانی و ژیانی تێدا یاساغ بوە، سەرچاوەی بژێوی ژیانی زۆربەی ناوچەکان لە دەغڵ و دان و میوە و بەخێوکردنی ئاژەڵ و مەڕ و ماڵات لە بەرهەم هێناندا سڕیوەتەوە...

کورتەباسێک لە ژیانی لە دەرگەڵەدا:

وەک لە وێنەکان دا دەکەوێتە بەرچاوانەوە، گوندەکە دەکەوێتە چەقی چوار ڕێیانی نێوان چیای کارۆخ و چیای هەندرێن و ڕێگای جندیان و دۆڵی شەهیدان، هەر بۆیەش ناوی بە «دەرگەڵە» ڕۆیشتووە کە لە دەمی گەلی هەردوو چیای دەوروبەری ئاوەدان کراوەتەوە. هەر لە کۆنیشەوە ڕێگای بازرگانی نێوان ئێران و عێراق بوە لە ناوچەکەدا... ئەم گوندە یەکێک بووە لە گوندە هەرە گەورە و ئاوەدانەکانی قەزای ڕەواندزی سەر بە شاری هەولێر کە مێژووی دڕووستبوونی وەک زۆربەی هەرەزۆری گوندە قەرەبالغەکانی کوردستان بۆ ئەو ڕۆژانەی مێژوو دەگەڕێتەوە بۆ

وێرانکردنی کوردستان لەکەیەکی تەوێڵی ئەم رۆژگارەی مرۆڤایەتی‌یە! (١)

کاکەباس

پێشکەشە بە سێیەم سالڕۆژی خاپوورکردنی گوندە نازدارەکەی باوەشی هەندەرێنی مەڵبەندی قارەمانێتی و کارۆخی سەرکەش، گوندی «دەرگەڵە»ی هەرگیز لەبیرنەچوو.

ئەگەرچی مێژوونووس و سیاسەت مەدارانی جیهان بە شێوەی جیاجیا بیردەکەنەوە، زۆرجاران گۆی‌ی قاشۆیان لەسەر ئەو ئەنجامە چەقی پێ بەستراوە کە ئەم سەدەیە، واتە سەدەی بیستەم، سەدەی رزگاری‌ی گەلان و یەکگرتنەوەی چوارچێوەی نەتەوایەتی زۆربەی ئەو میللەتانە بووە کە رۆژگارێکی درێژ لە ژێر باری پارچەپارچەی نیشتمان و پەتار پەتار بوونی نەتەوەیی چەوسێنراونەتەوە. بێگومان رۆڵەکانی گەلی کوردی تام نەکردووی ئازادی، نەدیدەی سێبەری دیموکراتی، سەرباری ئەو هەموو دەرد و مەینەتی و چەوساندنەوەیەی تێیدا دەژین، هاوەڕەنگ لەگەڵ هەست و نەستی مرۆڤایەتی، بەم هەنگاوە گەورەیەی مرۆڤایەتی شاگەشکە بوە، تا ئەو مەودایەی چەوساندنەوەی نەتەوایەتی، پێشێل کردنی مافی مرۆڤ، داگیرکردنی خاک و کۆنترۆڵکردنی سەربەخۆیی گەلان لەژۆر شوێنی دنیا خاشەبڕ کراوە. ... بەڵام ئەوە ئەم سەدەیە هەر دە سالێکی هەناسە پێ ماوە و تەواو دەبێ، مرۆڤایەتی پێ دەنێتە سەدەی بیست و یەکەم، دەبێ هەمان ئەو سیاسی و میژوو نووسانە لە بەرانبەر نەتەوەیەکی زیاتر لە بیست ملیۆن دابەشکراوی وەک گەلی کورد چۆن دەم هەڵپچڕن کە لەبەر چاوی زەقی مرۆڤایەتی، بە ژێر ئاسمانی پان و بەرینی ئەم جیهانە بێ وێژدانە، خەڵتانی خوێن دەکرێ، بە دڕندەترین چەکی قڕکەر وەڵامی داوای رەوای بە ئازادی ژیان دەدرێتەوە... دەبێ ئەم هەست و نەستەی مرۆڤایەتی کەی بلەقێ!!



ئەم وێنە خنجیلانەیەی گوندی «دەرگەڵە» سەیرکەن و بۆتان دەبێژم: ئەوەتە فاشیستەکانی عێراق بە رۆژی رووناک، بەبێ سڵ کردنەوە لە هەر جۆرە نەریت و سوخەتێکی مرۆڤایەتی، سامناک ترین جۆرە چەکی کیمیایی بەسەر گەلی کورد لە کوردستانی عێراق دەبارێنن، وەک ئەوەی چەند ملیۆنە کوردێک لەم پارچەیەی کوردستاندا، کێڵگەی تاقیکردەنەوەی ئاکاری کاریگەری ئەم چەکە بن! کەچی بەرهەڵستێکی رێگر چ وەک سازمانی نەتەوەیەکگرتووەکان، یاخود ئەو زلهێزانەی دنیا بۆ بەرژەوەندی تایبەتیان بە ئاو و ئاگر دەبەخشنەوە، جوولەیەکی مرۆڤانەیان وەک پێویست لێ بەدی نەکرا!

بەڵام وەنەبێ لێرەدا دەست بەرداری بەرزکردنەوەی دەنگی نارەزایی ئەم دام و دەزگایە تاک و تەرا دەیان مرۆڤی

گولبژێرێک له‌ په‌ خشانه‌ کانی کارۆ (*)

گوزینی : ج.ماله‌

مه‌رگی شه‌پۆله‌کان !..
له‌ژه‌ریام برسی : ئه‌م شه‌پۆله‌شێتانه‌ی تۆ ،له‌
که‌ناره‌کان چیبان ئه‌وێ ؟ بۆ ئاو ها په‌رێشان و
ده‌ربه‌ده‌ر سه‌ر ده‌کێشن به‌و که‌نارانه‌دا ،که‌له‌هه‌موو شت
بێ ئاگان ؟
ژه‌ریا ،له‌ئاستی پرسیاره‌که‌م گریا ! شه‌پۆله‌کانیش گریان
...
ئه‌وکاتی ژه‌ریا گوتی : نێچیری مه‌رگ ته‌نیا مرۆڤ
نییه ،شه‌پۆله‌کانیش وه‌کو مرۆڤ ئه‌مرن! ئه‌وه‌ش شه‌پۆله
زندووه‌کانن که‌ته‌رمی شه‌پۆله مردووه‌کان، به‌شیوه‌نه‌وه
به‌گۆرستانی خامۆشی که‌نار ئه‌سپێرن !

۲

عیشقی درۆ !
چوو بووینه‌ سووچێکی دوور که‌ کەس چاوی لێمان نه‌بێ،
سه‌عاتی: به‌سه‌ر گه‌ردانی عیشقێکی بیص دالده، له‌ژێر تریفه‌ی
مانگه‌شه‌و پیاسه‌ بکه‌ین. ئاسمان ساماڵ بوو. که‌چی له‌گه‌ڵ
ئه‌وه‌شدا پەله‌ هه‌ورێکی ره‌ش ،رووی گه‌شی مانگی له‌ رهشایی
خۆیدا داپۆشی بوو. گوتم: ئاسمان سایه‌قه‌ی ساماله، نازانم ئه‌م
پەله‌هه‌وره‌ ره‌شه‌ چیبه‌ به‌رۆکی گرتووین ؟!
ده‌ستی بۆ هه‌وره‌که‌ دریژ کرد و ئاهێکی هه‌لکێشا و گوتی :
ئه‌وه‌ ؟ ئه‌وه‌ هه‌ورنیه! چۆراوگه‌ی ناله‌ی شاراوه‌ی عاشقانی
راسته‌قینه‌یه.... به‌ری مانگی گرتووه، تا کو مانگ عیشقی
درۆی من و تۆ نه‌بینێت ...
(*) دوو پارچه‌ په‌ خشانی کارۆ ،له‌ به‌رهانگی٦٢
دا ،بڵاوکراوه‌ته‌وه .

لێره‌ش، له‌وێم

مارف عومه‌ر گوڵ

ئیواره‌یه‌ک بوو بای سارد هه‌ڵیکرد
شه‌پۆلی هاری ده‌ریای شێت و شوور، جار له‌گه‌ڵ جارا
به‌ شاڵاو سه‌ر و شان و ملی خۆی ده‌دا به‌ سینگی نه‌رمی
که‌نارا
کچانیش پۆل پۆل ده‌گه‌رانه‌وه
که‌ناریش به‌بێ تریقه‌ی کچان شانی لێ دادا
هه‌ر قیژه‌ی (چایکا) و هاژه‌ی شه‌پۆل و وژه‌ وژی با
سه‌ریان کردبوه‌ کووره‌ی بیرمه‌وه
نه‌ له‌سه‌ر ده‌ریا ده‌شتی دڵه‌کەم تینوێتی ده‌شکێ
نه‌ له‌سه‌ر سینه‌ی کچۆڵه‌یه‌ک دا گریانم ده‌نوێ!
ده‌ریا شێته‌که‌،
ئۆقره‌م لێ بڕا، له‌ شه‌پۆلێکتا بمپێچه‌ره‌وه
هه‌ر ئاواره‌که‌ی دوای تروسکه‌که‌م
ویستم بچمه‌وه‌ گونده‌که‌ی جاران
تووله‌ ڕێ یه‌کم نه‌دۆزیه‌وه!
له‌م دنیایه‌دا ولاتێک نیه‌ ئه‌وه‌نده‌ی دڵم وێران کرابێ
مه‌گه‌ر کوردستان
له‌م دونیایه‌دا هیچ دڵێک نیه‌ ئه‌وه‌نده‌ی دڵم ته‌لبه‌ند
درابێ
دیسان کوردستان

ته‌مۆزی ۱۹۸۹
ئۆکرانیا- ئاڵۆشته‌
سه‌ر ده‌ریای ره‌ش
چایکا: باڵنده‌یه‌کی ده‌ریاییه، به‌ عه‌ره‌بی پێی ده‌ڵێن:
نه‌وره‌س

www.arsivakurdi.org

یارمەتیدان، بەڵام ئەوە یەکەم و دواسەردان بوو چونکە تورکیا ویستی هەموو شتێک هەر بەدەست خۆی بێت.
نوێنەری خاچی سووری سوید (ستین فیربو) لە مانگی دەی ١٩٨٨دا نیزیکەی یەک حەفتە لە شاری ئەنقەرە بەتەمای چاوپێکەوتنێک بوو لەگەڵ کاربەدەستانی مانگی سووری تورکی بەمەبەستی ناردنی یارمەتی لە سوێدەوە بۆ پەناهەندەکان، بەڵام لە کۆتاییدا گەڕایەوە بەبێ ئەوەی بتوانێ شتێک بکا.
دائیرەی (کۆمیسیۆنی بەرزی نەتەوەیەکگرتووەکان بۆ پەناهەندە) (UNHCL) لە ئەنقەرە گەلێک جار هەوڵیدا بۆ ئەوەی بەشداری بکا لە سەرپەرشتی و یارمەتیدانی پەناهەندەکان، بەڵام تورکیا لە دەوری چاودێر (مراقب) زیاتر ڕێگەی پێ نەدا.
ڕۆژی ١٩٨٨/١٢/١٣ توانیمان بە هاوکاریی باڵیۆزی سوید لە ئەنقەرە کۆبوونەوەیەک بکەین لەگەڵ سەرۆکی مانگی سووری تورکی (کەمال دەمیر) بۆ مەبەستی کردنەوەی دەرگایەک بۆ ناردنی یارمەتی لە سوێدەوە بۆ پەنابەران، ئەندامێکی پەرلەمانی تورکی - یەکێک لەو کوردە دڵسۆزانەی تورکیا کە بە هەموو شێوەیەک هەوڵ ئەدەن یارمەتی پەنابەران بدەن - بە سیفەتی کۆنەبرادەریی سەرۆکی ناوبراو لەگەڵ من هاتو لە کۆبوونەوەکەدا ئامادە بوو، دوای گفتوگۆیەکی درێژ توانیمان سەرۆکی ناوبراو ڕازی بکەین چادر و خواردەمەنی منداڵ لە سوێدەوە وەربگرێت بۆ پەنابەران. بەڵام دوو ڕۆژ دوای ئەوە بەرپرسیاری کاروباری دەرەوەی مانگی سوور بە تەلەفون منی ئاگادار کرد کە پەیمانی سەرۆک ئیتر کەڵکی نییە چونکە سکرتێری گشتی ئاگادار کراوە کە کەلوپەل بۆ پەنابەران بەهیچ شێوەیەک قەبوڵ ناکرێت جگە لە پارە نەبێت!!
(٣) تورکیا تاکو ئێستاش مافی پەناهەندە بەپێی یاسای نێونەتەوەیی بەم پەنابەرانە نەداوە، تەنها ناوی (میوانی کاتی) لەسەریان داناوە و هیچ لایەنێک بۆی نییە لەسەر بارودۆخی پەناهەندەکان بدوێت.
بەپێی پەیامی جنێف- ١٩٥٢ تورکیا تەنها لە دەوڵەتە ئەورووپاییەکان دەبێ پەناهەندە وەربگرێت، لەبەرئەوە هیچ بە پێویستی نابینێ ئەم کوردە عێراقییانە بە پەناهەندە وەربگرێت. (UNHCL)یش لە لایەکی ترەوە ناتوانێ سەرپەرشتیی ئەم پەنابەرانە بکات تاکو تورکیا مافی پەنابەریان پێ نەدات. گفتوگۆی نێوان (UNHCL) و تورکیا جاربەجار دەپچڕێ و جارجاریش دەست پێدەکاتەوە لەسەر ئەو باسە، بەڵام هەتا ئێستاش شتێکی کۆنکرێت ڕووی نەداوە کە پیشانی بدات وەزعی پەنابەران بەرەو چاکی دەڕوات، بە پێچەوانەوە پەنابەران زیاتر بێزارتر و پەرێشانتر دەبن.
(٤) پەنابەران لە سەرەتاوە هەموو هاوکارییەک و یارمەتییەک لە بڕاکوردەکانیانەوە لە تورکیا وەردەگرت، کاتێ کە نزیکی سنوور بوون، بەڵام دوای بڕیارەکەی تورکیا کە هەموو پەنابەران کەوتنە ژێر دەستی تورک و هەموو جۆرە پەیوەندیەک لە نێوان پەنابەران و کوردی تورکیا قەدەغە کرا. ئەم کارە نە بەدڵی پەنابەران بوو و نە بەدڵی کوردانی تورکیا بوو. چونکە کوردی تورکیا حەزیان دەکرد خزیان یارمەتیی براکوردەکانی عێراقیان بدەن و گەلێک لەم پەنابەرانە خزم و کەسوکاری خۆی لەناو تورکیا هەبوو. ئەمە لەگەڵ ئەو ڕەفتارە نارێکەی کاربەدەستانی تورکیا کە بەکاریان هێنا بەرانبەر بە پەناهەندەکان بوو بە هۆی چەند ڕووداوێکی ناڕەزایی و خۆپیشاندانەکەی ڕۆژی ٣/ئەیلوولی ١٩٨٨، لە ناوچەی چلکی و خۆپیشاندانەکەی مانگی دەی ١٩٨٨ لە (یوکسیکوڤا) و خۆپیشاندانی مانگی ٢ی ١٩٩٠ی شاری دیاربەکر.
(٥) هەر لە سەرەتاوە خواردەمەنی و یارمەتی پەنابەران یەکجار لاواز و نامرۆڤانە بوو، چەند و چۆنییەکی ئازووقە وەکوو ئەوەبوو بە (حەبسییەکان) دەدرا، گەلێک لە مادە گرنگەکانی وەکو (سەوزەی، میوە، گۆشت، شیر و بەرهەمەکانی) یەکجار کەم بوو. ئاو و ئاودەستخانە و مەرجەکانی تری خۆپاراستن بەکەڵک نەدەهاتن. هەر لەبەر ئەوەش ژمارەی نەخۆشی و مردن لەسەرەتاوە هەر لە زیادبووندا بوو. بۆ نمونە:
- لە ڕۆژی هاتنە ناوەوە بۆ تورکیا ٩٨٨/٨/٢٨ - ٩٨٨/٩/٥ (٢٥) منداڵ لە ناوچەی (کاندڵ و سابیری) مردن.
- ڕۆژی ١١ی ئەیلوولی ٩٨٨ تەنها لەیەک ڕۆژدا ١٧ منداڵ لە یوکسیکوڤا مردن.
- لە یوکسیکوڤا نزیکەی ٣٠ پەناهەندە مردن لە ماوەی دوو هەفتەدا لە کۆتایی مانگی دەی ١٩٨٨دا.

ماویەتی

بەکارهێنانی عێراق بۆ چەکی کیمیایی دژی کوردەکان ئەوەندە زۆر بوو کە گومانی تێدا نەبوو، بۆ نمونە:

- باڵیۆز (سەفیر)ی تورکیا لە ئێران (فولکان فوران) رۆژی ١٠/ئەیلوڵ/١٩٨٨ لە کۆنفرانسێکی رۆژنامەگەریدا لە تەهران رایگەیاند کە دەیان زامداری چەکی کیمیایی لەناو خەستەخانەکانی تورکیا تیمار دەکرێن.

- پزیشکێکی سەربازی تورکی لەناو کەمپێکی پەنابەران لە (چکورکە) لەسەر سنووری تورکیا ئاشکرای کرد و پەیامنێری رۆژنامەی ئینگلیزی (فاینشیال تایمز) رایگەیاند کە نێزیکەی ٣٠٠ کەس لە پەنابەران بە برینەکانی چەکی کیمیایی مردن.

- ئیزگەی لەندەن لە رۆژی ١٩٨٨.٩.٥ رایگەیاند کە شاری (ئولودرە) لە تورکیا بە چەکی کیمیایی بۆمباران کراوە هەروەها هەمان رۆژ دیاری کرد کە پەیامنێری رۆژنامەی ئینگلیزی (ساندای تلگراف) بە چاوی خۆی نێزیکەی ٥٠ منداڵی بینی لەناوپەنابەران کە برینەکانیان لە برینی چەکی کیمیایی دەچوون.

- رۆژنامەی (ساندای تایمز) رایگەیاند : «رۆژی ٩٨٨/٩/٤ فرۆکەکانی عێراق بەردەوام بوو لەسەر بۆمبارانکردنی پەنابەران بە چەکی کیمیایی بە درێژایی سنوور، وەزیرێکی تورکی لەناو یەکێک لە کامپەکانی پەنابەران نێزیک شاری سوکوستا بەراکردن خۆی شاردەوە کاتێ کە بۆمباکانی عێراق نێزیک بە کامپەکە کەوتن و تەقینەوە».

- ئەندامی کۆمیسیۆنی کاروباری دەرەوەی سەناتۆری ئەمریکی (پیتەر گالبریت) دوای سەردانەکەی بۆ تورکیا لە ئەیلوولی ١٩٨٨دا راپۆرتێکی دەرکرد لەسەر باری پەنابەران و ئاشکرای کرد کە بەڵگەی زۆری بەدەستەوەیە کە عێراق لە مانگی ٨ی ١٩٨٨دا چەکی کیمیایی دژی کوردەکان بەکارهێناوە.

- چەند رۆژێک بەرلەوەی بگەمە جیهاندا دەوری خۆیان ببینن و یارمەتیی راستەوخۆی پەناهەندەکان بدەن. لە هەمان کاتدا تورکیا داوای لە دەوڵەتان و دەستگاکانی نێونەتەوەیی کرد کە یارمەتیی تورکیا بدەن بەڵام بەمەرجێک ئەو یارمەتییە تەنیا بە شێوەی پارە بێ! و دەبێ



شاری دیاربەکر لە رۆژی ١٩٨٨/١١/٢٤دا پیاوێک مرد لە خەستەخانەی زانکۆی دیاربەکر، چەند رۆژێک دوای ئەوەی نەخۆشەکە لەلایەن خزم و برادەرانی خۆی تەسلیم بە خەستەخانە کرابوو، نەخۆشییەکەی پەککەوتنی سیپەکانی بوو کە ئەویش ئەنجامی چەکی کیمیایی بوو.

ئەمانە هەموو بەڵگەن و هێشت حکومەتی تورکیا نەک هەر ئینکاری لە بەکارهێنانی چەکی کیمیایی دەکات بەڵکو رێگاش نادات بە رێکخراوی تایبەتی (نەتەوەیەکگرتووەکان) بۆ ئەوەی سەر لە تورکیا بدەن بۆ مەبەستی لێکۆڵینەوە لەم رووداوە.

(٢) تورکیا نەیهێشت دەستگا و رێکخراوەکانی پەناهەندە و مافی مرۆڤ لە بدرێت بە (خەزێنە)ی (مانگی سوور)ی تورکیا، یانی حکومەتی تورکیا.

ئەمریکا و دەوڵەتەکانی ئەندام لە (بازاڕی هاوبەشی ئەورووپایی) پەیمانیان بە تورکیا دا کە ٦٠٠٠٠٠ دۆلار بدەن بۆ یارمەتیی پەنابەران، بەڵام دیارە تورکیا نایەوێت ئاشکرای بکات چۆن ئەم پارەیە بەکاربێنن و رێگایان پێ نادات کە خۆیان بەشدار بن لە دابەشکردنی یارمەتییەکەدا بۆ پەنابەران، لەبەرئەوە هەموویان یارمەتی و پەیامنەکانی خۆیان وەستاند.

نوێنەری (خاچی سوور)ی نێونەتەوەیی (فرانس ئامار) رۆژی ١٨/ئەیلوولی ١٩٨٨ گەیشتە ناو پەنابەران لە تورکیا بۆ ئەوەی رێگابکاتەوە بۆ بەشداربوونی خاچی سوور لە

www.arsivakurdi.org

عەسکەرییان بردەسەریان، سەرەڕای ئەوە ئەم کوردانە خەڵکی دەوڵەتێکی ترن و بەپێی یاسای نێونەتەوەیی لەخاکی دەوڵەتێکی تر بوون لە کاتی هێرشەکەدا. لەلایەکی تریش ئەگەر تورکیا سنوورەکەی خۆی بکاتەوە و ئەم کوردانە وەربگرێت دەتوانێ وەک دەوڵەتێکی مرۆڤدۆست و دیموکراسی خۆی پیشانی دەوڵەتە ئەورووپییەکان و ئەمریکا بدات، بۆ ئەوەی بتوانێ رووی خۆی سپی بکات و لە گوناهەکانی دژی مافی مرۆڤ بشواتەوە، ئەو گوناهانەی باری دیبلۆماسی و سیاسیی حکومەتی تورکیایان یەکجار گران کردوە و بوونەتە هۆی وەرنەگرتنی ئەو دەوڵەتە لەنێو بازاری هاوبەشیی ئەورووپادا.

لەو تەنگاوی و سەرلێشێوانەدا بەرپرسیار و کاربەدەستانی تورکیا لەسەر مستەوایەکی بەرز کۆبوونەوە بەدوای کۆبوونەوەیان بەست و حکومەت لەگەڵ پەرلەمان و سەرکردایەتیی لەشکر و مخابەرات (میت) لەماوەی چەند رۆژدا کەوتنە جموجوڵ و گفتوگۆیەکی توند و تیژ. لەئەنجامدا بڕیاریان دا کە سنوورەکە بکرێتەوە و رۆژی ۹۸۸/۸/۲۸ فەرمان بە هەموو قەرەقوڵ و دەستگاکانی پاراستنی سنوور گەیشت کە دەرگا لە پەنابەران بکەنەوە و وەریان بگرن. لەلایەکەوە ئەو بڕیارە بوو بەهۆی هەناسەدان و دڵخۆشی پەنابەران و لەگەڵ ئەوەشدا پێخۆشحاڵی نەک تەنیا بۆ هەمو کوردێک بوو بەڵکو بۆ هەموو مرۆڤێکی خاوەن ویژدان لە هەموو لایەکی جیهاندا. پەنابەران ڕێزیان لەم هەڵوێستە مرۆڤایەتییەی تورکیا گرت و سوپاسیان دەربڕی. بەڵام لە لایەکی ترەوە هەرکەسێک شارەزای هەڵوێست و ڕەفتاری تورکیا بێت بەرامبەر بە مەسەلەی کورد، هەر لە رۆژی دامەزراندنی کۆماری تورکیاوە تاکو ئێستاش، سەری سوور دەمێنێ بەم بڕیارە تازەیە و ناتوانێ بە ئاسانی بڕیارەکە بێ مەترسی و گۆشەگیری وەربگرێت. چونکە ئەگەر راستە حکومەتی تورکیا دڵی بە کورد دەسوتێ، دەبێ تۆزێ دەستیش لە زۆرداری و چەوساندنەوەی کوردی ناوخۆی هەڵبگرێ. لەبەرئەمەش هەر لە سەرەتاوە مەترسیی هەبوو، تورکیا لە راستیدا ئەم بڕیارەی دا لەبەر هەندێک بەرژەوەندی تایبەتیی خۆی نەک لەبەر خاتری چاوی ڕەشی پەنابەرانی کوردی عێراق!!!

ڕەفتاری تورکیا پاش بڕیارەکە:

ئەو دڵخۆشی و هەست بە ئازادیەی پەنابەران پیشانیان دا پاش رزگاربوونیان لە چەکی کیمیایی و هاتنە ژوورەوەیان بۆ تورکیا زۆری نەخایاند. هەر لە سەرەتاوە ڕەفتاری کاربەدەستانی تورکیا وا دیاریی کرد بۆ پەنابەران کە تەنها رزگاربوون لە چەکی کیمیایی ئەوە ناگەیەنێ کە زۆرداری و ژێردەستی کۆتایی هاتبێ، رۆژ بەرۆژ زیاتر دەرکەوت کە پەنابەران (لەبەر با ڕایان کردووە و کەوتوونەتە بەر باروقە)، هەر بۆ نموومە تورکیا بەم ڕەفتارانەی خوارەوەی راستییەکەی خۆی بەتەواوی داشکرا کرد:

(۱) حکومەتی تورکیا ئینکاریی کرد کە عێراق چەکی کیمیایی دژی پەنابەران بەکارهێناوە، و لەگەڵ ئەمە هەموو بەڵگەیەکی لەم بابەتەی شاردەوە و خۆی مات کرد هەتا لەسەر ئەو بزمبانەی کە هەندێکی کەوتبوونەوە ناو خاکی تورکیا.

ئەو زامدارانەی بە چەکی کیمیایی زامدار ببوون بە بریندارێ چەکی کلاسیکی ناوبران و هەموو گوت و سەرهاتی پەنابەران دەربارەی چەکی کیمیایی بە درۆ لەقەڵەم درا، سەرەڕای ئەوەی بەڵگە لەسەر



www.arsivakurd.org

پەنابەرانی کوردی عێراقی لە تورکیا
لە مردنێکی لەسەرخۆدا دەژین:

د. عەبدولباقی ئەحمەد

بەشی دووەم:



پەنابەران و بڕیاری تورکیا:

لە نیوان ٢٥-٢٨ی مانگی هەشتی ٩٨٨، نزیکەی .....١کەس، زۆربەی زۆری ژن و منالْ و پیر، لەسەر سنووری نێوان عێراق و تورکیا کۆبوونەوە و فڕۆکەکانی لەشکری عێراقی بەردەوام بە گازی ژەهراوی بۆردومانیان دەکرد و بەدوایانەوە بوون هەتا سەر سنوور و ئەودیوی سنووریش. کارەساتەکە لە هەموو جیهان دەنگی دایەوە، هەر وەک لە ژمارەی رابوردوودا باسمان کرد، پەیامنێر و هەواڵدەرانی ئاژانسەکانی دەنگ و باسی جیهانی وێنە و هەواڵی ئەم تراژیدیایەیان لە تەلەفزیۆن و ئێزگە و رۆژنامەی جیاوازدا، لە زۆر پارچەی جیهاندا بڵاوکردەوە.

لەو کاتەدا گەلێک دەنگ بەرز بووەوە، نەک تەنیا لە پەنابەران و خەڵکی کورد، بەڵکو لە گەلێک لایانی گەلانی تر لە جیهاندا، و پەنایان بردە لای حکومەتی تورکیا و داوایان لێکرد کە هەڵوێستێکی مرۆڤانە پیشانبدات و سنوورەکەی بکاتەوە بەرانبەر ئەو خەڵکە لێقەوماوە، بۆ ئەوەی رزگاریان بێت لە چەکی کیمیایی.

دیارە ئەم بارە تازەیە بوو بە سەرئێشەیەکی سیاسیی گران بۆ حکومەتی تورکیا، تا ئەو رادەیە کە ئەو نەیتوانی زووبەزوو هەڵوێست دەربڕێ و بڕیار بدات چ ڕەفتارێکی هەبێت لەگەڵ ئەم میوانە چاوەڕێنەکراوانە. لەلایەکەوە ئەو خەڵکە لەسەر سنوور کۆبوونەتەوە و دوای یارمەتی دەکەن، هەر ئەو کوردەن کە تا دوێنێ هەمان حکومەت بە قاچاخچی و تیرۆریستیان لەقەڵەم دەدان و کاتی خۆی لە سالانی ١٩٨٣ و ١٩٨٤دا بە هاوکاری لەگەڵ ڕژێمی عێراقی و بە دووقۆڵی هێرشی

www.arsiwakurdi.org

«لە کۆتاییدا گرێ داوەتەوە بە ئامانجێک، بە فیکرێک...، گرێداوەتەوە بە زیندانبوونی باوکی «سمایل ئاغای سمکۆی شکاک»، کە لەگەڵ «عەبدولرەزاق بەدرخان» پێکەوە لە ساڵی ١٩٠٦، بە تاوانی کوشتنی «رضوان پاشا»ی سەرۆک مەجلیسی تورکیا لە ئەستەمبووڵ نەفی کرابوونە سەرووی ئەفریقیا! ئیتر مادام باوکی سمایل ئاغای سمکۆ، ناتوانێ باڵ بگرێ و لە زیندانەوە بفڕێ، کەوابوو فریشتەش باڵی نییە. ئەمە باوکەکە، حەمدی ئازاد، ئەم ئەفسانە و چیرۆکانە بۆ دوو کوڕەکەی دەگێڕێتەوە.

ئەم رۆمانە گەنجینەیەکە، بەشێکی تا بڵێی فراوانی ژیان و مێژووی وڵاتەکەمان و خەم وخەونە رەنگاوڕەنگەکانی میللەتەکەمانی لەخۆ گرتووە. خوێنەری کورد لەوە دەچێ تەنیا لە حاڵەتێکدا ئەگەر ئەو رۆمانە بە زمانی کوردی بخوێنێتەوە؛ بتوانێ چێژی زیاتر لەو جیهانە هونەرییە بەرزە و لەو زمانە شیعرییە بێ هاوتایەی سەلیم بەرەکات وەربگرێ...

پاریس
شوبات/ ١٩٩٠



نامەیەک دەربارەی کۆنگرەی دەیەمی فیدراسیۆن:

بەڕێز بەرپرسی گۆڤاری بەربانگ

پاش سڵاوێکی گەرم و کوردانە: داوای سەرکەوتنتان بۆ دەکەم

بەر لە هەمو شتێک بە پێویستی دەزانم سوپاس و ماڵئاوایی بۆ پێکهێنەرانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان و گشت ئەو کەسانە کە بۆ کورد و کوردستان کاریان کردووە و تێکۆشاون، لێ بکەم.

لەسەر ئەو باوەڕەم هەوڵ و تێکۆشان لە فیدراسیۆندا دەرەتان و هەلێکی زۆر باشە کە بۆ گەلی کورد هەڵکەوتووە. هەرچەندە بیروباوەڕ و بۆچوونێک کە هەمانە بەومەرجە وڵاتپارێز و گەبی بین، بۆمان هەیە لە دەوری فیدراسیۆن کۆببینەوە و لە ژێر تیشکی بەرنامە و پێڕەوی ئەم کۆمەڵە ئینسانییەدا خەباتی رەوای خۆمان درێژە پێبدەین و بۆ ئامانجەکانی کورد کار بکەین. بە مەبەستی خزمەت بە نەتەوەکەمان و ناساندنی مەسەلەی کوردبە خەڵکی وڵاتانی ئەوروپا و راکێشانی بیروڕای نێونەتەوەیی لەمەڕ ناساندنی داخوازە رەواکانی نەتەوەی کورد، هەوڵێکی بێوچان بدەین. واباشە هانیان بدەین بە مەبەستی پشتیوانی لە مافی ئینسانی و رەوامان. هەتا ئەو جێگایەی بۆمان دەگونجێ و لە هێز و تواناماندایە دنیای بەرەوپێشچوو و دەسەڵاتدار سەبارەت بە گیروگرفت و ژێردەستیی نەتەوەی کورد ئاگادار بکەین و تێیان بگەیەنین کە خەباتی شۆڕشگێڕانەی نەتەوەکەمان پێویستی بە پشتیوانی هەراوی ئەوان هەیە.

لە کوردستان تەوژم و خەفەتان، زوڵم و زۆر بێداد دەکا. ئاسەوارێک بە حەسانەوە و هێمنی و ئاشتی بەهۆی پیلانە جۆراوجۆرەکانی نەیارانەی کورد نابیندرێ و لە کوردستانی داگیرکراودا ئاسەوارێک لە ئازادی و دیموکراسی وەبەرچاو نایە. کوشتن و بڕینو ئاخنینی بەندینخانەکان لە شۆڕشگێڕانی کورد درێژەی هەیە. سیاسەتی قەڵاچۆکردنی خەڵکی کوردستان بە توندی بەردەوامە و تەنانەت دوژمن بەوەش تامەزرۆی ناشکێ و سیاسەتی خاپورکردنی کوردستان و ژینۆسیتی لە دژی نەتەوەی کورد بەڕێوە دەبا... کەوابوو لە هەلومەرجێکی ئاوا حەستەم و ناسکدا هەلێکی ئەوتۆ بۆ ئێمەی کوردەکانی دوورکەوتوو لە کوردستان و نیشتەجێی وڵاتی سوێد هەڵکەوتووە جێگای خۆیەتی قەدری بزانین و بە باشی کەڵکی لێ وەربگرین. دەسکەوتێکی باشە بۆ ئەوەی قەرهەنگی نەتەوەی کورد بە خەڵکی سوێد بناسێنین و تەمرینی دیموکراتیەت بکەین و لەنێوماندا ببێتە باو و خو و خەدەی جۆراوجۆر و تەحەمول بکەین و لەگەڵ یەک بحەوێینەوە و رێز بۆ بیروباوەڕی یەکتر دانێین و زیاتر فێری کاری بە کۆمەڵ ببین.

کۆنگرەی دەهەمی فیدراسیۆن سەرەڕای هێندێک کەمایەسی لەسەریەک کۆنگرەیەکی کورد و سەرکەوتوو بوو. لێرەدا یەکێک لە کەموکوڕییەکانی کۆنگرەی دەیەم دەستنیشاندەکەم:

ژمارەی ژنانی بەشدار لە کۆنگرەکەدا زۆر کەم بوو ئەمە دەری دەخا بە پێچەوانەی خەباتی توند و دژواری کوردستان کە لەوێدا خوشکەکان و ژنانی شۆڕشگێڕ و لەخۆبوردوو دەورێکی باش و بەرچاویان هەیە. چالاکانە شان بەشانی برا پێشمەرگەکانیان خەباتی سیاسی و چەکدارانە دەکەن. بە داخەوە لێرە ژنان کەمتر هەڵسووڕی سیاسین.

بێگومان رۆژێک لە رۆژان دەبێ نەتەوەی کورد زیاتر شایی بە خۆی و خەباتە رەواکەی هەبێ کە وێرای پیاوەکان ژنانی کوردیش خەبات بکەن. بۆ ئەوەی ژنی کورد بە پلە و پێگەی بەرانبەر و یەکسان لەگەڵ پیاو بکا پێویستە رێگایەکی دوور و درێژ و سەخت ببڕن... بەم هیوایە کە خوشکەکانی نیشتەجێ لە سوێد لەسەر مافی خۆیان و نەتەوەکەیان بە کردەوە سور بن و لە داهاتوودا چالاکتر و زیاتر لە کاروباری سیاسی و کۆمەڵایەتیدا بەشدار بین.

بەڕێزەوە: کامەران
١٩٩٠/٢/٢٤

www.arsivakurdi.org

سالە لە ژێر چنگی رژێمە داگیرکەرە بێگانەکاندا دەنالێنێ و چاوەڕێی «بابایەک» دەکا و هەر دەرناکەوێ!

بیری «چاوەڕوانی کردن»: دیاردەیەکە هەر لە یەکەمین لاپەڕەکانی رۆمانەکەوە تاکو دوایین لاپەڕەکانی، بەتەواوی بالی بەسەر ژیان و کەسایەتیی «مەم» و «دینۆ» و «حەمدی ئازاد»دا راکێشاوە. «مەم» لە دورگەکەدا چاوەڕوانی باباکە «الرجل الکبیر» دەکا، هەر بۆی دەگەڕێ و سۆراخی دەکا و چاوەڕێی دەکا: بێهوودەیە... تەنانەت رۆمانەکە بۆ خۆیشی، چاوەڕێی دەکا.

ئەم دیاردەی چاوەڕێ کردنە، کە لەوانەیە چاوەڕێ کردنی گۆدۆی صمۆئیل بیکیت و شانۆنامەکانی بێهوودەییمان بیربخاتەوە، لەلای سەلیم بەرەکات، خاوەن دووری و ئاسۆیەکی گەشبینانە و مرۆڤانەیە لە هیوا و بڕوایەکی ناسیۆنالیستانەی قوڵەوە هەڵقوڵاوە. چاوەڕێ کردن لەم رۆمانەدا ئاواتێکە!

ئەوەی لە هەموو شتێک زیاتر کە لە رووی هونەرییەوە لەم رۆمانەدا جێگای سەرنج و وردبوونەوەیە: بنیاتی هونەری و تەکنیکی هونەریی چیرۆکەکەیە.

رووداوەکان لەم رۆمانەدا «تەنیا لە بەشی یەکەم و دووەم و سێیەمی فەسڵی دووەمدا نەبێ» بەپێی کرۆنۆلۆجیایەکی یەک لە دوای یەکتر دەرناکەون. ئێستا-- رابردوو/ رابردوو-- ئێستا. بە کورتی: «کات» بە هەموو شەپۆل دادان و کێشمەکێشم و گرێ و گۆڵیەکانی خۆیەوە، تەنیا لە تونی دەروونی پاڵەوانەکانەوە، یا راستتر بڵێین تەنیا لەسەر زمانی حیکایەتخوانەوە هەڵدەقوڵێ. لێرەوە سیستەمێکی هونەریی سەربەخۆ، مەنطقێکی جیاواز بۆ «کات» دروست بووە.

لەوانەیە بیروڕای وا هەبێ بڵێ کە ئەم یاریکردنە بە کات، ئەم هێنان و بردن و بە پەلوپۆکردنەی کت لەلایەن رۆمانووسەوە: لاسایی کردنەوەیەکی تەکنیکی رۆمانووسە ئەوروپییەکانە و سەر لە خوێنەر دەشێوێنێ. بەڵام بە رای ئێمە ئەم دیاردەیە: دیاردەیەکی رەسەنە، چونکە پەیوەندیی بە فراوانی و سروشتی روانینی رۆمانووس خۆیەوە هەیە. رۆمانووس، بە روانینێکی فراوانی یەکپارچەیی تەماشای مێژوویی نەتەوەکەی و تەماشای ئێستا «ئاوارەیی مەم» و خەون و ئاواتەکانی «حەمدی ئازاد» و «دینۆ» دەکا. هەموو ئاستە زەمەنییە بە پەلوپۆ جۆراوجۆرەکان، لە یەک گۆشەنیگادا کۆبوونەتەوە: گۆشەنیگایەکی خوڵقێنەری هونەرییانە.

بەم شێوەیە، ئەم تەکنیکە هونەریە و وامان لێ دەکا کە بە تاسووقەوە دوای هێڵی بەیانیی چیرۆکەکە بکەوین. دانەی رووداوەکان، ئەڵقە جۆراوجۆرەکان، لە سەرەخۆ، هێور هێور وەدیار دەکەون. بۆ نموونە هەر لە یەکەمین لاپەڕەکانی رۆمانەکەوە لێمان ئاشکرایە کە پاڵەوانەکە دەیەوێ خۆی بکوژێ، بەڵام نازانین بۆچی؟ تا لاپەڕە «۲۰» هۆیەکەمان بۆ دەردەکەوێ. ئەوجا دوای ئەوەش لە لاپەڕە «۷۷» بۆمان دەردەکەوێ کە پاڵەوانەکە بۆچی ئاوارەی ئەم دورگەیە کراوە؟ لە کۆتاییشدا، لە بەشی دووەمی فەسڵی دووەمدا، دەبینین: هەموو ئەم شتانە هەمووی پێوەندیی بە خەونی «دینۆ»وە هەیە...هتد.

پێویستە پەنجەنومای ئەوە بکەین، کە (تەنانەت لە ریزی ئەو چیرۆکنووسە کوردانەی کە بە کوردیش دەنووسن!)سەلیم بەرەکات، یەکەمین چیرۆکنووسی کوردە کە بە شێوەیەکی فەنتازی و هونەریی بەرز توانیبێتی سوود لەو گەنجینە رۆحییە شاراوە نەتەوەیەی میللەتەکەمان وەرگرێ، کە دەروونناسەکان ناویان ناوە (هەستی ئاناگای گەلەکۆیی/ اللاوعي الجمعي). ئەو دەساوەردە هونەرییە، دەشێ لە رێگای خوێندنەوەی نووسەرە ئیسپانی و ئەمریکای لاتینییەکانەوە، بەتایبەت لە رێگەی خوێندنەوەی گارسیا مارکیزەوە خۆی خزاندبێتە ناو جیهانی ئەم نووسەرە کوردەوە. بەڵام هەرچۆنێ بێ، چ رەگ و ریشەکان، چ هەڵخستنە هونەری و دراماییەکانیان؛ سیما و مۆرکێکی کوردانەیان هەیە.

هەڵبەت دیارە، ئەو توخمە خەونی و ئاناگا و سیحریانە، هەندێ جار لە سەرووی ریالەوە بە شێوەیەکی سیحراوی و ئالۆژیکانە دەردەکەون، بەڵام هاوکات لە رێگای پیشاندانی جوانی ئەو توخمانەوە زۆر هونەرمەندانە بەکارهێنراون، ئامانجی خۆیان هەیە. تەنیا یەک نموونە: لە لاپەڕە ۸۳-۸۷، واتە بە درێژایی چوار لاپەڕە، دیالۆگێکی مەیلە و سوورریالیستانە لە نێوان (حەمدی ئازاد) و (مەم) و (دینۆ)دا هەیەلە بارەی فریشتە و بالندە و گیانەوەرەکان، لەبارەی ئەوەی ئایا «فریشتە» بالی هەیە یا نا؟! رۆمانووس ئەم «تێگەیشتنە میللیەی»

سەلیم بەرەکات: دوڕیانێکی تەڵزماوی!

فەرهاد پیربال

شێوەتازەکانی بیرکردنەوەی مرۆڤی هاوچەرخی کورد لە بارەی سەربەخۆیی و ولاتەکەی و دوزینەوە و دیاریکردنی «ناسنامەی نەتەوایەتی»، هەروەها بنیاتنانی پردێک کە مێژوو بە ئەمڕۆ، گەل بە تاکە کەس، چەوسانەوە بە خەون، تراژیدیا بە سەرفرازی و ئاسوودەی ببەستێتەوە: یەکێکە لەو کێشە هەرە گرنگ و بنچینەییانەی کە بیری رۆمانتووسی کورد، سەلیم بەرەکاتی بەخۆوە خەریک کردووە. نووسەر، هەر لەسەر ئەم بنەما فیکرییەشیەوە، جیهانە فەنتازی و هونەریە بە گرێ و گۆڵەکەی دواین رۆمانی خۆی، بە ناوی (پەڕەمووچ/الریش) هەڵچنیوە. سەلیم بەرەکات، رۆمانتووسێکی کوردی سوریایە، دواین رۆمانی، بەناوی (الریش) لە ٢٣٧ لاپەڕەی قەوارە گەورەدا، چەند مانگێک پێش ئێستا، بە زمانی عەرەبی، لە دەزگای «بیسان» لە «قوبرس» بڵاوکردۆتەوە.

سەلیم بەرەکات، لەم رۆمانەی دا، وەک ئەوەی لە رۆمانەکانی پێشووشی دا، لە رۆمانەکانی (فقرياء الظلام ١٩٨٥)، (ارواح هندسيه ١٩٨٧) دەبینین: بەشی هەرە زۆری کەسایەتییەکانی، کوردن، خەون و ئاواتی کوردانەیان هەیە و لە جیهانێکی کوردەواریانەدا دەژین. بەڵام رۆمانتووس، لەم رۆمانەیدا بە شێوەیەکی فراوانتر و قوواڵتر رۆچۆتە ناو ژیان و مێژووی میللەتەکەیەوە.

رۆمانتووس، لەم رۆمانە تازەیەی دا ژیان و مێژووی هەر چوارپارچەکەی کوردستان لە سەرەتای سالەکانی ئەم سەدەیەوە تا سالانی شکستهێنانی کۆماری مەهاباد دەگێڕێتەوە. ئەمەش لە رێگای گێڕانەوەی کارەسات و کێشە و رووداوە مێژووییەکانەوە بە ژیانی مالە کوردێکی هەژاری کوردستانی سووریا: (مالی حەمدی ئازاد).

حەمدی ئازاد، قوماش فرۆشێکی هەژاری کوردە، بەڵام رۆمانتووس لە رێگەی گێڕانەوەی ژیانی حەمدی ئازادەوە، دەیەها کەسایەتی و پاڵەوان و پیاوانی مێژوویی کوردمان بۆ زیندوو دەکاتەوە و بە قسەیان دەهێنێ، هەر لە مەلا سەلیمی بەتلیسی و شێخ محەمەد سەعید نەقشبەندیی سەرۆکی یەکەمین شۆڕشی کوردەوە بگرە تا دەگاتە حوسێن حوزنی موکریانی و عەبدولرەزاق بەدرخان و سمایل ئاغای سمکۆ و قازی محەمەد و .....هتد؛ هەروەها دەیەها کارەسات و دیاردە و بابەتی مێژوویی کوردمان بۆ دەخاتە ژێر نەشتەری لێکۆڵینەوە و وردەکاریەوە... بە شێوەیەک، کە تۆ هەست دەکەی ئەمە یەکەمین جارە رووداوەکانی مێژووی میللەتەکەی خۆتت بەم شێوەیە گوێ لێ دەبێ؛ لەمەوپێش هەرگیزا و هەرگیز، جوانی ئەو رووداوانەت ئاوها نەدیوە. مێژوو لەم رۆمانەدا بووەتە پەلکە زێڕینەیەکی زیرەوشانی جوانی و هونەر! سەرکەوتنی سەرەکیی ئەم رۆمانە، تەنیا لەوەدا نییە، کە باسی ژیان و مێژووی کورد لە کوردستانی گەورەدا لە نێوان (١٩٠٠ - ١٩٤٦) دەگێڕێتەوە، بەڵکو لەو بەها ستاتیکی و هونەریە دانسقە و بەرزانەش دایە، کە رۆمانەکە لە ئاستی گێڕانەوەی پەیوەندی هونەرییانەی خۆی بە بابەت و کێشە وەدەستی هێناوە.

کێشە و تراژیدیای نەتەوەی کورد - بە درێژایی ئەو مێژووە ددیاریکراوەی لە رۆمانەکەدا هاتووە- بەراستی، لە ئاستە مێژوویی و سیاسیە کڵێشەیەکەی خۆی تێدەپەڕێ؛ دەگاتە ئاستێکی بەرزتر، ئاستێکی هونەری؛ ئاستێک کە ئێمە بتوانین ئەو کێشە و تراژیدیایە لە رێگای روانینی هونەرمەندانەی «سەلیم بەرەکات) خۆیەوە تەماشا بکەین.

حەمدی ئازاد، کە نوێنەری نەوەیەکی کۆنە، دیارە بۆ خۆی پیر بووە؛ ناتوانێ چیتر بەشداری لە خەباتی سەربەخۆیی کوردستاندا بکا. دوو کوڕی هەیە. کوڕەکان جمکن: «مەم» و «دینۆ». حەمدی ئازاد داوا لە «مەم دەکا و هانی دەدا کە بچێ بەشداری بکا لە خەباتی پێشمەرگانەی نەتەوەکەی، ئەو نەتەوەیەی سالەهای

پێشانگەیەک بۆ منداڵانی کورد

لە رۆژانی ٦ و ٧ی مانگی ئەپریل، گۆڤاری «کۆچەر» پێشانگەیەکی نیگاری دەستیی منداڵانی کوردی کردەوە. پێشانگەکە لە هۆڵی (ABFhuset)ی ستۆکهۆڵم پیشان درا و نیزیکەی ٢٠٠ نیگاری منداڵان بە چواردەوری هۆڵەکەدا هەڵواسرابوو. لەگەڵ هەر نیگارێک، وێنەی خاوەنەکەی و ناو و تەمەن و شوێنی دانیشتنیشی نووسرابوو.

منداڵانی گشت لایەکی کوردستان چالاکانە هاوبەشییان کردبوو و لەزۆر شاری سوێدیشەوە بەرهەم نێردرابوو. ئەوەی زێتر جێگای سەرنج بوو نیگارەکانی منداڵانی کوردستان و ئۆردوگاکانی ئێران بوون، کە بە ژمارەیەکی زۆر هاوبەشییان کردبوو. منداڵانی کامپەکانی دیاربەکر و ماردینیش چالاکانە نیگاری دەستیی خۆیانیان ناردبوو. لە هەموان زیاتر «شنوار عەزیز بناقی» بوو، کە منداڵێکی یازدە ساڵی کامپی ماردینە. شنوار بەشێکی تایبەتیی لە پێشانگەکەدا بۆ تەرخان کرابوو. ئەوە سەبارەت بە نیگار و هاوبەشیکردنی منداڵان و ناردنی بەرهەمەکانیان. بەڵام سەبارەت بە میوان و سەیرکەران، زۆر بەداخەوە ژمارەیان هێجگار کەم بوو و لە بیست و سێ تێپەڕی نەکرد، گەرچی پێشاندانی پێشانگەکەش دوو رۆژی ڕەبەقی خایاند و ماوەیەکی زۆریش پڕوپاگەندەی بۆ کرابوو و بە نامەش هەموو گۆڤار و رۆژنامە کوردییەکانی سوێد ئاگادار کرابوون، بەڵام هیچیان - جگە لە مامۆستای کورد - سەریان لە هۆڵەکە نەدا. کەچی بۆ ئاهەنگ و هەڵپەڕکێیەک، نەک هەر نوێنەری گۆڤار و رۆژنامەکان، بەڵکو بەڵای کەمەوە ٤٠٠ کەس بەشداری دەکەن. بەهەرحاڵ، بەتەمان پێشانگەکە لە زۆر شارەکانی دیی سوێدیش پیشان بدرێت، بۆ ناساندنی بەرهەم و بیرکردنەوەی منداڵانی هەڵەبجە و بادینان و بەشەکانی دیی کوردستان و منداڵانی دەرەوەی کوردستان بۆ ئەو کەسانەی ئارەزووی بینینیان دەکەن.



www.arsivakurdi.org

بەرد و تیر گرتنە یەکتری نیە، لەگەڵدا بوون و گوڵ باران و ڕێزگرتنیشە.

خۆ ئێمە ژیان پەرستین و مردو پەرست نین.

تا لە ژیاندایین تاقە ماچێکی ڕێزگرتن و خۆشەویستیی نێوانمان لە هەموو ئەو چەپکەگوڵانە بەنرختر و زیندووتر و نزیکترە لە ڕاستییەوە، کە دوای مردن ئەیانخەینە سەر تابووتی یەکتری.

دەبا ئەو قاوغە ڕزیو و کۆنانە بشکێنین و بە پیر ئەو ئەوینە مەزنەوە بچین کە هێندەی کوردستان کەڵەگەتە و ئەوەندەی خوێنی شەهیدانیشمان پیرۆزە و هەموو ساتێکیش لەم دوورەوە زایەڵەی ئەگاتە گوێی ئاوارەیی و تاراوگەی نامۆیی مان.

دەبا منیش لە ئاهەنگی ڕێز و خۆشەویستیی ئەم ئێوارە کۆڕەدا: حەفتا گوڵەباخی چاوگەش و چاوگەش حەفتا چڵەنیرگزی ناسک و نازدار بچنم و بیانکەم بە دوو چەپک و بە لاسکی سەوزی شیعرەکانم بیانبەستم و بیاندەمە دەست کاکە دڵزار. وەک حیکایەت خوانە دەم و گفت شیرینەکانی دێرینەمان وا کۆتایی بە قسەکانم بێنم و بڵێم: چەپکێ گوڵ و چەپکێ نیرگز

مەرگی کاکە دڵزار نەبینین هەرگیزاو هەرگیز

ستۆکهۆڵم

۹۹./۱/۱۸

* یەکێتیی نووسەرانی کورد لە سوید، لە یەکەمین وەرزی ڕۆشنبیریی خۆیدا، بە بۆنەی جەژنی لەدایکبوونی شاعیری ناسراو کاک «ئەحمەد دڵزار»ەوە، لە ڕۆژی ۹۹./۱/۲۰ لە ستۆکهۆڵم ئێوارەکۆڕێکی ڕۆژلێنانی گێڕا، کاک شێرکۆش لەو کۆڕەدا وتارەی خوێندەوە.

یەکێتیی نووسەران

گۆرانیی:

گوڵی باخچەی منداڵان

فەرید عیسی

گوڵی باخچەی منداڵان — بۆنبان ئەگاتە منداڵان
پەروەردەی ئەم چیمەنەن — گەشاوەی ژەردەخەنەن
دێن و دەچن فریشتەن — چۆلەکەی ئەم بەهەشتەن
یان کەرۆشکی بچووکن — خنجیلە و ئینسک سووکن
بۆیەن بێ سەروتن — کەوتوونەتە قوونەقوون
وەکو پەپوولەی سەرگوڵ — خۆشی ئەنۆشن بە کوڵ
تا ئەم گوڵە ئاڵانە — لەم باخچەی منداڵانە
بۆ نەورۆز و بەهاری — خەریکن لەگەڵ یاری



جەژنی ڕۆژنامەگەری کوردی

لە۲۲ی نیسانی ۱۹۹۰ دا، ۹۲سالێ بەسەر لە دایکبوونی یەکەم ڕۆژنامەی کوردی -**کوردستان**- تێدەپەڕێ،بەو بۆنەوە پیرۆزبایی لە ڕۆژنامەنووسانی کورد دەکەین و هیوادارین لە ئاستی ئەرکی ڕۆژ دابن،ڕۆژنامەو گۆڤارەکوردیەکان گرینگی پتر بە لایەنی هونەری و زمان و ڕوخساری چاپەمەنیەکان بدەن،لەتەک ناوەڕۆکی بە پێز و دە ولەمەندا. بەربانگ

www.arsivakurdi.org

نەپساوەی ئەم کاروانە دوور و درێژەی شیعری کوردیدا، کاتێ لە دوای لێدانی باڵەبانەکەی «خانی»یەوە، لە قۆناغێکی دیکەدا، زەنگە پێشەنگەکەی «حاجی»، کۆی «بێکەس»ی پڕ کرد و شیعر لە قاوغی تەنگەبەری دیوەخانان و کۆڕ و کۆبوونەوەی بچووکەوە دەرپەڕی و خۆی بە هەناوی کۆمەڵانی خەڵکدا کرد و چووە سەر شەقام و نێو گۆڕەپان و بوو بە هەڵوێست و تەقینەوە و شۆڕش. بوو بە نان و گوڵ. دڵزار و هاوڕێکانی، ئەوینی ئازادی و نیشتمان لە تافی لاویدا کەمەندکێشی کردن و بە تیری ئەم عەشقەی شیعر گرفتار بوون، ئەمانیش لەو دوو ریانە گەورەیەدا - دووڕیانی شیعری سنعەتی لەفزی و شیعری نیشتمانی و شۆڕشگێڕیدا - رێگەکەی دواییان هەڵبژارد و مەشخەڵەکەی «حاجی و بێکەس»یان بە دەستەوە گرتەوە.

- شیعر لای دڵزار، هەمیشە دەستە چیلەی خەباتێ بوو کە خۆی بە تاقیکردنەوە تیا ژیاوە و قرچە قرچ بە ئاگرەکەی سووتاوە، بە دەنگی بەرز هاوارکردن و راچەنین بووە و دەنگدانەوەی دونیای رۆژانەی چەوسانەوە و تێکۆشان بووە. لەگەڵ مێردەزمە و بکوژانی نان و جوانی و گوڵ دا، ڕووبەڕوو بوونەوەی نێو مەیدانەکە بووە. هەر لەبەرئەوەیش گەڵێ جار ئەبینین هونەر و وردەکاری شیعر و ئەفراندن، بوون بە ژێر بارستایی قورسی چەوسانەوەوە و لە ئاپوورەی هاوارەکاندا ون بوون.

لە وێنەکاندا شیعر خەنجەرێکی ڕووتی لە کاڵان دەرهێناوە و بە دەمی تیژی خۆی وشەکان لەسەر بەردی رۆژگار هەڵئەکەنێ، یان سروشتی ڕەنگین و دڵ ڕفێنی کوردستانە و تێکەڵ بە زام و سکاڵا و فرمێسک و ڕەنجی خەڵکی ئەبێ و هەوێنیش هەر ئازادی و سەربەستییە، یان زڕەی زنجیری لە دەست و پێ ئالاوی ئازادیخوازێکە کە بە قاوش و ڕاڕەوە نسرم و شێدارە کانی بەندیخانەدا ڕەت ئەبێ و لە زرنگانەوەیدا سروودێ لە دایک ئەبێ... یان ئەو زارانەن کە ڕاستەوخۆ تف ئەکەنە نێوچەوانی پیاوکوژان... یان باڵەکانی کۆتری ئاشتیین... یان تان و پۆی سێ سیمای تێکەڵی ژن و پیاوێک و منداڵێکی بەر مەمکانەی لە برساندا دەم داپچڕیو. زمانی داڕشتن و دەربڕین لای دڵزار کوردیەکی پاک و ڕەوان و بێ گرێ و گۆڵە. کوت و مت وەک گوڵە کێوییەکان سادە و بێ فیزن، لە خوێندنەوەدا هەناسە سوار ناکەن و لەسەر دڵ نابنە گرفت و تووشی سەرەگێژە و ڕێشکە و پێشکەی بینینت ناکەن.

* * *

لە باخچەیەکی یەکێتیی نووسەرانی ئێمەدا، نە یەک چەشنە گوڵ ئەڕوێ و نە بولبولەکانی سینگیشمان یەک جۆر ئاواز ئەچڕێنن و نە هیچ پەڕژینێکیشیان بەدەوری بیرکردنەوە و ڕوانین و هەڵوێستی سیاسیدا کێشاوە. لەم باخچەی خۆشەویستییەدا گوڵەکان و ئاوازەکان هەمەڕەنگ و هەمەچەشنەن و سەربەستیش ئاسمانی هەر هەموومانە. منیش ئەزانم دانووی بیروباوەڕی هەر هەموومان لە قازانێکدا پێکەوە ناکوڵێ. ئەم شانەی هەنگوینانە لە مژینی شیلەی چەندین باخەوە هاتوون. ڕەنگە شەرە دەنووکی تاک تاک و جووت وجووتی ئەم پۆلە مەلانە هەندێ جار چیرەدرێژ و بە گیر و گازیش بن. بەڵام ئەم چڕە دووکەڵەی ئەمڕۆ بۆکڕۆزی جەرگی هەڵقرچاوی هەر هەموومانی لێ دێت، ئەو لاڕێی ناکۆکیانە لەسەر ترۆپکی ئەم کارەساتانەوە ئەوەندە بە ئاستەم و بچووک ئەبینرێن، ئەوەندە کاڵ ئەبنەوە، لە ئێستەدا تارماییشیان لەجێی نەبووانە. ئا لەم وەیشوومەیەدا ئەو پەنامجانەی ڕیشاڵەکانی دڵی من و دڵزار پێکەوە ئەبەستێتەوە لە سنوورە خۆڵەمێشەکانی حیزبایەتی و چەپەڕ و دیوارە نزمەکان تێ ئەپەڕن و وەک ئاسمانی هەڵەبجە و قەلادزێ باوەش بە هەموو کوردستاندا ئەکەن.

ئەمە خۆشەویستیی سەردەمی گازی ژەهراوی و کۆچی بە کۆمەڵ ئاوارەبوون و ڕۆژگاری تار و مار و بە سوتماکردنی کوردستانە.

ئەمە ڕیزگرتنی قەڵەمی سەر بڵند و گوڵی شیعر و تەمەنی ڕەنج و ئازارە. یەک واشەیش هێلانەی شیعری هەردووکمانی شێواندووە و پێکیشەوە چەندین زەرنەقووتەمانی قووتداوە.

یەک دەمانچەی دەنگ پۆشی جەللادەکانیش بەشوێن هەردووکمانەوەیە. یەک کێردیش لەسەر ڕەگی ملی هەردووکمانە. یەک تەوریش بەربۆتە وێزەی درەختەکانی دارستانی هۆنراوەمان. یەک هیوا و مزگێنی چاوەڕوانیش چاوەکانی شیعری هەردووکمانی پڕکردووە لە زەردەخەنەی گەڕانەوەی ڕووسوورانە.

خۆ ئەم ژیانەش هەر بە تەنها لە ئاوێنەی ئەم حیزب و ئەو حیزب دا خۆی نانوێنێ. ئەم تابلۆیانەش هەر بە ڕەنگی ڕەش و سپی ناکێشرێن.

هەڵوێستیش هەر ڕەتکردنەوە و

سەفەرت، دوای رێگەی بە تار و ماری غوربەتی هەڵقرچاوی تۆ، پاش ڕەوکردنی گیانی ئارام لەبەربڕاوی ڕەوەندی تۆ، ئەو گیانەی لە سەرچاوەی ڕوون و عەشقی بە لووزەی «خانی»یەوە لرفەی کرد و ڕژایە ئەستێرکی دڵی کوردستانەوە، دوای تۆزیش، لە داوێنی سپی فریشتەی شارەکەتەوە، لە داوێنی زەرد و سپی نێرگزەجاڕی بە بریق و باقی «کاکۆن» و «هەیبەت سوڵتان»ەوە، نەوە لە دوای نەوە، شەپۆل لەدوای شەپۆل، ئەستێران بە چەپک ئەکەوێتە خوارەوە. شیعرپژان بوو. مرواری هۆنینەوە بوو. لە باو و بۆران و بەفران بار و کەڕەسیسە و کڕنۆشدا، خونچەشیعر پشکوتن و بنچکە هێرۆی چاوئەرخەوانی ئێمە لە خاکی بە سووتماک کراویشدا سەریان هەڵدایەوە.

– لەوساوە کوانووەکەت حیکایەتی عیشقی بە تین و تاوی «مەم و زین» و «لاس و خەزاڵ»ی لێ نەبڕاوە و دەورمان سارد نەکردوویتەتەوە، پشتاوپشت وەک عیشقی شەم و وەلی دێوانە، وەک ئەوینی سیروان و خاک، تۆوی شیعر و خۆشەویستیی تۆمان لە گلێنەی چاو و پەڕەی دڵ و ئینجانەی سەرماندا ڕووانووە. وەک ئاگرەکەی نەورۆز شیعریش نەکوژاوەتەوە.

گۆی زەوی هات و چوو

لە وەرزێکی تری ئەم مەڵبەندە چاو سەوزەدا، «مەلای گەورە»یش بوو بە تیرێژی کلاوڕۆژنەیەکی تری سەری ئێمە. ئەویش بە چەپک تیشکی ئەگرتە شەوەزەنگ. پلنگەکانی چاوی، ئازایانە کەوتبوونە چنگ نانە چنگی ئەو تارمایی خێو و دێو و درنجانەی کە لە شەوی ئەموستەچاوی ئەو ڕۆژگارانەدا، تاریکی پەرستان هەڵیان تۆقاندبوون و کردبوویانن لەمپەڕی سەر ڕێگەی ڕوناکی و پێشکەوتن.

جارێکی دیش، هەر لە نێو ئەو لووتکە هەڵکشاوانەدا، لەنێو ئەو تاڤگە و بەهرە مانگەشەوانەی کۆیەدا لە سەرودەمێکی نێزیکتردا، نزیک ئەوەندەی خوێنی دوو شەهیدی ئەوسا و ئێستا. باڵندەیەکی سەوداسەر و شەیدای ترت لەو کونە بەرد و ماهی و ڕەوەزانەدا، کەوتە باڵەفڕێ و ئاسمانی پڕ کردین لە چریکە و گوڵەوشەی ڕەنگاوڕەنگی بەسەردا باراندین، ئەویشیان «یونس ڕەئووف»ی دڵدارەکەی تۆ و هەموو کوردستان بوو.

– ئەم چارەنووسە بوو بە باران و باران ڕووباری لێ کەوتەوە و ڕووبار جۆگە... ئیتر مێژووت بە هەردوو دەستی بڕووسکە و چەخماخەی خۆی چەندین ناوی پرشنگداری، شەوق دەرەوەی، لەسەر تەوێڵی ئەم عەشقی شیعر و ئازادی و جوانیەیە بۆ هەڵکەندین.

لەم ڕۆژگارە چاوچاونەبینەی ئێمەشدا، لەم ژەهر بارانەدا تۆ کۆڕی قەڵەم بە برشت و گۆمی قوڵ و زەینی تیشک دەرەوەی وەک «مەسعود محەمەد»ت هەیە. شاعیری ئازاربەزینی وەک «دڵزار»ت هەیە. شاعیرێ کە دڵی زاری لێوە بەخەندەی دنیای هەژاری زیندان و ئارەقەی ڕەنجی تۆناو تورنی ژیان و تێکۆشانی، ڕۆژێ لە ڕۆژان بە هیچ سایەیەکی زۆرداران و پشووی ژێر بنمیچی هیچ ڕژێمی گورگ و ئەژدەهایەک نەگۆڕیوەتەوە و بەڵکوو چقڵی چاویشیان بووە. لە بنی زەریای حەفتا ساڵەی ئەو تەمەنەوە دەرهێنانی ئەم کڵۆ گەوهەرە خۆی لە خۆیدا بەسە بۆ ئەوەی ئازاری قوڵ و شانازی ئەو خەباتە هەناسە سواڕە نەبووە بخاتە پێش چاومان. بەڵێ ئەگەرچی من و کەسانی دیکەی وەک من هەن، نە دوێنێ و نە ئەمڕۆیش ملی ڕێگەی حیزبەکەی دڵزاریان نەگرتووە. ئەو چەکەی ئەویان نەکردۆتە شان. ئەو گۆرانیەی ئەویان نەچراندووە. ئەو سەنگەرەی ئەویان لێ نەداوە و لەو سەرچاوەی بیرکردنەوەیەکی دوور لە سەرچاوەی ئەوەوە ئاوی خۆیان هەڵهێنجاوە، بەڵام لە ئاستی جۆگەلەخوێنی ئەو بریانەی لەشی ئەو و لە ئاستی گەردنی بەرزی هەرگیزنەنووشتاوەی ئەو لەبەردەمی زریانی تووشی جەللادەکاندا، کێ ئەتوانێ وێژدانی ئازادیخوازانەی خۆی مایە پووچ و پێ شێڵ بکات؟!

وەختێکیش کە هێشتا ئێمەومانان پێ ڕەوکەی شیعر بووین. تازە بە تازە دەستمان بە ڕەورەوەی وشەوە گرتبوو تاکوو هەستینە سەرپێ. وەختێ نەمان ئەزانی چۆن چۆنی ئەم ئەسپە سەرکەشەی شیعر ڕام کەین، هەر بە دەور و خولیدا ئەهاتین و گەڵێ جاریش بە پاشەلەقەی ئەو دەمان سوێر ئەبوو. لەو کاتانەدا دڵزار بە ناو و دەنگ بوو. سوار بوو. ئاوزەنگی تەقێن بوو. لە شایی و لۆغانی شیعردا قریوی بوو. لەو سەرودەمەدا بۆنی گوڵە شیعری ئەویشمان پڕ بە سینەی عەزرەتیمان هەڵ ئەمژی. لە وشەکانی ئەویشمان ئەکرد بە کشتەکی خەیاڵمانەوە و دووڕاو دوور دەستی ئەگرتین. گەنجینەکانی شیعری نیشان ئەداین.

دڵزار هەر زۆر زوو مەڵاشووی شیعری خۆی بە پەنجەی ئازادی هەڵدایەوە. وەختێ لە ڕێچکەی

چەپکێ گوڵ و چەپکێ نێرگز

شێرکۆ بێکەس



گۆران ودلزار لەسالی ١٩٦٠

لە ئێستەدا، لە ئاوڕدانەوەی دوو چاوی نەنم بە شەونمی یادگار تێزاومەوە، بەرەو لانکەی ئەوین و ئاسۆی پەلکەڕەنگینەی خەونی شیعرم، بەرەو کۆشی ئەوسای گەرم و گوڕی بە ئۆخژنی جێ نزرگەکانی دایک، لە گەرانەوەی کۆترەشینکەی خەیاڵی بە گمەگمی هەموو شەو درەنگانێکی ئەم تەموتوومانی نامزیی‌یەوە... شەقژن، شەقژن... بەرەو هێلانەی پووش و پەلاش سووتاوی وەیشوومە لەسەرهەڵکردووی ولاتی نێرگز و کاولاش، لە هەموو سەردانەوەیەکی ئەسپەشێی بە کورژنی، لە حەسرەتدا سمکۆڵ کردووی بە چەپۆکانی شیعری شەلاڵی تاسە و هیواوە، بەرەو مەزرا و بژوێن و کۆتان و پاوانە چۆڵ و هۆڵ و کش و ماتەکانی ئێستەی کوێستان و گەرمێن... ئەچمەوە «کۆیە»یش! لە بن بناری قاچ و قوڵ قڵیشاو و ڕەنگ پەڕیوی بەردەوام دووکەڵ لە هەناوەوە هەستاوی «چنارۆک»ەوە، وەک کەرۆشکێکی هەناسەسواری بەربین لەرزیو هەڵ ئەگەڕێم و لە ملە و پلەخز و لووسەکانی «هەیبەت سوڵتان»ەوە، وەک جوانوویەکی لەرەو بەجێ ماو بەرەو بناری ئەودیو دائەگەڕێم و ئەبم بە گوڵ ئەستێرەیەکی بە ورشە و پرشە و جریوەدار و ئاوێزانی ریشە سپییەکەی «حاجی» ئەبم!

– تۆ ئەی چراوگی هەڵکراوی ناو چوخمە تاریک و نووتەکەکانی مێشک و دڵی ڕابووردوویەکی دوورمان! ئەی چریکەی بەسامی بەستەڵەک شکێنی بێ دەنگی و ناهوشیاریی! ئەی هەناسەی ساردی ئاوارەبوون و سەرەتای ڕێچکەی دڵۆپە فرمێسکی غەریبی مان! ئەی چرەچڕی جەرگی سەر کەڵەپشکۆی خەمی گەشاوە! سڵاو! لە چاوە گەلاوێژەکانی کۆیەدا تۆ ئازارێکی قەتیس ماویت و ئەدرەوشێیتەوە! ئەوەتا وشەکانت، ئەو ڕێژنە باران و کلوە بەفرانەن کە بەدەم بارێژەی قیژەی دایکان و زریکەی منداڵانەوە ڕیز ڕیز ئەبارێتە سەر زامەکانی خاکی موقەددەس و لە دەروونی ئێمەدا زنە و کانی و کارێزی تازە زاوی شیعر ئەتەقێننەوە.

ئەی ڕەوەزەکەی چیای گیان!
دوای کۆچی غەمگین و خەزانی

لایەنی بێلایەنی

حەسەنی قازی

ئاوڕێکی خێرا و سەرپێی لە کۆنگرەی دەهەمی فیدراسیۆنەکەمان، دەری دەخا کە سەرەڕای پێشکەوتن و بالاکردنی هەندێک لایەنی تەبیعەتی رێکخراوەکەمان دەبێ زیاتری کار لەسەر بکرێ و باشتر روون بکرێتەوە؛ بۆ ئەوەی فیدراسیۆن بتوانێ وەکوو تاقە رێکخراوەی بەراستی کوردستانی لە دەرەوەی ولاّت دامەزرێ و درێژە بە هەرمانی پیرۆزی بدا.

ئەو لایەنە قەوارەی کۆمۆنی فیدراسیۆنە. وەک هەموومان دەبینین و دەزانین لەو چەند سالاّنەی دواییدا ئەو پەنابەرە کوردانەی کە دێنە سوێد وەک گروپە پەنابەرەکانی دیکە ئیتر هەر لە شارە گەورەکان مالّ دانانێن، ئێستا لە سەرووی هەرە سەرەوەی سوێدەوە بگرە تا خارووی ئەو ولاّتە نەک هەر لە شاری بچووک تەنانەت لە هێندێک ئاوایی کەمدانیشتووشدا کورد دەژیین.

ئەو راستەقینەیە ئەرکی فیدراسیۆن بەربلاّوتر دەکات. واتە فیدراسیۆن پێویستە خۆی لە قالبی مەرکەزی دەرخا و رێگەیەکی ئەوتۆ ببینێتەوە کە پەیامی خۆی بگەیەنێتە ئەو هەموو شوێنانە و بۆ رێکخستنی ئەو کەسانە بە مەبەستی پاراستنی فەرهەنگ و تەقالیدی کوردی؛ رێک پێدانی ژیانی کۆمەلاّیەتی لەو ولاّتەدا و بەدەنگەوە هاتن و پشتیوانی لە خەباتی گەلی کورد لە ناوخۆی ولاّت تێبکۆشێ.

لێرەدا وەک تەجروبە نیشانی داوە بێلایەنی فیدراسیۆن لە حاست رێکخراوە سیاسییەکانی کوردستان و راکێشانی کوردان وەک تاک و تەرای کورد و نەک وەک سەمپات و ئەندامی ئەم و ئەو رێکخراوی سیاسیی کوردستان باشترین شێوەیە. فیدراسیۆن دەبێ بە پراکتیک و بزووتنەوەی رۆژانە خۆی نیشان بدا کە بە جیدی لە هەمبەر پێرەوی ناوخۆ و بەرنامەکەی وەفاداره و بێ هیچ فەرق و جیاوازییەک پشتیوانی لە هەموو رێکخراوە سیاسییەکان و کەسانی سەربەخۆ دەکا و لە هەمان کاتیش دا داوای لە رێکخراوە سیاسییەکانی کوردستان ئەوەبێ کە ئەوانیش ئەو پرێنسیپە واتە بەیەکەوە چارانی هەموو کەس لە چوارچێوەی فیدراسیۆندا قەبوڵ بکەن و لە پراکتیک دا باوەڕهێنان بە رێکخراوێکی کە هەم دەتوانن خۆیان وەک فەرد بەشداری تێدا بکەن و هەم تەبیعەتی ئەو رێکخراوە ئاوایە کە فەردی بەتەواوی دژی ئەوانیش لە بن چەتری گشتی دا بحەوێنەوە، لەبەرچار بگرن.

لەوانەیە هێندێکیان شێوە جوولاّنەوەیەکی ئەوتۆ بە هەر هۆیەک بێ بەراست دانەنێن و بەکاری نەکرابێ دانێن، بەلاّم ئەگەر بێتو بە راستی قازانجی گشتی کوردان لەو چوارچێوەیەی کە لەبەر باسە لەبەرچاوبگرن بێ ئەوملا و ئەولا وەک لە ژیانی رۆژانە و هەست پێکراودا لە رێزەکانی کۆمەڵەکان دا دەبیندرێ دەزانن کە ئەو قەوارەیە قسەی لەسەر نییە؛ چ بۆ پرێستیژی گشتی ئینسانی کورد و چ بۆ قازانجی گروپی رێکخراوەکانیش باشترین زەمینەی. لایەنەکانی تەبیعەتی بێلایەنی فیدراسیۆن لەحاست رێکخراوە سیاسییەکان دیانیش دەبێ لێبکۆڵدرێتەوە. هیوادارم ئەو کورتە باسە ببێ بە هەوێنی لێدوان و ئاڵوگۆڕی بیروڕا لەم بارەیەوە لە کۆمەڵەکانی ئەندامی فیدراسیۆنە خۆشەویستەکەماندا.

۹۹./۳/۳.



www.aasivarkurd.org

کۆنگرەی دەیەمی فیدراسیۆنی کۆمەڵەکوردستانیەکان لە سوێد

لە رۆژانی ١٠و١١ی شوباتی ١٩٩٠ دا،کۆنگرەی دەیەمی فیدراسیۆنی کۆمەڵەکوردستانیەکان لە ستۆکهۆڵم بەسترا. لە کۆنگرەکەدا دەبوایە ١٣٩ نوێنەر ئامادەبن ، بەڵام ١١٩ نوێنەر بەشداری کۆنگرەیان کرد .

کۆنگرە بەسرووەی ئەی رەقیب کرایەوە. پاشان دەستەی بەڕێوەبەری کۆنگرە هەڵبژاردرا،بەرنامەی رۆژەکانی کۆنگرە چەسپێندرا. ئەو سا هەڤال کەیا ئیزۆل سەرۆکی فیدراسیۆن وتاری فیدراسیۆنی خوێندەوە.

کۆنگرە لەراپۆرتەکانی ئۆرگانەکانی فیدراسیۆنی کۆلییەوە و دەنگی لەسەردا. هەروەها بریاریدا لە سەرگۆڕینی هێندێ بەندەکانی دەستووری فیدراسیۆن .

ئەوەی شایانی باسە ،مێوانێکی زۆر لە کۆنگرەدا ئامادەبوون لەوانە :نوێنەرانی پارتەکانی ئەندامی پەرلەمانی سوێد و دەزگای بیانی و وزارەتی بیانیان و،نوێنەرانی هێزەسیاسیەکانی کوردستان. هەروەها بروسکە وسلاونامە ی ٥٠ رێکخراوی سیاسی وکۆمەڵایەتی بێگانەوکوردستانی لە کۆنگرەدا خوێندرایەوە.

کۆنگرەی دەیەم چەند بریارێکی وەرگرت کەلەخوارەوە دەقەکانی بلاو دەکەینەوە.

لەکۆتایی کۆنگرە دا، کۆمیتەی کارگێڕوگشتی و ئابووری هەڵبژێردران

بریارەکانی کۆنگرەی دەیەمی فیدراسیۆن

- کۆنگرەی دەیەم زۆرداری دەولەتەداگیرکەرەکان - تورکیا،ئێران،عیراق و سوریا - کەبەردەوامە بەرانبەر گەلی کوردستان بەتوندی مەحکوم دەکا و، بشتگیری تەڤگەری رزگاریخوازیکوردستان دەکا.

- کۆنگرە شەهید کردنی دکتۆر قاسملو بەدەستی رژێمی کۆنەپەرستی ئێران مەحکوم دەکا و،داوا لە حکومەتی ئوتریش دەکا بەرپرسیارانی ئەو کارە تیرۆریە ئاشکرا بکاو ،بەجیهانی رابگەینێ. هەروەها کۆنگرە هاو دەنگا لەگەڵ ئەو پێشنیارە بۆ بەخشینی خەلاتی نۆبل بۆ ئاشتی بە دکتۆر قاسملو .

کۆنگرە پیرۆز بایی لە سەرۆکی ANC نیلسۆن ماندێلا دەکا بەبۆنەی ئازاد کردنی دوای ٢٧ ساڵ زیندان ،لە لایەن رژێمی رەگەزپەرستی ئەفریقای خوارووەوە .

کۆنگرە پشتگیری لە بێنج پەرلەمێنتاری کورد دەکا ،کەتورکیا دەخوازێ مافی ئەندامەتیان لێ وەرگرێ.

کۆنگرە نارەزایی دەردەبڕێ دژی بریاری حکومەتی سوێد لە گۆڕینی قانوونی وەرگرتنی پەناهەندان و،داوا لە فیدراسیۆن دەکا درێژە بەخەباتی خۆی بدا بۆ پاراستنی مافی پەنابەرانی کورد .

کۆنگرە بریاری دا کەفیدراسیۆن دەبێ درێژە بەخەبات بدا بۆ راگەیشانی زارۆک وڵاو ژنانی کورد لە سوێد بۆ نێو خەباتی دیموکراتی.

کۆنگرە بریاری دا کە فیدراسیۆن چالاک تر خەبات بکا بۆ ئەوەی پەخشی کوردی لە رادیۆ و تەلەڤزیۆنی سوێدابکرێتەوە.

چالاکی فیدراسیۆن و کۆمەڵەکانی ئەندام لەیادی هەڵەبجە و نەورۆز دا

- لە١٦-٣-١٩٩٠ دا،لە فۆلکت هوس یادی دوو ساڵەی کارەساتە دڵتەزێنەکەی هەڵەبجە کرا لەلایەن فیداسیۆن و بەرەی کوردستانی عیراق وتەڤگەر،لە ژێر دروشمی - هەڵەبجە لەبیر مەکەن -، لەشەوەدا ،لەتەک نوێنەرانی هێزە کوردستانیەکان و چەند ئەندامێکی پەرلەمانی سوێد وەک: هانس یۆران فرەنک، بریتەئێرکسۆن،هەروەها نوێنەری کۆمیتەی کوردی بۆ مافی مرۆڤی کورد هێرمانسۆن لە شەوەکەدا ئاخفتنیان کرد و بشتگیری خەباتی گەلی کوردیان کرد ،هەروەها لەشەوەکەدا تیپی مۆسیقای کوردستان چەند گۆرانی و سروودی شۆرشگێڕیان پێشکێش کرد .

لە ١٧-٣-١٩٩٠ بەهاوکاری سێ قۆلی بەرەی کوردستانی عیراق وتەڤگەر و فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانیەکان لە سوێد خۆپیشاندانێک دژی سەفارەتی عیراق ساز کرا. لە خۆپیشاندانەکەدا نزیکەی ٢٠٠٠ کەس بەشداری تێدا کرد .

- لە٢٤-٣-١٩٩٠ ،لە سۆلنا هاڵن دا ،فیدراسیۆن ئاهەنگی نەورۆزی گێڕا،لەئاهەنگەکەدا نزیکەی ٣٠٠٠ کەس بەشداری کرد .

- کۆمەڵەی کولتووری کوردی لە کاترین هۆڵم لە ١٧-٣ ،لەکتێبخانەی گشتی شاردا،یادی کارەساتەکەی هەڵەبجە یان کرد.

- کۆمەڵەی ئۆپسالا خۆپیشاندانێکی نارەزایی رێکخست ،هەروەها لە ١٨-٣ ئاهەنگی نەورۆزی گێڕا.

کۆمەڵەی بۆلنێس خۆپیشاندانێکی ساز کرد ،نزیکەی ١٠٠ کەس بەشداری تێدا کرد .

کۆمەڵەی ئەلفتا خۆپیشاندانێکی لە شارەکەی خۆی کرد .

کۆمەڵەی کوردی ئیسکولستوونا کۆبونەوە و کۆرێکی بەبۆنەی هەڵەبجە کرد ،هەروەها لە١٤-٤ بە هاوبەشی لە گەڵ کۆمەڵەی ڤێستەرۆس ئاهەنگی نەورۆزی گێڕا.

www.ersivakurdi.org

بەربانگ

ئۆرگانی فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکان لە سوید

بەرپرسیار
ن. کریڤ

دەستەی نووسەران
ئاسۆ گەرمیانی،ئا.تگریس ج.حەبدەری ،ل.جەنگین،
حەسەنی مەتی،مەحفوز مایی،م.عەلی .ک، رۆهات،تەمۆ زێرین

ئابوونەی سالانە:
. ۱۰۰ کرۆنی سوێدییە.
بۆ دەزگاکان . ۲۰۰ کرۆنی سوێدییە.

دەستەی نووسەران بەرپرسیار نییە لە نووسین و وتارەکانی فیدراسیۆن و لەو نووسینانەی پە ئیمزای خاوەنەکانیان بڵاودەکرێنەوە.

ناونیشان:

BERBANG
Box 45205
104 30 DTOCKHOLM

تەلەفۆن:

08-668 60 60

پۆستگیرۆ:

64 38 80-8

ژمارە (٦٣)
ساڵ (٩) نیسانی ١٩٩٠

لەم ژمارەیەدا:

بەشی کرمانجی ژوورو لەگەڵ دملی (زازایی) لاپەرە ١-٢٨

کرمانجی خواروو:

٥٥-نەورۆز پێویستی بەئاگری گر تر هەیە .
٥٣-کۆنگرەی دەیەمی فیدراسیۆن...
٥٢ -لایەنی بێلایەنی .
٥١- چەپکێ گوڵ و چەپکێ نێرگز .
٤٨- گوڵی باخچەی منداڵان .
٤٧ - پێشانگەیەک بۆ منداڵانی کورد.
٤٦- سەلیم بەرەکات ...
٤٣ - پەنابەرانی کورد...
٣٨- وێرانکردنی کوردستان..
٣٢ - چەند تێبینێک لەمەر سیمنارەکەی ..

akurdi.org

نەورۆز پێویستی بە ئاگری گرتر هەیە
ڕاپەڕینی نوسێبین سلاوی دەوێ

ژەکیەی شەهید



نەورۆز بو ئاگرێکی وای خستە جەرگەوە
لاوان بە عەشق ئەچوون بەبەرەوپیری
مەرگەوە
پیرەمێرد

تاوانێکی نوێ!
پێشمەرگەیەک لەستۆکهۆلم دا کەس نازانێ کێ کوشتوویەتی؟
کەریمی محەمەدزادە، تەندامی کۆمەلەی کورد لەنینۆسهامن، لە۲-۳-۱۹۹۰ لەمالی خۆیدا کوژراوە. لە بەشی کرمانجی ژووروی بەریانگ دا، یاسەکە بخوێنەوە.

* ژەکیە تالکان، خوێندکاری کولیجی تەندروستی زانکۆی دجلە، لە دیاربەکر دژی زۆرداری دەولەت ئارەزایی خۆی لە شێوەی خۆ سوتاند دەربڕی. لەرۆژی ١٦ی ئاداری لەناوەندی دیاربەکر بەنزینی بەخۆ دارێشت وئاگری لە خۆ بەردا. حەوتووەک بێ هۆش ما ولە نەخۆشخانەی هاجەتە پە لە ئەنقەرە ژیا و لەرۆژی ٢٣ی ئاداری گیانی سپارد.

* ... ٥ هەزار خوێندکاری زانکۆی دیاربەکر وبەدەیان خوێندگای دیاربەکر مانیان لەخوێندن گرت.

« من ئەوکارەم بەزانایی و ویستی خۆ کرد. ئەوە هەڵوێستی منە، دژی رژێم و دەولەت. با کەس لە دوای من گوتنی هیچ وپوچ نەکەن .» ئەوەوتەکانی ژەکیەیە لە نەخۆشخانەدا. چونکە زۆر قسەی ناهەق دەربارەی ژەکیە کرا بوو. پۆلیسی تورک وپستیوبان هەڵوێستی راستی ژەکێ بشارنەوە، ئاگاداری دژە بەرۆژنامەنووسان رابگەیەن. ئەوان رابانگەیاند بوو کە « بۆمبا لە دەستی تەقیتەوە ».

هەرچەندە ژەکیە گیانی سوتابوو و حالی دژوار بوو، بەڵام بەراشکاوی ئەوەی راگەیاند : «نەورۆز پێویستی بەئاگری گرتر هەیە، ڕاپەڕینی نوسێبین سلاوی دەوێ ».

ژیانی ژەکیە لەچەند دێرێکدا :

ژەکیە لە سالی ١٩٦٥ لە شاری کەلکێت، قەزای گوومووش هاتۆتە دونیاوە. کوردی زازایە. لەسالی ١٩٨٤ بۆ خوێندنی بەرز هاتۆتە دیاربەکر. لە دیاربەکر جالاکانە بەشداری تێکۆشانی گەلەکەی کردوە، لە هەموو خۆپیشاندانی ئارەزایی و مانگرتنی نان نەخواردن بۆ پشتگیری مافی زیندانیەکان، مانگرتنی کرێکاران بۆ مافی چینایەتی بەشداری کردوە و، هەروەها بەشداری چالاکی دەکرد لە هونراقشەی سیاسی و تێکۆشانی خوێندکاران

www.arsivakurd.org

بەربانگ

ژمارە ٦٣ گۆڤاری فیدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییەکانە لە سوێد سالْ «٩»







www.makuri.org